***Ji Dr. Bahar Baser: ”Dîyasporaya kurdî di 'pêvajoya aştîyê' de dikare çi bike?” ▶ R. 10***

ÇAPA ÎNTERNETÊ

LE MONDE diplomatique kurdî

Îlon 2013 - Hejmar 46 | www.diplo-kurdi.com · info@diplo-kurdi.com | 20 Rûpel

**Jean-Arnault Dérens**

Li Balkanan li alîyekî gurmînî û xirecira angajmanan û vîzyonên alîgir, li alîyê din 20mîn salvegera destpêka dorgirtina Saray Bosnayê û 15 salîya destpêka şerê Kosovayê...

▶ R. 2

**Serge Halimi**

Hebûna “bûrjûwazîyên neteweyî” – û pêkanîna çareserîyên neteweyî – tên hemberî hev, di heman demê de çînên birêveber ên tevahîya dinyayê êdî bendeka bi hev ve girêdayî ne...

▶ R. 6

**David Courbet**

Qibrisa welatê dawî yê YEyê yê parçebûyî ku kete ber derba krîza malî ya dinyayê, di bin barê tedbîrên jixwekêmkirinên dijwar ên ku deyndêrên ewropî li ser wê ferz dikin de dinale...

▶ R. 8

**Philippe Leymarie**

“Şerekî nepenî, bê dîmen, xeyalî, bê dijmin, bê mexdûr, bê girtî û dîl...”: Şerê li Malîyê yê kanûna paşîn ya 2013an hem ji bo sazîyên çapemenîyê û hem jî ji bo raya giştî sergêjker bû…

▶ R. 16

**Pierre Micheletti**

Li Efxanistanê defterên qeydê yên dîspanser û klînîkên seyar bi nexweşîyên xizanîyê ve ku tesîra wan her ku diçe zêde dibe tijî ne, ji ber ku cih jî ne li gorî tendirustîyê ne...

▶ R. 18

# … Du… sê… hîn zedetir Kurdistan!

RECEP MARAŞLI *

Slogana herî berbiçav ya nîfşa 68an “… du… sê… hîn zêdetir Vîetnam!” bû. Ev slogan wekî sembola têkoşînên rizgarîya neteweyî yên li dijî emperyalîzmê dihat pejirandin. Dihat bawerkirin ku ev têkoşîna li Vîetnamê didome dê li welatên kolonî û nîv-kolonî belav bibe, derbeyeka mezin li sîstema emperyalîzmê bixe û di encamê de rêya şorişa cîhanê veke.

Sîyaseta derveyî ya Amerîkayê jî li gor **“teorîya domino”** pêş didît û ditirsîya ku ger têkoşîna li Vîetnamê winda bikin dê ev encam ji bo rejîmên din yên Hindî-çînî bibe mînak û rejîmên van welatan jî dê wekî kevirên domînoyê yek bi yek hilweşin.

Tarîxê rêyeka ortê ya di navbera van herdu bendawarî û pêşdîtinan de şopand… Amerîka li Vîetnamê têk çû û winda kir; rejîmên Hîndî-çînî li du hev rûxîyan lê şorişeka sosyalîst ya dinyayê jî derneket holê!

Îro li erdnîgarîya Rojhilatê Navîn şerekî qederî ya bi endîşeyên cuda yên sîyasî û îdeolojîk rû dide û wisa xuya ye ku dê ev şer di şikilandina dahatîya dinyayê de dîyarker be.

Statuya Rojhilatê Navîn ku di pêvajoya du şerên mezin yên cîhanê de zêde neguherî bû, îro bi erdhejeka mezin vediguhere. Vê statuyê neteweya kurd mehkûmî bêqederîyeka mezin kiribû; neteweya kurd hatibû dabeşkirin, tu mafên wê yên neteweyî nehatibû naskirin û bê navber di bin çerxa zilm û zordarîya dewletên serdest de li ber xwe dida. **Beşîkçî** vê rewşê wekî statuyeka ji kolonîbûyinê jî xirabtir dest nişan dike..

Ev 20 salên dawîn pêvajoya ji nû ve şikildayîna statuya Rojhilatê Navîn tê jîyîn. Her ku stûnên bingehîn û kevîrên vê statuyê ji cihê xwe bilivin ji bo cıvata kurd derfetên bidestxistina azadîyê û xwedîderketina li çarenûsîya mafên xwe yên neteweyî derdikevin holê. Tevgera neteweyî ya gelê kurd her tim li Rojhilatê Navîn hêzeka bi tesîr bûye, lê êdî niha her diçe dibe hêzeka dîyarker. Gelo civata navneteweyî dê hîn jî bikaribe di derheqê daxwazên demokratik û azadîxwaz yên kurdan –ku civata navneteweyî bi salan ev daxwaz neditibûn û paşguh kiribûn-bêdeng bimîne. Êdî kurd bi biryar in ku di pêvajoya ji nû ve şikildayîna Rojhilatê Navîn de ne wekî bireser (obje), wekî kirde (sûbje) cih bigirin.

Hemû rejîmên totalîter yên ku ji alîyê şêx, emîr û hikûmetên leşkerî û burokratîk ve tên birêvebirin, di dema du sîstembûna sazûmana dinyayê de, her yekê di bin baskê sîstemekê de dikaribû serdestîya xwe bidomîne.

Bêsiûdîya gelê kurd ew bû ku civateka parçekirî bû û her parçeyên wê di bin lepên dîktatorîyên herêmî yên ku ji alîyê herdu sîsteman jî bi hesûdî dihatin piştgirîkirin de bû. Ji ber vê sedemê tu hêz û kampên navneteweyî, çi NATO-DYA û çi jî YKSS (Yekitîya Komarên Sovyetên Sosyalîst) û endamên kampa Varşovayê piştgirî nedidan tevgerên neteweyî yên gelê kurd. Ev herdu kampên sereke jî ji bo ewlekarîya hevkarên xwe yên herêmî, tevgerên neteweyî yên kurdan wekî tehlûkeyeka mezin didîtin. Vê parçebûnê di nav tevgera neteweyî ya gelê kurd de jî olan dabû, tevgerên kurd jî wekî alîgîrên van herdu kampan bûbûn du beş, nakokî û şerê navxweyî dest pê kiribû.

Gelo neteweya kurd dê bikaribê mafên xwe yên neteweyî yên ku sedsala çûyîn jê bêpar hatibû hiştin, dîsan bi dest bixe?

▶ R. 3

ASOYÊN DESTÊWERDANA NAVNETEWEYÎ DI SÛRÎYEYA XWÎNRIJYAYÎ DE

# Rewşeka vekirî û hin asoyên girtî

MARWAN OSMAN *

Bêhtirîn lêkolîn û nêzîkahîyên sîyasî, di derbarê rewşa Sûrîyeyê de, komelgeha navneteweyî û paytextên biryardar li cîhanê gunehkar dikin. Ji hêla piranîya alîyan ve, helwesta navneteweyî tê rexnekirin û şermezarkirin. Ji xwe bêhtirê alîgirên herdu alîyên dijhev li Sûrîyeyê – rêjîm û hêzên rikber – helwesta dewletên rojavayî û ya komelgeha navneteweyî wekî komplo dinirxînin. Her alîyek ji wan, komployê li ser alîyê xwe dibîne!

Piştî bi sed hezar kuştî, birîndar û kêmendambûyan, milyonên penaber û mişextan û wêrankirineka gelemper, hîna jî ti aso bo rawestandina vê prosesa ku ji du sal û nîvê ve li Sûrîyeyê berdewam e nehatîye dîyarkirin; hin bi hin, rewş kambaxtir dibe û ber bi asoyên girtî û tirsnaktir ve diçe. Tê xuyakirin; herdu alîyên dijhev, ên navxweyî, li Sûrîyeyê nikarin dawîkirinekê yan çareyekê ji şer û nakokîyên xwe re bibînin û pir zor e ku li nîvê rê pêrgî hev bibin û ji xwe dîrok jî venagere berî 15.03.2011an (1) û nema jî dikarin bibînin; ji ber dîwarên cografyaya Sûrîyeyê hatine herifandin, akamdar û çalakdar, di çarenivîsînê de,



ÖZGÜR EPÖZDEMIR: **Keştî I**, fotograf

# Şerê Balkanan, bîlançoya wî

JEAN-ARNAULT DÉRENS

Salveger li pey hev tên: 20 salîya destpêka dorgirtina Saray Bosnayê, ji 15 salîya destpêka şerê Kosovayê re hindik ma... Gelo dema dîrokê jî hat? Piştî şahidîyên şokker, analîzên bi zimbeya kunker, alîgirîyên di şer de, lêkolîneka objektîf ya şerê çekdarî yê dawî yê li Ewropayê di sedsala 20an de pêkhatî gelo mimkin e? Axaftinên propagandayê û dij-propagandayê gelo wê dawîyê li parçebûnê bînin? Dema meriv sê pirtûkên nû dixwîne, meriv der barê vê yekê de dikeve gumanan.

**Fabrice Garniron** dixwaze bi rêya prîzmaya awirê rojnameya *Le Monde*yê xwe li *"jihevderxistina şerên yugoslavî"* (1) biceribîne. Ew werçerxen pirî caran tên jibîrkirin bi bîr dixe. Bi vî awayî heta bi werçerxa salên 1990î rojnameyê bi awayekî biryardar pişta tercîha federalîst a yugoslavî digirt û bi gelek gumanan derketina holê ya daxwazên navendîbûnparêz dişopandin. Nivîskar mubalexekirina propagandayê, kurtebirîya gumanbar a hin întelektuelên pirî caran wekî referans ji ber wan dihat girtin binxêz dike û tunetîya naskirina trajedîya bosnayî ya dema Şerê Cîhanê yê Duyem îsbat dike ya ku bêhtir bi kêra tarîkirin û sergirtina rastîyê dihat û ne bi kêra destûrdayîna fêmkirina wê. Bi her halî, dema ku ew dîroka komkujîya bi rengê qirkirinê ya ***Srebrenîkayê*** dide ber xwe, xwe ber dide nav revîzyonîzmê, bi vê jî ew weha ferz dike ku jihevdekirina bûyerekê wê destûrê bide ku tevahîya tiştên meriv dizanin û yên hatine îspatkirin ji nû ve bixe ber lêpirsînê. Ev nêzîkatîya xwar xwe dispêre hîmekî besît ê îdeolojîk: ji ber ku rejîma **Slobodan Mîlosevîc** ji alîyê kesên ne bi dilê min ve hatîye reşkirin, nabe ku ev rejîm bi tevahî û ji binî ve xirab be.

**Pierre Péan** jî di berhema xwe ya dawîyê ya li ser şerê Kosovayê de tercîh dike ku helwêsta rojnamevan-dîrokzan dê rastkerê neheqîyan qebûl bike. Projeya wê bêhtir bi dildarî barkirî ye, loma ew hewl dide tevahîya dîroka şer û dema piştî şer ji nû ve binivîsîne, bi wî awayê ku ew bike ku şer bi rengekî global were fêmkirin, çawa ku sernavê pirtûkê jî bi kurtî derdibire: *Une guerre juste pour créer un Etat mafieux / Şerekî adil bi tenê ji bo damezrandina dewleteka mafyayî.* (2) Nivîskar komek bûyeran û şahidîyên para bêhtir bi wan tê zanîn bi awayekî liberhevgir kontrol dike, lê belê ji ber ku nikare wan di nava çarçoveyeka dîrokî de bi cih bike, ew nagihêje armanca xwe. Erê çerxa propagandayê ya rojavayî bêguman "teşe da" raya giştî di dema şerê 1999an de, lê belê ev têrê nake meriv mubalexeyan eşkere bike ji bo rastîyê ji nû ve saz bike. Wekî reaksîyona li hemberî sazîyên çapemenîyê yên ku wê *"ji arnawidan"* pêve kesî guh nedana wan, **Péan** bi awayekî merivî ecêbmayî bihêle alî digire di lêkolîna li ser Kosovoyê de, ew bi tu kesê arnawid re neaxifîye.

Nivîsa **Maya Kandel** bi xwe bi wê îdîayê radibe ku bêhtir hêjayî zanîngehê ye. Pirtûka wê ya ku encama lêkolînekê ye, der barê alîyekî taybet ê nazik ê şerên yugoslavî de ye: angajmana Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, ya ku pirî caran behsa wê tê kirin û ti carî bi vî rengî lê nehatîye kolan (3). Nivîskara ku xwe disipêre zanîneka tam a li ser çerxên biryardayînê yên amerîkî, rola lobîyan lêdikole, pêre jî ew bi bîr dixe ku lobîya sirban a li Washingtonê herî kêm bi qasî yên arnawid, bosnayî yan jî xirwatan xurt bû. Bi her halî, vîzyona dîroka şerên yugoslavî ku bingehê berhemê pêk tîne, teleolojîk [li gorî armancê] dimîne: divîyabû ku dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê dest werdana [şerî] li dijî sirban û nîqaşên dijwar ên ku Senato û Meclîsa Nûneran di navbera 1991 û 1995an de li ser mijara pirsa Yugoslavyayê dan ber xwe jî, di rastîyê de bi kurtî qaşo bi tenê rastîya bi awayekî her diçe bêhtir qebûlkirina wê "erkê" îfade dikin.

Ev gurmînî û xirecira angajmanan û vîzyonên alîgir, bêhtir dikin ku meriv hinekî din heyfa xwe bîne bi kêmbûna pir zêde ya lêkolîna zanîngehî ya li ser Balkanan. Dîroka şerên yugoslavî – û gihana di wan a li nav rayên giştî yên rojavayî – hîna jî divê were nivîsîn.

(1) **Fabrice Garniron**, *Quand* Le Monde… *Décryptage des conflits yougoslaves / Herçî* Le Monde *ye… Jihevderxistina şerên yugoslavî,* Elya Editions, Grenoble, 2013, 456 r., 26 ewro.

(2) **Pierre Péan**, *Kosovo. Une guerre juste pour créer un Etat mafieux / Kosova. Şerekî adil bi tenê ji bo damezrandina dewleteka mafyayî,* Fayard, Parîs, 2013, 458 rûpel + lêzêdehî, 24 ewro.

(3) **Maya Kandel**, *Mourir pour Sarajevo ? Les Etats-Unis et l'éclatement de la Yougoslavie / Mirina ji bo Saray Bosnayê? Dewletên Yekbûyî û parçebûna Yugoslavyayê* , CNRS Editions, Parîs, 2013, 384 r., 25 ewro.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

## JI ÇAPEMENÎYÊ

### AFP

Di nava geremola Sûrîyeyê de, di nava nûçe û şiroveyên sazîyên çapemenîyên sereke de kurd jî cihekî girîng digirin. Biryara *Encûmena Neteweyî ya Kurd li Sûrîyê*-ENKSyê ya tevlîbûna nav refên mixalifên Sûrîyeyê, di çapemenîya navneteweyî de zêde cih negirtibe jî biryara erêkirina Koalîsyona Neteweyî ya Sûrîyeyê ya vê tevlîbûnê cihê xwe di ajansan de girt. Ajansa nûçeyan a fransî AFPyê bi sernûçeya *"mixalefeta Sûrîyeyê biryar da bêhtir kurdan bihewîne nav xwe"* di 18ê îlonê de ragihand aboneyên xwe. Nûçe radigihîne ku kurdên Sûrîyeyê bi mixalefeta sereke ya Sûrîyeyê re li hev kirine, li ser wê yekê ku bêhtir kurd di nava Koalîsyona Neteweyî ya Sûrîyê de cihê xwe bigirin.

Jixwe ji naveroka lihevkirinê bêhtir hejmara endamên kurd ên di koalîsyonê de wekî mijara li ser hatî li hevkirin bi gotinên berdevkê koalîsyonê **Lûay Safî** tê dayîn: *"Koalîsyona Neteweyî û Encûmena Neteweyî ya Kurd roja yekşemê li hev kirin ku bêhtir endamên kurd bikevin nava koalîsyonê".*

Ji endamên Encûmenê **Bezad Ibrahîm** jî dema ev lihevkirin erê kirîye, gotîye, ne dîyar e ka çend endamên nû yên kurd wê di koalîsyonê de cihê xwe bigirin.

Berdevkê Koalîsyona Neteweyî **Safî** ji alîyê xwe ve got, ev lihevkirin ne belgeyeka hiqûqî ye. Ev lihevkirineka sîyasî ye ku nîyeta baş nîşan dide. Lê belê tiştê ku ew derdixe pêş, ajans bi vî rengî radigihîne: *"... navê welêt ê fermî ango **Komara Ereb a Sûrîyeyê** wê neguhere, tevî ku kurd ji mêj ve dixebitin ji bo ku ev nav wekî **Komara Sûrîyeyê** were guhertin."*

### Reuters

Elaqedarî rewşa Sûrîyeyê nûçeyeka hêja ye meriv behsa wê bike li ser penaberên ji Sûrîyeyê yên li başûrê Kurdistanê ne. Reutersê 15ê îlonê bi sernûçeya "Kurdên Iraqê li nav şirketên petrolê, ji bo penaberên ji Sûrîyeyê li fonan digerin" nûçeyek li ser vê babetê ragihand. Li gorî nûçeyê Herêma Başûrê Kurdistanê ji şirketên li herêmê dixebitin doza 50 milyon dolar alîkarîyê kirîye ji bo barê wê yê alîkarîya bi penaberên ji Sûrîyê re kêm bike.

Nûçe bi bîr dixe ku qederê 200 000 penaberên ji Sûrîyeyê ku gelek ji wan bi xwe kurd in û ji du salan û vir ve ye, herikîne herêma Kurdistanê, lê belê ji tebaxê û vir ve jî ji dema rojavayê Kurdistanê jî bûye cihê şerî 40 000 kesî penaya xwe gihandîye herêmê. Daxuyanîya wezîrê çavkanîyên xwezayî yê herêma Kurdistanê **Aştî Hewramî** jî bi rêya ***reuters***ê gihîştîye raya giştî ya navneteweyî: *"dema meriv asta dêwane ya krîzê û hejmara penaberên rojane [tên herêmê] li ber çavan bigire, hingê [dibîne ku] divê em hemû bi hev re bixebitin da ku alîkarîya lezgîn dabîn bikin."* Ji bo vê jî, li gorî nûçeyê, Hikûmeta Herêma Kurdistanê misoger kirîye ku ew dê bêşê ji pîşesazîya petrolê bistîne.

### Courrier International

Hilbijartinên li Kurdistana Başûr jî yek ji wan mijaran bû ku di çapemenîya navneteweyî de cihê xwe girtibû. Kovara sîyaseta derve ya fransî ***Courrier International*** 23yê îlonê bi sernûçeya ***"hilbijartineka herêmî bandoreka global"*** girîngîya hilbijartinên li Kurdistanê binxêz kir. Sedema vê bi hevoka li jêr rave dike: *"Li Kurdistanê erdên petrolê yên hîna kêm ji wan sûd hatî wergirtin hene ku ji bo tevahîya dinyayê balkêş in."* Tevahîya nûçeyên li ser hilbijartinên Kurdistanê rêjeya tevlîbûnê ya % 74 û bi awayekî bêpirsgirêk birêveçûna hilbijartinan derxistin pêş.



ÖZGÜR EPÖZDEMIR: **Beriqîn III**, fotograf

### BBC

"Gelo pêvajoya aştîyê ya Tirkîyeyê bi kurdan re hildiweşe?", sazîya çapemenîyê ya brîtanî BBCyê 9ê îlonê ev pirs ji xwe pirsîye. Di vê gotara ku mohra **Mahmut Hamsici** li binî ye, behsa ragihandina rawestandina vekişîna hêzên gerîla ji Tirkîyeyê tê kirin. Gotinên **Cemîl Bayik** ango Hevserokê Konseya Birêveber a ***Koma Civakên Kurdistanê*** KCKyê ji bo qismê duyem ê pêvajoyê di gotarê de li pêş in: "dema ku dem hat... dewleta tirk tu gav neavêt û dest bi dîtina behaneyan kir". Gotar dibêje, dîsa jî Serokwezîrê Tirkîyeyê PKKyê gunehbar dike bi venekişînê yan jî kêm vekişînê. Peyvên cîgirê serokwezîrê tirk Bekir **Bozdag** ên wekî *"rêxistina terorê çi dike bi dilê wê ye. Lê belê Tirkîye wê tiştê divê were kirin dê bike"* jî di gotarê de îşaret pê dikin ku hikûmet dixwaze li gora serê xwe tevbigere û ne li gorî "lihevkirinê". Bi her halî gotar balê dikşîne ser "paketa demokrasîyê" ya ku hikûmet amade dike û dibêje ji ber rengê wê yê yek alî **Bayik** bi gotinên "bêyî ku bi alîyê kurdan re were axaftin hat amadekirin" wê rexne dike. Gavên ku PKK dixwaze bibîne li gorî gotarê dawîanîna çêkirina qereqolan û bendavan li herêmên kurdan, başkirina rewşa girtina "leader [serok] **Abdullah Ocalan**" û berdana bi hezaran girtîyên sîyasî yên kurd.

*"Ew ji bo şer xwe amade dikin. Ya rastî ew xwe ji şerekî mezin re amade dikin. Em bi vê dizanin"* peyvên Bayik in ên ku pê dibêje bi pêvajoyê **Erdogan** dixwaze alîyê kurdan bilebikîne da ku di hilbijartinên herêmî de, piştre jî di yên giştî û serokkomarîyê de bi ser keve.

Tevî ku rayedarên hikûmetê îdîa dikin ku pêvajo dewam dike û PKK alozîyê diafirîne jî, daxuyanîya hevserokê Partîya Aştî û Demokrasîyê BDPyê **Selahattin Demirtaş** eşkere nîşan dide ku hêvîyên ji serketina pêvajoyê gelekî lawaz bûne. Tesbîta gotarê *"pêvajo xwe dispêre hevdîtinên di navbera Ocalan û rayedarên hikûmetê de, lêbelê alîyê sêyem nîne, erêkirineka raya giştî nîne û pêvajo mişt e ji xalên zelûl û tarî"* belkî jî bi awayekî kurt û kurmancî fikra sereke ya kovarê û pirsgirêka sereke ya "pêvajoya aştîyê" jî derdibire.

**Le Monde diplomatique kurdî (Çapa elektronîk)**
Ji aliyê Independent Kurdish Media Group GmbH ve tê weşandin

**INDEPENDENT KURDISH MEDIA GROUP GMBH**
Carnotstr. 4
10587 Berlin / Almanya

**Lijneya Weşanê**
Murad Satik
Riza Dînç

**Le Monde diplomatique kurdî**

**Redaksiyona Zimanî**
Mahmûd Lewendî
Nedîm Baran

**Koordînasyon**
Yado Ciwan

**Alîkarên vê hejmarê**
Semra Polat

**Revîzyona Wergeran**
Feryal Guladawîya

**Berpirsê Hunerî**
Hasan Huseyîn Deveci

**Designer**
Fabio Biasio

**Web Developer**
Erhan Yekta

Tel: 00 49 (0)30 330 990 420
Fax: 00 49 (0)30 330 990 429
info@diplo-kurdi.com
www.diplo-kurdi.com

**ABONETÎ**
Independent Kurdish Media Group GmbH

Berliner Volksbank
Konto: 2284 123 010
BLZ: 100 900 10
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 00
BIC/SWIFT: BEVODEBB

**Abonetîya dîjîtal ya salane: 30 €**

**Le Monde diplomatique**

**Damezrîner**
Hubert Beuve-Méry

**Birêveberê giştî**
Serge Halimi

**Sernivîskar**
Maurice Lemoine

**Cîgirên Sernivîskarî**
Martine Bulardi
Philippe Rivière
Anne-Cécile Robert

**Redaksiyon**
Alain Gresh
Mona Chollet
Pierre Rimbert
Dominique Vidal

**Birêveberê hunerî**
Alice Barzilay

**Dokumantasyon**
Olivier Pironet

**Sekreter**
Sophie Durand
Monique Salomé

Tel: 00 33 (0) 153 94 96 01
Fax: 00 33 (0) 153 94 96 26

1-3, rue Stephen-Pichon,
F-75013, Paris, France

# … Du… sê… hîn zedetir Kurdistan! (Dewama rûpela 1)

## Vegotina "heyama netewe-dewletan qedîya"

Li Tirkîyeyê di salên 90î de bi taybetî teorîsyenên kadîbûne (kureyîbûn), neo-lîberal û îdeologên çepgir yên rexnegirên cîhanîbûnê digotin û dubare dikirin ku *"êdî heyama netewe-dewletan bi dawî bûye."* Wekî mînak jî avabûna Dewleta Ewropayê dest nişan dikirin. Li gor wan êdî daxwaza kurdan ya serxwebûna neteweyî û mafê avakirina dewleteka serbixwe jî li paş mabû û bê wate bû.

Lê geşepêdanên van salên dawîn xwedîyê van teorîyan tekzîp kirin, di 20 salên dawîn de tenê li Ewropayê 16 dewletên nû serxwebûna xwe îlan kirin. Ev 16 dewlet jî endamên Yekitîya Sovyetan û federasyonên wekî Yugoslavyayê bûn. Ev netewe-dewletên nû dewletên Ewropayê jî di nav de ji alîyê gelek dewletan ve zû hatin naskirin. Dewletên wekî *Kosova, Makedonya, Karadag û Slovenya* hem ji alîyê mezinîya erdên xwe û hem jî ji alîyê gelhê ve herêmên piçûk in.

Hin herêmên parzemîna kevn yên wekî Bask, Katalan û Îrlanda hem statuyên federalî bi dest xistin û hem jî dev ji daxwazên xwe yên serxwebûnê bernedan. Ji vana jî wêdetir daxwaza serxwebûnê ya Skoçyayê ku şirîka bi hêz ya Împaratorîya Brîtanyayê ye, ji nû ve jîn da.

Li du belavbûna YKSSyê jî rêzek dewlet serxwebûna xwe îlan kirin, em şer û îlankirinên sexwebûna dewletan ya li Kafkasyayê –ku demek wekî "derîyê qewman" dihat binavkirin- jî bêjin…

Hemû ev mînak û rastî tiştekî fêr dike; vegotina **"heyama netewe-dewletan qedîya"** ku tenê li dijraberî daxwaza serxebûna kurdan tê parastin, heta ev daxwaz wekî pêngava li dijî hevdembûnê û daxwazeka bi xeter tê destnişankirin, ne teorîyeka rast e. Beravajî vê teorîyê li seran serî dinyayê pêvajoya azadîya neteweyî û xwedî li nasname û çanda neteweyî derketin berdewam dike. Ji alîyekî ve daxwaza rêzgirtina ji cudahîyên etnîkî, çandî û dînî, ji alîyê din ve jî bi şêweyeka azad avakirina sazûmanên hevpar li gel hev dikare bê birêvebirin. Ev herdu daxwaz li dijraberî hev tê xuyakirin, lê ev pêvajo di rastîya jîyanê de hevûdin temam dikin…

Gelê kurd xwedîyê gelheyeka zînde ya 35 mîlyonî ye û tu mafên wê yên neteweyî ji alîyê sazîyên navneteweyî ve nehatîye naskirin. Redkirina hewldana gelê kurd ya ji bo bidestxistina mafê xwe yê çarenûsîyê bi qasî ku ji alîyê teorîyê bê binyad e, ewqas jî ji alîyê exlaqî ve bê binyad e.

## Kurd li Rojhilatê Navîn dînamîzma demokrasîya şorişger in

Dema DYA û hêzên koalîsyonê li Îraqê rejîma Seddam rûxandin, hêzeka dînamîzma demokrasîyê derneket holê. Tiştê ku derket holê ji şideteka kor ya li ser hîmê cudahîyên dîn û mezheban wêdetir tiştek nebû. Li gel vê yekê li Kurdistanê ku di nav dewleta Iraqê ya çêkirî û sûnî de her tim xweserîya xwe parastibû, sîstemeka azadîxwaz, demokratîk û xweser wekî hêvîya aştîyê derket holê. Ev ezmûn û geşepêdana li Iraqê, dest nişan kir ku kurd dê li Rojhilatê Navîn, Tirkîye, Îran û Sûrîyeyê jî bibin hêmana bingehîn ya sazûmana demokratîk.

Bi pêvajoya ku di 2010an de dest pê kir û wekî "Bihara Ereban" hat binavkirin, hin rejîmên dîktator rûxîyan lê mixabin rêyeka ku li dewsa rejîmên dîktator rejîmên demokratîk bên avakirin nehat şopandin. Rejîmên dîktator çûn lê cihê wan ji alîyê hêzên îslamî yên fûndemantalîst ku bi qasî wan dîktatoran paşverû û dijminê demokrasîyê ne, hat dagirtin. Ev rejîm dixwazin di zûtir demê de dîktatorîyên îslamî ava bikin. Mînakên Lîbya û Misirê tabloyeka reşbîn derxist holê. Li Sûrîyeyê sê sal in li dijî rejîma **Esad** têkoşîn berdewam e. Ezmûna hêzên "mixalîf" ya di pêvajoya vê têkoşînê de gelek hovane û tirsnak e.

Artêşa Azad ya Sûrîyeyê (FKS) û hêzên mixalîf ku DYA û YE (Yekitîya Ewropayê) û dewletên herêmî yên wekî Tirkîye, Erbîstana Siûdî û Qetar jî piştgirîyek mezin didin wan, ji xwedîbûna bernameyeka demokrasi û azadîxwastîyê gelek dûr in. Grûpên ku di nav şer de dîyarker û bi hêz in, ji mucahîdên misilman ên sunî pêk tên. Yek ji van grupên bi El-Qaîde re têkildar e *Cepheya El Nusra* ye. El Nusra piştgirîyê ji Tirkîyeyê werdigire û bi taybetî li herêmên kurdan têkoşîna serdestîyê dike. Li gel van taybetîyên Cepheya Mixalif gelên hirîstîyan, elewî, grupên dînî, grupên bawerî û etnîkî di nav tirseka mezin de ne û ji bo dahatîya xwe reşbîn in.

Ji ber vê yekê her çiqas kes nexwaze di bin serdestîya dîktatorekî de bijî jî zemîneka demokratîk ya hevpar tuneye; hilweşîna ji sedemên şer û alozîyan rû daye, koçberî, birçîtî û mirin mercên ji nû ve bihevrejîyanê her diçe dijwartir dike.

Tevgerên neteweyî û demokratîk ên kurdan bi piranî sekuler, hevdem û demokratik in. Bi van taybetmendîyên xwe tevgerên kurdan xwedîyê şanseka mezinin ku bikaribin herêmên federal li Rojhilatê Navîn wekî qadên demokrasi û azadîya rastîn derxin pêş. Li Rojhilatê Navîn hêza yekane ku pê bê bawerkirin û pişt pê bê girêdan tevgera neteweyî ya kurdan e. Tevgera neteweyî ya kurdan wekî dînamîka demokrasi û azadîyê namzedê wergirtina rolên girîng e. Lê gelo dê bikaribe vê rolê bilîze?

Li vê cografyayê hêza herî dînamîk û hêvî dide û di heman demê de xwedîyê nirx û îdolên merivayîyê yên herî bilind wekî demokrasî, pirdengî û azadîyê tevgera neteweyî û demokratîk ya gelê kurd e. Her çiqas dînamîkên wê yên hundirîn hatibin parçekerin û li dijî zordestîyê bi psîkolojîya xweparastinê hunandî be jî, civata kurdî û hêzên wê yên dînamîk yên têkoşer xwe dest nîşan dikin û her diçe dîyarker dibin.

Têkoşîna neteweyî û demokratîk ya gelê kurd dikare li gel xwe hemû hêzên şorişger û dînamîk yên civatên ku li vê herêmê bûne qurbanîyên statuyê ji nû ve zindî bike, derxîne holê. Gelo bi rastîn jî dê bikaribe vê potansîyelê bi kar bîne?

## Rojava...

Rojava… Ev nav heta çend meh berê ji alîyê kêm kesan dihat zanîn û tenê tevgera kurdî ev nav bi kar dianî. Ev nav parçeya başûrrojavayê Kurdisatanê ku di bin serdestîya dewleta Sûrîyeyê de ye îfade dike. Li bakur ev herêm bi piranî wekî **"bin xetê"** ango hêla din a sînorê/binê sînorê dihate binavkirin. Çawa ku di 1915an de qurbanên jenosîda ermenîyan nefî kiribûn herêma ***Deyr-el Zorê***, bin xetê di pêvajoya serhildanên 1925-38an de ji bo eşîr û malbatên kurdan yên welatparêz bûbû cihê xwespartinê. Di wê heyamê de dewleta Sûrîyeyê di bin rêveberîya Fransizan de bû û sîyaseteka li dijî kurdan ne di rojevê de bû.

Îro êdî li Tirkîyeyê peyva **"Rojava"** hawirdorên şovenîst jî di nav de ji alîyê herkesi ve tê bikaranîn û ketîye wêjeya sîyasetê jî. Cara yekem e ku têgiheka ku tevgera kurd bi kar tîne ewqas bi berfirehî tê pejirandin.

Halbûkî bi piranî tevgera neteweya kurd bi têgihên wekî "terorîst", "eşqiyayê dabeşkar" dihat destnîşankirin, dihat piçûkxistin û hebûna wê dihat redkirin. Berî niha sazîyên fermî yên tirk ji bo Rojava binavkirinên wekî "seranserî sînorên me yên Sûrîyeyê tercih dikirin lê edî wisa xuya dike ku ew jî elimîn vegotina ***Rojava***yê. Dibe ku ji dêlva peyva Kurdistanê an jî bakurê Surîyeyê bikaranîna peyva Rojava ku ji bo civata wan jî peyvek bîyanî ye, tercih kiribin. Ji ber kîjan sedemê dibe bila bibe, tercîhkirina peyva Rojava ji alîyê pejirandina rastîyên civatî û sîyasî ve gelek girîng e…

Gelheya civata kurd a li parçeyê Sûrîyeyê nêzîkî 2,5 milyon e. Civata kurd a Rojava nêzîkî sed sal e di pêvajoya têkoşîna rizgarîya neteweyî de hem ji alîyê entelektûelî û hem jî alîyê civakî ve roleka gelek girîng lîstîye û her dem piştgirîya têkoşîna parçeyên din kirîye. Bi vê taybetmendîya xwe xwedîyê hesteka mezin ya welatparêzîyê bûye. Li Sûrîyeyê di serdestîya rejîma Baasê de kurd xwedîyê statuya hevwelatîyê jî nebûn. Kurd wekî penaberên bakurî dihatin pejirandin. Li gel vê yekê kurdên Sûrîyeyê piştgirîya lojîstîk û sîyasî dan têkoşînên parçeyên din; hikûmeta Sûrîyeyê jî bi rêxistinên kurdan yên mixalif re her dem têkîlîyên nefermî didomand û dixwest wan bigire bin kontrola xwe. Hikûmeta Sûrîyeyê van têkilîyên xwe berê bi **PDK** û **YNK**yê re, dû re jî bi **PKK**yê re li dar xist. Sûrîye di heman demê de hem baxçeya lojîstîk ya tevgera Filistînê bû hem jî li paş cûnteya leşkerî ya 12 îlonê ji bo grupên radîkal yên çepê tirk û kurd stargeha yekem bû.

## Li dijî rejîmê yekemcar kurdan serî hilda

Li Sûrîyeyê li dijî rejîma **Esad** ji bo daxwaza azadîyê yekemcar kurd serî hildan. Wê demê ku hîn li ortê bayê "bihara ereban" tunebû, di 12ê Adara 2004an de gelê kurd bi girseyî serî hilda û raperîna xwe bi mehan domand. Ji ber hêzên navneteweyî nedixwestin li gel Iraqê cepheya duyem vekin, piştgirî nedan serhildana kurdan û çavên xwe ji zordestîya Esad re girtin.

Desthilatdarîya Tirkîyeyê jî ku îro li dijî rejîma Esad bi tundî helwest girtîye û dijminê sereke ya rejîma Esad e, wê demê bi rejima Esad re di nav têkilîyên germ de bû û bi Sûrîyeyê re têkilîyên ku wekî "yek dewlet" bin, li dar dixist.

Di 2011an de fitîlê xwepêşandanên li dijî rejime jî li herêmên kurdan hatibû vêxistin. Lê ji sedema ku têkilîyên kurdan bi mixalifên Sûrîyeyê re ne baş bû, kurd bi hêsanî wekî "piştgirên rejîma Esad" hatin sûcdarkirin. Di paşxana vê sucdarkirinê de girêdayin û têkilîya PYDyê ya bi serokatîya PKKyê re hebû. Geşepêdanên di pêvajoya bûyerên li Sûrîyêyê de diqewimin derxist holê ku mixelafeta kurdan hem bi rejîma Sûrîyeyê re û hem jî bi mixelefeta Sûrîyeyê re nikare ji bo gelê kurd dahatîyekê ava bike. Divê mixelefeta kurd rêyeka sêyem ya bi mentiqî bişopîne.

## Rêya sêyem ya kurdan

Hin grûp û rêxistinên kurdan ketin nav mixalefeta Sûrîyeyê. Lê di nav pêvajoyê de hat ditîn ku di paltformên mixalefeta Sûrîyeyê de lêgerînên çareserîyê bê wate ne. Hin serokên grûpan yên li sirgûnê û sîyasetvanên xwedîyê mîsyoneka dîplomatîk jî li welat xwedîyê hêzeka girseyî û dîyarker nebûn. Ji ber vê yekê derfeta wan tunebû ku weki li Iraqê qewimî bû, ango li dû midexeleyeka leşkeri bibin desthilatdar.

Ji ber van sedeman mixelefeta kurd ji xwe re rêyeka sêyem hilbijart, li herêmên kurdan bêyî ku bi hêzên rejîmê û bi hêzên *Arteşa Azad ya Sûrîyeyê* re şer bike sîyaseta desthilatîya herêmî şopand. Ev sîyaseta rêya sêyem jî li herêmê **PYD**yê bi hêztir kir. Her çiqas **PYD** derkeve pêş jî li herêmê grupên kokdar û bingehîn yên alîgirê **PDK**ê jî hene. Bê guman hevkarî an jî nakokîyên di nabvbera van hêzan de, dê di tayînkirina qedera herêmî de dîyarker bin. Li Herêma Federal ya Kurdistana Başûr jî kampên gerîlayên **PKK**yê hene, ji salên 2000î vir ve di navbera PKK û desthilatîya herêma federal de têkilîyên aştîyane hene. Ev têkilî ji bo têkilîyên li Rojavayê jî dikare bibe modelek.

Li vê derê divê bal bê kişandin li ser vegotina aştîxwaz û hevkarîxwaz ya serok **Barzanî**. Barzanî dibêje: *" Êdî em tu car destûrê nadin şerê birakujîyê."* Bi nakokî û pirsgirêkan bimeşe jî bi navê *Desteya Bilind ya Kurd* cepheyeka hevpar ava bû. Di encamê de di 2012an de avakirina Desteya Bilind ya Kurd, bi destxistina desthilatîya rêveberîyên herêmî bi dawî bû.

Tirkîye ji van geşepêdanan gelek aciz e, lê ji bo bikaribe li pêşîya van geşepêdanan bibe asteng di deste wê de alternatîfeka leşkeri jî tuneye. Ji ber ku ***PYD*** beşdarî Artêşa Azad a Sûrîyeyê nebû propangadîstên tirk wê wekî *"alîgirê Esad"* dest nîşan dikin û bi armanca pêşî li serkeftîyên **PYD**yê bigrin piştgirîyeka mezin didin rêxistinên wekî *El-Nusra* û van rêxistinan teşwîq dikin ku li herêmên kurdan bibin desthilatdar. Lê geşepêdan li gorî daxwazên Tirkîyeyê rû nadin, **PYD** li herêmê her diçe kontrol û desthilatîya xwe zêdetir dike.

Niha jî tê ditîn ku Tirkîye dixwaze bi bikaranîna rêya sîyasetê tesîra xwe li ser **PYD**yê zêdetir bike. Gelek çavdêrên sîyasetê hevfikir in û dest nîşan dikin ku di paşxana hevdîtînên navbêra rêveberên ***MÎT*** û **Ocalan**î de û di paşxana"pêvajoya çareserîyê" de sedema sereke rewşa Sûrîyeyê ye.

Ez jî vê ramanê rast dibînim; hikûmeta **Erdogan**î ji bo ajandeya sîyaseta xwe ya navxweyî (wekî mînak makezagona nû, sîstema serokatîyê û di sê hilbijartinên pêşîya me de bidestxistina serkeftinê) hewcedarîya pasîfîzekirina mixalefeta kurd pêwîst dibîne. Li gel vê yekê di qada mijara sîyaseta derve de li gorî daxwaz û berjewendîyên xwe çareserkirina kêşeya Sûrîyeyê wekî pêngaveka stratejîk dinirxîne û girîngîya jîyanî dide vê pirsgirêkê. Ji bo bikaribe bigihîje armanca xwe jî dixwaze hêzeka wekî **PKK**yê –xwedîyê hêzeka girseyî ye- ji xwe re bike yedek, biewiqîne an jî qet nebe wê ji aktorîya dijberîyê derxe.

Gelo bêyî ku gaveka girîng bavêje û tenê ji alîyê şertên jîyana rojane ve mercên Ocalanî piçek baştir bike dê vê konseptê bikaribe heta kuderê bimeşîne; di qada konjonktura navneteweyî de ji sedema profîla tirsnak ya mixalefeta Sûrîyeyê tê ditîn ku çareserî ne nêzîk e. Di vê pêvajoyê de dibe ku Rojava, wekî herêmeka bîîstîqrar, azad û demokratîk (wekî Herêma Federal ya Kurdistanê) statûyeka meşrû ya navneteweyî bi dest bixe.

## Ne tenê kurd, ji bo hemû civatên bi tehlûkeya etnîkî û dînî ve rû bi rû ne, dahatîyek

Kurd herêmên azad diafirinîn lê li gel vê yekê ji ber ku herêmeka multî çandî, pir neteweyî û pir dînî ye hewcedarîya bernameyeka hesas ya demokrasîyê heye. Bernameya ku tê de kurd, asûrî-suryanî, ermenî, erebên sunî û alewî (nûseyrî) xwedîyê maf û azadîyên wekhev bin…

Li herêmên ku desthilatîyên kurdan tê avakirin ne bernameyên "kurdkirinê", bernameyên "azadkirinê" tê lidarxistin. Ez vê pêngavê wekî helwesteka gelek girîng û şahane dinirxînim. Ev pêngav vê yekê îfade dike: gelê kurd di pêvajoya azadkirina xwe de li gel xwe gelên herêmî yên kevn û qedîm, grupên etnîkî, bawerî û çandan jî azad dike. Cografyaya ku em li ser dijîn di heman demê de welatê hevpar e ku bi hezar salan e medenîyetên herî kevn li ser çirisîne û vemirîne, netewe, çand û dînên cuda li ser jîyane û di heman demê de têkoşîna hebûn û tunebûnê dane. Civata kurd bi şêweyekî pir vekirî dîtîye ku ji bin nîrê neteweyên serdest de azadbûn ne mimkin e. Pir baş dizane ku li dorhêla wê netewe û civatên ne azad hebin dê ew jî azad nebe, lewre di nav atmosfereka azad ya hevpar de dê bikaribe xwe jî azad bike.

Berdewamîya atmosfereka aştî û demokrasîyê ancax di navbera gel, grûpên dînî, grûpên etnîkî û çandan de bi afirandina têkilîyên demokratîk û pirdengî mimkin e.

Demeka berê Kurdistaneka xweser jî wekî xeyal dihate dîtin. Geşepêdanên tê jîyan dest nîşan dike ku xweser, federatîf an jî serbixwe dê ji yekî zêdetir Kurdistan hebe.

* Nivîskar

Wergera ji tirkî: Nedîm Baran

# Rewşeka vekirî û hin asoyên girtî (Dewama rûpela 1)

nema tenê yên navxweyî ne, hevpeywendîyeka berfireh, bingehîn û xurt, di navbera rewşa Sûrîyeyê û arîşe û pirsgirêkên herêmê û cîhanê de, hatîye damezirandin. Rengvedanên pêvajoya rewşê li Sûrîyeyê, dibe ku bi berfirehî û bi awayine mezin, bigihêjin tevahîya dewletên Rojhilata Navîn. Gelek eger û sedemên ku ji şorişa Sûrîyeyê re paşxane ne, bi ast û rade ne bêhtir an kêmtir, di piranîya dewlet û komelgehên herêma Rojhilatê Navîn de hene. (2) Ev yek, tev hin sedemên din, dihêle ku têkeldarîyeka berfireh bi guhertin û veguhestinên Sûrîyeyê re hebe û tewer û asoyên rewşa Sûrîyeyê li piranîya herêmê bi bandor û akamdar be! Ji ber vê yekê jî; her alîyek ji alîyên herêmê dixwaze rûyê pêvajoya bûyeran li Sûrîyeyê ber bi berjewendî û pêwîstîyên xwe ve bide, heger nikaribe kar ji şorişê bibîne, hema zîyanê jî jê nebîne!

## Berbadbûna xêzên sor

Dibe rexnekirin û şermezarkirina komelgeha navneteweyî, di pêvajoya rijandina xwînê, komelkujîyê û nebûna asoyên çareserkirinê de, werin têgihiştin; nemaze hemû alîyên navneteweyî, ne tenê destêwerdana leşkerî nakin, bi erkên xwe yên merivanî û sîyasî jî, li gor pêwistîya rewşê ranabin. Çav li ser dîmenên xwînî û qirkirina rojane li Sûrîyeyê têne girtin. Sûrîye xwe hemberî kuştinê, dor û pişt vala dibînin! Ji despêka şorişê ve, pir gefên giran ên herêmî û cîhanî li rêjîma **Beşar El Esed** hatin kirin û pir *"xêzên sor"* hatin danîn; ji gefxwarina pêşîn a **Recep Tayip Erdoğan** (3) ta gefxwarina bikaranîna çekên kîmyayî ya Amerîka û hin dewletên rojavayî, lê hemû *"xêzên sor"* hatin derbaskirin û dirandin û gef man gef, nehatin bicihkirin û pêkanîn.

Gefên pêknehatî dibe cara pêşîn û yekem kêrdar bin, lê gava pir bibin bê ku werin wergerandin, zîyana wan dê bêhtir be ji nebûna wan.

Rêjîma **Beşar El Esed** , bi hêsanî, hemû cûreyên çekan, ên rewa û yên qedexekirî, bikar anî. Û xuya ye, bikaranîna çekên kîmayî jî wê dîsan, bi hêsanî jê re derbas bibe û piştî **Beşar El Esed** biryara kontrolkirin, jihevxistin û tunekirina çekên kîmayî pejirand, dibe bikaranîna çekên kîmyayî jê re bibe derfetek ku xwe bi komelgeha navneteweyî re bide pejirandin, bi kêmî heya derbasbûna saleke din, a ku hatîye destnişankirina bo tunekirina çekên kîmyayî!

## Dergehên girtî yên destêwerdana navneteweyî

Komelgeha navneteweyî xwe behanedar dibîne; pêvajoya rewşê di Sûrîyeyê de ber bi şerên "dirindeyî" ve diçe; sinorên rewiştî û sirincî di navbera alîyên şervan de teng dibin, hêzên şorişger ên çekdar, hin bi hin, taybetmendîyên xwe yên şorişgerane winda dikin; kirdeyên wan nêzîkî kirdeyên rêjîma **Beşar El Esed** dibin û armancên pêşîn ên şorişê, wek "azadî, rûmet, gelê Sûrîyeyê yek e, rizgarî û şorişa hemû sûrîyeyîyan bo hemû sûrîyeyîyan", bi amadebûna hin armancên din lawaz û qels dibin, nîşan û dirûşmên Sûrîyeyê li hemberî nîşan û dirûşmên paşşînor, hin bi hin, di nav grupên şorişger û çekdar de kêm dibin. Dîsa pirsgirêk û arîşeyên bingehîn ên komelgehê di bin sîwana acendeyên din de tên nixumandin, mîna 60 salên derbasbûyî!.

Di her astê de li hemberî helwesta navneteweyî meriv mest û matmayî dimîne. Ranebûna komelgeha navneteweyî bi destêwerdaneka leşkerî, dibe ku were têgihiştin, lê pir awa û derfetên din hebûn, heger bixwesta ji gelê Sûrîyeyê re alîkar be; bi kêmî, ku bi wan rabûba yan ew pêk anîbana wê gorîyên *"dasa qirkirinê"* ya **Beşar El Esed** hindiktir bûbûna û wê hevkarî di amadekirin û xweşkirina zemîneya çareserkirinê de kiriba. Û ji hêleka din ve, wê dergeh li pêş hêz û alîyên tundrew û terorîst, ên ku ji paş sînorên herifî berî Sûrîyeyê didin û Sûrîyeyê weî xaka ***"Têkoşîna olî"*** bi nav dikin, tengtir bibaya û wê nema karîbana bi hêsanî hembêzgeha xwe ya civatî, di nav sûrîyeyîyan de, peyda kiribana.

Xwendin û şirovekirina helwesta navneteweyî, derbarê rewşa Sûrîyeyê de wekî komplo, ne tenê kêm e, lê seqet û sadedîtin e. Meriv nikare wê bike bingeh ji xwendin û nêzîkahîyeka zanyar re. Pir sedem û eger dihêlin ku helwesta navneteweyî li hemberî şorişa Sûrîyeyê ber bi hêlekê tenê ve biçe û bi hêzên şorişê û gelê Sûrîyeyê re ne pir alîkar be.

Ezmûnên Amerîka û Rojava, li Efxanistan, Îraq, Lîbya û hin deverên din, eşkere dike ku pêkanîna demokrasîyê û bingehdarkirina guhertinên civatî, sîyasî, rewşenbîrî û perwerdeyî berhemhênanên proseseka dîrokî navxweyî ne, ji alîyên paşşînoran ve, bi hêza tank, top û balifiran nayên pêkanîn û pejirandin. Ji alîyekî din ve dibînin ku arîşe û pirsgirêkên Sûrîyeyê ne tenê bi guherîna **Beşar El Esed** têne çareserkirin.

Dibe ku ev dîtin, heya radene bilind, di cihê xwe de û rast bin, lê ji bilî wan, pir eger û sedemin din hene nahêlin helwest li hemberî kirdeyên dirindane yên rêjîma **Beşar El Esed** , dijwar û tund bibe; ew jî bi bihayên giran ên destêwerdanê ve û bi têkeldarîya rewşa Sûrîyeyê bi rewşên herêmê yên tirsnak ve, Îran, Tirkîye, Libnan, Îsraîl û dewletên Kendava Farisî û bi têkelîyên navneteweyî ve girêdayî ne.

Derbasbûna şorişa Sûrîyeyê, qonaxa şerê çekdarî, piştî nêzîkî şeş heyvan ji destpêkê û wekî encam ji taybetmendîya civatê û nakokîyên navxweyî û herêmî, yên ku ji salan ve axivî û alozdar bûne û tenêhiştin, nexasim di heyvên pêşîn de, şoriş, bi gelek alîyên xwe re, ket zembîla tundrew û terorîstan. Ev yek jî bû sedemeka din ku komelgeha navneteweyî û Amerîka û Rojava ji şorişê veciniqîn û tirsîyan.

Her dewlet, her hêz û her kes li gor karîn û pêdivîyên xwe û li gor gerekîyên berjewendîyên xwe gavên xwe diavêjin û helwest û tevgera xwe dirust dikin, lê pir caran berjewendîyên nêzîk û biçûk zîyaneka mezin didin berjewendîyên berfireh û stratejîk. Meriv dikare pir nimûneyan, ji dîroka nêzîk, destnîşan bike ku pelûbûn an nestandina helwestê û xweragirtin bi sedema berjewendîyan gelek berjewendî winda kirine.

Dibe ku rast be ku komelgeh û dezgehên navneteweyî û paytextên biryardar tu berjewendîyên xwe di dostanîya şorişa Sûrîyeyê de nedîtine, an jê bi tirs in, an bihayê dostanîyê li ser xwe pir giran dîtine, lê ya ji hemû rastîyan rastir; hiştina şorişa Sûrîyeyê bê dost û bê alîkarîyeka akamdar dihêle ku gelê Sûrîyeyê li hemberî makîneya kuştin û wêrankirinê bi tenê bimîne, ev yek dê, di paşerojê de, bibe sedemeka bingehîn, ku piranîya sûrîyeyîyan ber bi tunrewîyê ve biçin û bi çavên nedostanîyê, dibe ji wilo bêhtir bi çavên dijminayîyê, li komelgeha navnetewî binêrin. Ji ber vê yekê meriv dikare şirove bike; çima çalakvanên Sûrîyeyê rojeka înê bi goteya ***"Amerîka! Ma tu ji xwîna me têr nebû!"*** (4) bi nav kirin. Ev gote wek nameyeka nepejerandina helwesta amerîkî û navneteweyî ye.

Ji alîyekî din ve, alînekirina gelê Sûrîyeyê dihêle ku Sûrîye bibe mebestgeha nêçîrvanên derfetan û xwedanên ajandayên neyeksan û dibe ku tev ji alîyê gelek sûrîyeyan werine hembêzkirin û ji naçarî sûrîyeyî ji wan re bibin hembêzgeha civatî. Rêxistinên wekî ***"Cebhet El Nusre"*** û ***"Dewleta Îslamî ya Iraq û Şamê"*** (DAIŞ) yên ku bi rêxistina ***"El Qaîde"*** ya terorîst ve girêdayî ne, bi hêsanî dikarîn roleka mezin di çalakîyên leşkerî yên şorişê de bilîze û bandorên xwe yên leşkerî, sîyasî û îdeolojîk li ser şorişê û hin deveran bi berfirehî vegirin. Li vir tê şirovekirin; bê çima gelek çalakvan û sîyasetmedaran danasîna rêxistina ***"Cebhet El Nusre"*** wekî rêxistineka terorîst, nepejirandin. Sûrîyeyî bûn wekî binavbûyên bi darikan digirin da ku jîyana xwe ji dest nedin! Merivê binavbûyî napirse ka çi dest jê re tê dirêjkirin!

Hiştina rêjîma **Beşar El Esed**, ya ku berpirsyarîya bingehîn ji rewşa Sûrîyeyê ya niha hiltîne, ji alîyekî ve, wê bihêle rewş kambaxtir bibe û ji alîyekî din ve, wê Sûrîyeyê bêhtir ber bi "dewleta têkveçûyî" ve bibe.

Her dewlet, her hêz û her kes li gor gerekîyên berjewendîyên xwe gavên xwe diavêjin û helwest û tevgera xwe dirust dikin, lê pir caran berjewendîyên nêzîk û biçûk zîyaneka mezin didin berjewendîyên berfireh û stratejîk. Meriv dikare pir nimûneyan, ji dîroka nêzîk, destnîşan bike; ku pelûbûn an nestandina helwestê û xweragirtin bi sedema berjewendîyan gelek berjewendî winda kirine.

## Pêmayîya dîrokeka lerzîn û komelgeheka jigurdketî

Sûrîye û bêhtirînên dewletên Rojhilatê Navîn, wekî komelgeh û wekî dewlet, nehatine avakirin mîna berhem û encamdan ji proses û pêwistîyên navxweyî re; hemû li gor gerekî, berjewendî û nakokîyên hêzên serdest ên derve hatine damezirandin. (5) Nexşeya dewleta Sûrîyeyê, bi destên hêzên bîyanî, li ser kaxezan, bê nasîneka rasteqîne ji rewt, taybetmendî û hêzên hundirîn re, hatîye danîn û



Özgür Epözdemir: **Fasûlî I**, înstalasyon-fotograf

destnîşankirin! Dibe ku ev yek ne awarteyeka dîrokî be – ji xwe ne weha ye jî-. Dibe ku "komelgeha Sûrîyeyê“ ya neşehkirî ku ji gelek netewe, ol û rêçe-olên cûrecûr û neyeksan avakirî ye, karîba xwe bi hev ve guncîba û biba xwedana nasnameyeka komelayetî ya hevbeş û yekbûyî, heger derfet û rê hatibana vekirin û dewlet û dezgeh û desthilatên dewletê bibana neynikeka dirust ji rastîya komelgehê re, nehatana dagîrkirin bo berjewendîyên beşekî neteweyî yan olî yan îdeolojîk. Pêvajoya hevguncînîya "komelgeha Sûrîyeyê“, ya ku ji dagîrkirina Fransayê ve berdewam kir, zû hate birîn; jîyana sîyasî ya demokrat, piştî serxwebûna Sûrîyeyê -sala 1946ê – di demeka kurt de, hate mirar kirin. Ji nîvê duyem ê salên pêncî yên sedsalîya bûrî ve, dikatorîya leşkerî, di bin sîwana *"armancên neteweyî yên pîroz“* de, dewlet û welat bo *"bicihkirina pêwîstîyên dîrokî“,* terxan kirîye, ev bû bingeha herifandina welat, wekî nasnameya hevbeş û tunekirina dewletê, wekî encam û derbirîn ji *"girêbesta civatî“* re, ya ku gelemperîya komelgehê ye, bi yekqonaxê hemberî hemû hevwelatî û pêkhateyan radiweste û bi yekpîvanê mafên bingehîn ên hemûyan dinase û diparêze. Komelgeha Sûrîyeyê derfet nedît ku karibe nasîna rastîya xwe ya firehpêkhate, bi awayine dezgehî û bi hişyarîyeka civatî û sîyasî vegerîne û karibe xwe ava bike. Bîr, boçûn û ramanên cûrecûr, ên ku xwe di ser taybetîyên komelgehê re diavêjin û naxwazin/nikarin wan bibîn û dixwazin komelgehê li gor xwe û pîvanên xwe saz bikin û bibînin, bûn navenddar li seranserî Sûrîyeyê, ne tenê li cem bijardeyên desthilatdar, lê li cem bêhtirîna bijardeyên rewşenbîr, sîyasetmedar û çalakvanên civatê. Ji ber ku dûrî rastîya komelgehê ne; şêweyên zordarî, dikatorî û kişandina sîyasetê ji komelgehê, bûn gerekîyên desthilatdarîyê, desthilatdarîya ku hin bi hin dewlet daqurtand. Ango merivê xwe dispêre îdeolojîyan û di hundirê wan de ramidandî dimîne, bi guhertinên dorhêlê baş hestyar nabe û nikare ji derveyî dûrbîna xwe ya îdeolojîk wan bibîne.

Rêjîmên dikator ên ku di dergeha artêşê re derbasî desthilatdarîya dewletê bûn, hemû dergeh li pêş vegerandin û azadkirina sîyasetê di civatê de girtin, ango rê nedan ku pirsgirêk û arîşe werin dîyarkirin û giftûgokirin; da ku werin çareserkirin, hiştin ku di tarîya veşarîyê de bimînin û alozdar bibin û komelgeh tim û tim pêwîstî hêzeka zordar û zaldar be da ku komelgehê bi rê ve bibe û nehêle pirsgirêk û arîşe bigihêne radeya teqîna wêranker. Mebest ku milet ji tirsa şerê navxweyî -ku sertayên wî yên babetyane hene- azadî û rûmeta xwe ya merivî bike gorî û qurban. Bi qasî ku karibûn yekîtîyeka komeleyî nehêlin were damezirandin dikarîbûn nebûna yekîtîya komeleyî ji berdewamîya destlatdarîya xwe re bikar bînin. Weha meriv dikare dirûşma ku artêş û hêzên ewlehîya **Beşar El Esed**, ji despêka şorişê hildidan: ***"Yan Beşar El Esed yan ne tu kes!"*** şirove bike.

Kirdeyên rêjîma Sûrîyeyê ji kirdeyên hemû rêjîmên diktator ne awarte ne; arîşe, pirsgirêk û alozîyên civatî û sîyasî bi hêzdarî û tirsê ve ragirtî ne, ger dîwarên tirsa ku hatîye çandin bikeve yan hêzdarî hinekî ji hev bikeve ew arîşe, pirsgirêk û alozî bi hev re der dibin û ji ber diktatorî tu rêç û awayên kontrolkirinê di civatê de nahêle, zîyaneka pir mezin û kambax li ser hemîşeya civatê tomar dikin.

Bi kurtahî, heger em paşxaneya dîrokî û bingeha komelgeha Sûrîyeyê ya alozdar, tev hin egerên herêmî û cîhanî deynin ber çavan, em dê karibin hinekî binasin; çima şorişê nikarîbû hêzê bide dirûşme û armancên xwe yên despêkê û nikarîbû bi awayên aştîyane xwe berdewam bike û nikarîbû derbirîna xwe ya sîyasî û leşkerî ya yekgirtî damezirîne û nikarîbû rê li pêş tundrew û terorîstan bigire û nikarîbû piştgirîyeka navneteweyî ya kêrdar wergire.

* Nivîskar

(1) Destpêka şorişa Sûrîyeyê ku hîn jî berdewam e.

(2) Weha meriv tê digihêje; çima şorişên Tûnis, Misir, Lîbya, Yemen, Behrên û Sûrîyeyê hevdem bûn


(3) Di destpêka meha 5an a 2011an de, ango piştî meh û nîvê ji destpêkrina şorişê, artêşa **Beşar El Esed** berê xwe da bajarê Hemayê da ku xwepêşandan û çalakîyên aştîyane li bajêr bi dawî bike, Serokwezîrê Tirkîyê di hevpeyvîneka televîzyonî de got: *“Ez naxwazim komelkujîyeka din li Hemayê bibînim.”* Bajarê Hemayê ku li navîna Sûrîyeyê ye, di sala 1982yan de, bi fermana bavê serokê îroyîn, **Hafiz El Esed** komkujîyeka berfireh hate kirin. Di hevpeyvina xwe de, Tayib Erdogan yekem “xêza sor” ji rêjîma **Beşar El Esed** re danî! Ango; derbasbûna Hemayê ji alîyê artêşê û dubarekirina komkujîya Hemayê wekî xêza sor dît.

(4) Çalakvan û şorişgerên Sûrîyeyê çalakî û xwepêşandanên xwe her rojên înan di bin navekî de dimeşandin. Roja îna 19-10-2012an bi goteya "***Amerîka! Ma tu ji xwîna me têr nebû!“*** !“ bi nav kirin

(5) Herêm li gor rêkeftinnameya ***Sykes–Picot***, 1916, di navbera Fransa û Brîtanîyayê de hate dabeşkirin, Sûrîye û Libnan bûn para Fransayê.



ÖZGÜR EPÖZDEMIR: **Lazer IV**, rêzewêneyên bi ronahîyê hatine boyaxkirin



ÖZGÜR EPÖZDEMIR: **Lazer II**, rêzewêneyên bi ronahîyê hatine boyaxkirin

Vegera rîtuelên dijberî hev li ser asta mezinbûna aborî, koçberî yan jî fakta dawî ya guhertî piştrast dike fikra ku dibêje nîzama neoliberal ketîye ser seyra xwe ya adetî. Weha dîyar e ku şoka krîza malî ew bi awayekî mayînde nehejandîye. Ji bilî li bendê mana danader a raperînên spontane ên ku wê rê li ber nerazîbûneka giştî venekin, meriv dikare li kîjan kirinên li pêş û rêbazan bifikire da ku rewşa giştî biguhere?

## Da ku degelî alî biguhere

# Stratejîyek ji bo ji nû ve qezenckirinê

SERGE HALIMI

*"Pêdivîya welêt bi ezmûnên cesûr û xurt heye. Ya li gorî aqlê selîm ew e ku meriv rêbazekê hilbijêre û wê biceribîne. Heke ew bi bin keve, hingê ji dil lê mikur werin û tiştekî din biceribînin. Lê belê ya ji hertiştî girîngtir, tiştekî biceribînin!"*

Franklin Roosevelt,
22yê gulana 1932yan

Di ser îflasa **Lehman Brothers** ango 15ê îlona 2008an re pênc sal derbas bûn. Rewabûna kapîtalîzmê wekî awayê birêxistinkirina civatê derb xwar; sozên wê yên dewlemendîyê, mobîlbûna civatî û demokrasîyê êdî naxapînin. Lê belê guhertina mezin neqewimî. Xistinên ber lêpirsînê yên sîstemê li pey hev hatin bêyî ku wê bihejînin. Heta berdêla van bibinketinan bi betalkirina beşekê ji destketîyên civatî yên ku jê hatibûn standin, hat dayîn. Aborîzanê amerîkî **Paul Krugman** berîya bi sê salan ev tesbît kir, "*ewên ku ji binî ve bazarperest in hema hema di biwara hertiştî de xelet bûn û dîsan jî ew dika sîyasî ji her demê bêhtir misêwa û bi temamî kontrol dikin*" . (1) Di encamê de sîstem dema di ajotina otomatîk de ye jî li ser xwe dimîne. Ev pesnek nîne ji bo dijberên wê. Çi qewimî? Û ka meriv çi bike?

Sîyaseta çepê ya dij-kapîtalîst fikra felaketa kujer a aborî red dike, loma ew weha tê digihêje ku daxwazên sîyasî wê birêxistin dikin. Ew neçar gihişte wê encamê ku krîza malî ya 2007-2008an wê derîyekî mîrane veneke ji bo projeyên wê. Krîza berîya wê ya salên 1930î jixwe ev dianî bîra merivî: di warê rewşên neteweyî, hevgirtinên civatî û stratejîyên sîyasî de heman krîza aborî dikarî bi encam bibe bi desthilatdarîya **Adolf Hitler** li Almanyayê, bi New Deal a li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, Bereya Gel (Front Populaire) li Fransayê û tiştekî mezin jî li Meliktîya Yekbûyî (Îngilistan) neqewime. Piştî demeka dûr û dirêj, peyderpey, **Ronald Reagan** wê bibûya serokê DYAyê û biçûya Qesra Spî, **François Mitterand** wê bibûya serokkomarê Fransayê û biçûya Qesra Elyséeyê; **Nicolas Sarkozy** li Fransayê têk biçe, **Barack Obama** li Dewletên Yekbûyî ji nû ve were hilbijartin. Em herweha bibêjin ku jêhatîbûn, stratejîya sîyasî jî, ne guherbarên talî arizî ne ku wê şûna sosyolojîya welatekî yan jî rewşa aborîya wê bigirin.

Serketina dawî ya neolîberalan gelekî xwe disipêre alîkarîya aktorên welatên bi pêş dikevin. Lewre "guherîna tewazûna dinyayê" herweha kete nava dansa kapîtalîst a qutbûnên mezin ên hilberîner û serfkerên *çînî, hindistanî, brezîlî* jî. Ew bi kêr tên wekî artêşeka yedek a wê sîstemê ku halê hazir wekî bavkujê wê xuya dike. Bi tenê di nava van deh salên dawî de para hilberîna li tevahîya dinyayê ya welatên mezin ên bi pêş dikevin ji % 38an gihişte % 50yî. Atolyeya nû ya dinyayê di heman demê de veguherî yek ji bazarên sereke: sala 2009an Almanyayê ji Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê bêhtir mal îxracî Çînê kir.

Hebûna "bûrjûwazîyên neteweyî" – û pêkanîna çareserîyên neteweyî – tên hemberî hev, di heman demê de çînên birêveber ên tevahîya dinyayê êdî bendeka bi hev ve girêdayî ne. Qet nebe di warê mentalîteyî de hedinî û aş in, di dij-împeryalîzma salên 1960î de, meriv êdî çawa hîna hêvî bike ku wekî mînak çareserîyeka pêşketinparêz a pirsên heyî dikare bi destê elîtên sîyasî yên çînî, rûs, hindistanî, yên ku bi qasî hevpîşeyên xwe yên rojavayî tucar in û hem jî dikarin werin kirîn?

Lê belê ev vegera herikê ne gerdûnî bû. Civatzan **Immanuel Wallerstein** berîya bi sê salan eşkere kir ku "*Amerîkaya Latîn succes storya sîyaseta çepê ya global bû di yekem dehsala sedsala 21ê de. Ev yek bi du rengan rast e. Ya pêşî ew e ku partîyên çepgir yan jî çepgir-navendê bi awayekî merivî heyranî xwe bihêlin di hilbijartinan de li ser hev bi ser ketin. Piştre jî, ji ber ku hikûmetên latîno-amerîkî ev cara pêşî bû ku bi awayekî kolektîf xwe dûr kirin ji Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê. Amerîkaya Latîn veguherî hêzeka jeopolîtîk a nisbî xweser.*" (2)

Dîsan jî întegrasyona herêmî ya ku ji bo yên herî wêrek ji berê de wekî "sosyalîzma sedsala 21ê" pêk tîne, werçerxan dîyar dike, ji bo yên din yekê ji bazarên herî mezin ên dinyayê pêk tîne. (3)Lîstik bi xwe dîsan jî bi awayekî eşkeretir li kevne hewşa Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ye û ne li nava plazmaya derve ya ewropî ye. Û heke Amerîkaya latîn di nava demeka kêmtir ji dehsalan de şahidî kir li pênc hewldanên darbeyên eskerî (***Venezuela, Bolîvya, Honduras, Ekwator û Paraguay***), dibe ku sedem ev be: guhertinên sîyasî ên ku ji alîyê hêzên çepgir ve hatin dîyarkirin li wir bi rastî jî zext li nîzama civatî kirin, şert û mercên hebûna xelkê welatan guherandin. Bi vî awayî nîşan didin ku alternatîfek heye û her tişt ne-mimkin nîne, lê belê ji bo afirandina şert û mercên serketinê divê xwe bidin ber reformên avahîya sîstemê, yên aborî û sîyasî. Ev reform wan tebeqeyên civatî ji nû ve seferber dikin yên ku nebûna hêvî û perspektîfan ew di nava xemsarîyê, mîstîsîzm yan jî lêgerîna çara serê xwe de asê kiribûn. Dibe ku bi heman awayî em şerê sîyaseta rastê ya radîkal dikin.

Veguherînên strukturel, erê, lê kîjan? Nolîberalan ew fikra ku "alternatîf nîne" ewqasî baş bi cih kirin ku wan dijberên xwe qanî kirin heta bi wê radeyê ku wan carinan pêşnîyazên xwe ji bîr kirin... Em hinan ji wan bi bîr bixin, lê bila li bîra me be ku ew çiqasî îro bihewas xuya bikin ewqasî jî bêyî ku dereng bimînin wan bi cih dikin. Û qet divê neyê jibîrkirin ku xavbûna wan a mihtemel divê were bar kirin li şideta nîzama civatî ên ku ew dixwazin ji hev vekin.

Ev nîzam; meriv çawa wê bihewîne, piştre wê bike der? Firehbûna beşa sektora ne-tîcarî, ya belaş jî, wê bi yek derbê bersivê bidin vê cot-armancê. Aborîzan **André Orléan** bi bîr dixe ku di sedsala 16an de "*erdê milk ne malekî pevguherînê bû, malekî kolektîf bû û nedibû meriv li ser bazarê bike, ev jî rave dike xurtbûna berxwedana li dijî qanûna di biwara bisînorkirina mêrgên mişterek de*". Ew weha didomîne: "*Heman tişt îro dikare jî bo kirina mal a tiştê zindî biqewime. Milek yan jî xwîn bi me wekî mal xwîya nake, lê belê gelo sibe jî ev ê weha bimîne?*" (4)

Ji bo rabûna li ber vê êrişê, dibe ku guncaw be meriv bi awayekî demokratîk hin pêdivîyên bingehîn (xanî, xwarin, çand, ragihandin, çûnûhatin û barbirin) dîyar bike, bike ku ew kolektîf werin fînansekirin û wan ji bo pêkanîna pêdivîyên herkesê pêşkêş bike. Heta, wekî ku sosyolog **Alain Accardo** pêşnîyaz dike: "*Vemirandina bi lez û misêwa ya xizmeta gelemperî heta ku 'belaşbûna' tevahîya xizmetên bingehîn were misogerkirin li gorî beridîna wan a dîrokî, ya ku bi awayekî aborî nayê fêmkirin heta ku vegerandina li kolektîvîteyê ya tevahîya çavkanî û dewlemendîyên bi kêra karê civatî tên û tevahîya berhemên bi keda herkesî hilberandî pêk were.*"(5) Bi vî rengî, li şûna ku hêza daxwazê were xurtkirin bi pir zêdekirina mûçeyan hêza kirîyarîyê wê were xurtkirin, lewre ev dê bibe civatîkirina erzê û misogerkirina pêkanîna pêdivîyên nû ji bo herkesî.

Lê belê meriv çawa tîranîyeka bazaran veguherîne mitlaqîyeteka dewletê? Civatzan **Bernard Friot** ji me re dibêje, em ji giştîkirina modela dagirkirinên gel bikin yên ku li ber çavên me serketî dixebitin, wekî mînak ewlekarîya civatî, ên ku hikûmet li dijî tevahîya serîtewandinê bi serhişkî xwe pêve dikin. Ev "*azadkerê ji xwe heyî*" ye yê ku bi xêra prensîpa bêşstendinê, beşeka girîng a dewlemendîyê civatî dike, mûçeyên teqawidan, tezmînatên nexweşan, alîkarîyên bêkaran fînanse dike. Bi wayekî ku ji baca ku dewlet distîne û xerc dike, bêşstendina ji mûçe ne ji bo berhevkirinê ye û ji destpêka xwe ve para bêhtir ji alîyê mûçegiran bi xwe ve tê birêvebirin. Ji bo çi em bi pêşvetir neçin? (6)

Bernameyeka bi vî rengî ya ku bi dilê xwe êrişkar wê sê avantajan bi hev re bi xwe re bîne. Sîyasî: tevî ku dibe ku koalîsyoneka civatî ya pir mezin bîne cem hev, lîberal yan jî rastgirên tundrew nikarin wê paş ve bînin. Hawîrdor: ew xwe dûr digire ji vejîneka ***keynésî*** ya ku bi dirêjkirina modela heyî wê vegere ser a ku li gorî wê "*mîqdarek pere wê biherike ser hesabên li bankeyê da ku biherikin ber bi serfkarîya tîcarî a bi destê polîsê reklamker*". (7) Ew herweha li pêş bigire pêdivîyên ku bi hilberîna mêl a li welatên mûçe li wan kêm wê wan pêk neîne, yên ku bi konteyneran ji serîyekî dinyayê ber bi serê din ve tên hilgirtin. Ya din jî avantajeka demokratîk e: terîfkirina tiştên li pêş ên hevpar (ên ku wê belaş bin û yên ku wê belaş nebin) wê ne bi tenê karê hilbijartî, hisedar yan jî çînîyên întelektuel ên ji heman derdorên civatî be.

Nêzîkatîyeka bi vî rengî karekî lezgîn e. Halê hazir ê têkîlîyên hêzên civatî yê dinyayê, robotkirina bi lezkirî ya karê pîşesazîyê (lê belê ya xizmetan jî) bi xwe re wê tehlûkeyê tîne ku hem ji bo sermayeyê ranteka nû pêk tîne (kêmkirina "mesrefa karî" diçe) û bêkarîya girseyî ya her diçe kêmtir tê tezmînkirin. Amazon yan jî motorên lêgerînê nîşan didin ku herroj bi sedan milyon mişterî şandina malên dikirin, betlaneyên xwe, xwendinên xwe, muzîka lê dihisînin emanetî robotan dikin. Pirtûkfiroş, rojname, buroyên betlane û rêwîtîyê berdêla vê ji niha ve didin. Birêveberê giştî yê McKinseyê, **Dominic Barton** eşkere dike ku "*deh şirketên herî mezin ên înternetê yên wekî Google, Facebook yan jî Amazonê bi zorê du sed hezar cihên kar û îstîxdamê peyda kirin.*" Lê belê "*bi sedan milyar dolarên sermayekirina bûrsan*" bi destxistin. (8)

Ji bo peydakirina çareyekê ji bêkarîyê re, çîna birêveber bi xwe di encamê de di wê tehlûkeyê de ye ku li senaryoya tirsnak vegere, wê senaryoya fîlozof **André Gorz** a êrişa misêwa a bi ser qad û biwarên hîna jî ji alîyê belaşbûn û weqfkirinê tê dîyarkirin: "*Veguherîna tevahîya çalakîyan li çalakîyên ku pere bi wan tên dayîn, ên ku wekî mûçe yan jî heq berdêla xwe ji ber mentiq û randimana herî zêde armanc e, distînin, wê li ku bisekine? Çiqasî din ew bendên têra xwe nazik wê karibin li ber xwe bidin, ew ên ku hîna jî profesyonelbûna dê û bavtîyê, çêkirina ji bo bazirganîyê ya embryonê, firotina zarokan û bazirganîya endamên bedena merivî asteng dikin?*" (9)

Pirsa deynan jî bi qasî ya belaşbûnê qîmet bi dest dixe, çi qasî em paşxana wê ya sîyasî û civatî eşkere bikin. Tiştekî ji vê adetîtir nîne di dîrokê de ku welatekî deyndêrên wî biqirika wî girtî û bi vî yan jî wî awayî xwe ji nav lepên wan xelas dike ji bo ku jixwekêmkirineka heta hetayê li ser miletê xwe ferz neke. Komara Sovyetî ev kir dema ku wê red kir deynên rûs ên ***çar*** stendî bide. **Raymond Poincaré** jî ev kir, wî Fransa rizgar kir ... bi devaluwasyoneka % 80yî, bi vê ewqasî barê malî yê Fransayê sivik kir deyn bi pereyê jiqîmetketî hat dayîn. Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û Meliktîya Yekbûyî (Îngilîstan) jî ev kirin piştî Şerê Cîhanê yê Duye} m, wan bêyî planeka hişk, hevsarê înflasyonê berdan, pê jî kirin ku barê wan ê deynê dewletê nîve-nîv kêm bibe. (10)

Ji hingê ve serwerîya pereyî ferz dike, petixîn û îflas vediguhere tiştekî pîroz, enflasyon bi çarpîne diçe (wan demên ku rêjeya wê pir nêzîkî sifirê ye jî di nav de), devaluwasyon jî qedexe ye. Tevî ku deyndêr ji rîska ku deynê wan li wan venegere azad bûbin jî, ew hîna jî doza "prîmeka kredîyê" dikin. Dîsan jî aborîzan **Frédéric Lordon** eşkere dike ku "*di rewşên ji hedê xwe zêde deynkirinên dîrokî de bi tenê du tercîh hene ku dikevin ber sererastkirina strukturel, yek jê ketina xizmeta deyndêran e, ya din jî bi rengekî xirakirina mala wan e.*" (11) Maneya betalkirina beşeka deynî ew e ku neteweya wan çi dibe bila be, piştî ku merivî her tişt ber bi wan ve berda, meriv deyndêr û rantxuran zivêr bike.

Qeyda şidyayî ya li ser kolektîvîteyê ferzkirî wê ewqasî bi leztir sist bibe dema ku ev hatinîyên bacî yên sî salên neolîberalîzmê heba kirî jî bigire nav xwe. Ne bi tenê wê demê ku me xisleta pêşdeber a bacê xiste ber lêpirsînê û li belavbûna sextekarîyê banîyan, lê belê dema ku me sîstemeka tentakuler a ku pê nîvê bazirganîya navneteweyî ya mêl û xizmetan bi awayekî transît di behiştên bacî re derbas dibin. Yên ku ji vê sûdê werdigirin ne bi tenê olîgarkên rûs û kevne wezîrê fransî yê budceyê ne: di serî de şirketên pir tên parastin bi destê dewletê (û di çapemenîyê de jî pir bi tesîr) ên wekî **Total, Apple, Google, Citigroup** yan jî **BNP-Parisbas**.

Sûdwergirtina herî baş ji bacê, "bihayên veguhestinê" (ya ku destûrê dide ku cihê karê wan şax û şûbeyan were dîyar kirin ku li wan bac herî kêm e), barkirina lokalên civatî: mîqdarên bi vî rengî bi tevahî qanûnî ji koletîvîteyê tê kêmkirin nêzî 1 000 milyar ewroyî ne bi tenê ji bo Yekîtîya Ewropayê. Ango, li gelek welatan wendahîyeka hatinîyê ye ku mîqdara wê bêhtir e ji tevahîya barê deynê wan ê neteweyî. Gelek aborîzan binxêz dikin ku li Fransayê "*heke bi tenê nîvê mîqdarên behsa wan tê kirin karibin werin bidestxistin, tewazûna budceyî wê pêk were bêyî ku mûçeyên teqawidbûnê, îstîxdama di sektora dewletê de yan jî veberhênanên hawîrdorî yên siberojê werin qurbanîkirin*". (12) Sed carî hat ragihandin, bi sedan caran dema wê hat guhertin (û sed carî bêhtir karhêner e li gorî "sextekarîya ji bo alîkarîya civatî" ya her dewam dike), "bidestanîna" behsa wê tê kirin wê ewqasî bibitir populer û wekhevîparêztir be ku mikelefên bacê yên adetî nikarin hatinîya xwe ya ferza bacê li ser kêm bikin bi şandina mesrefên fiktîf ber bi şûbeyên xwe yên li Giravên Kaymanê ve.

Em dikarin cemidandina îmtîyazên mûçeyên bilind, girtina borsayê, dewletîkirina bankeyan, xistina ber lêpirsînê ya pevguherîna serbest, derketina ji ewroyê, kontrola sermayeyan, ... li vê lîsteya karên li pêş zêde bikin. Ev qas îhtîmal va ye ji niha ve di van stûnên nivîsê de hatin pêşnîyazkirin. Heke wisa ye çima belaşbûn, ji nû ve nirxandina deynê dewletê û ji nû ve bidestanîna bacê li pêş were girtin? Bi rengekî besîd em bersivê bidin, lewre ji bo bipêşxistina stratejîyekê, hizirîna li hîmê xwe yê civatî û şert û mercên pêkanînê yên sîyasî, çêtir e meriv hejmareka piçûk a karên li pêş bineqîne û ne nivîsandina katalogeka armanca wê komkirina girseyeka rengorengo a hêrsrabûyî ye ku wê di bahoza pêşî de

ji hev belav bibe.

Derketina ji ewroyê wê hêja be ku li ser gelek daxwazên lezgîn cihê xwe bigire. (13) Her kes êdî fêm dike ku pereyê yekbûyî û avahîya sazûmanî û hiqûqî ya pişta wê digire (Bankeya Navendî ya serbixwe, peymana îstîqrarê) her sîyaseta ku hem li dijî zêdebûna newekhevîyê ye û hem jî li dijî wê ye ku çîneka serdest a ku serî tewandîye li daxwazên fînansê serwerîyê desteser bike, qedexe dike. Li alîyê din, ji ber ku pêwîst e, xistina ber lêpirsînê ya pereyê yekbûyî û yekane ti destketîyê li ser vê cot-bereyê misoger nake, çawa ku berê xwe dîyarkirinên aborî û civatî yên Meliktîya Yekbûyî û Swîsreyê nîşan didin. Derketina ji ewroyê hinekî wekî proteksîyonîzmê wê xwe bispêre koalîsyoneka sîyasî ya ku yê herî xerab û yê herî qenc tevlîhev dike, ya ku di nava wê de halê hazir hêmana pêşî ji ya duyem xurttir e. Mûçeyê gerdûnî, kêmkirina ji deynî û bidestanîna bacê wê destûrê bidin ku bi awayekî berfireh heta ji berê de were malîştin, lê belê wê kesên hez ji wan nayê kirin jî li derve bihêle.

Bêkêr e ku meriv xwe lê deyne ku ev “bername” li hin parlamentoyên dinyayê xwedî piranî ne, kîjan dibe bile bibe. Ev derbaskirinên sînorî yên ku ev bername pêşdibîne gelek qaîdeyên ku wekî nedarîçav û manewî tên danasîn jî dihewîne. Bi her halî dema ku mesele rizgarkirina sîstema wan a di tehlûkeyê de bû, lîberalan bi xwe, xwe ji wêrekîyê neda paş. Wan xwe neda paş li hember zêdebûneka hesas a deyndarbûnê (yên ku wan bi xwe misoger kiribû ku ev deyndarî wê rêjeya faîzê kêm bike). Li hember ruhpêanîneka xurt a budceyî (ya ku wan xwe lê danîbû ku ew ê zincîrên înflasyonê biqetîne) jî xwe nedan paş. Wan xwe ji zêdekirina bacan, dewletîkirina bankeyên di petaxê de, bêşgirtineka bi darê zorê li ser pereyên li bankeyan razandî, ji nû ve pêkanîna kontrola sermayeyan (li Qibrisê) neda paş. Di encamê de “*dema ku genim di bin zîpikê de bin, ew ê ku li tama xweş digere dîn e* [ji helbesteka **Louis Aragon** e; têbînîya wergêr]”. Û ya ku ji bo wan dibe, ji bo me yên ku pir ji ber mutewazîbûnê êş û azarê dikşînin jî dibe... Dîsan jî ev ne bi xeyala vegera ber bi rabihurîyê ne jî bi hêvîya kêmkirina mezinahîya felaketan e ku em dê ji nû ve bawerîyê bînin, şerê wê sertewandinê bikin, ya li nebûna tu tercîha din ji bilî ya bi dorê ya di navbera sîyaseteka çepê û yeke rastê ya ku hema hema heman bernameyê pêk tînin.

Heçî wêrekî ye, **André Gorz** dema behsa hawîrdorê dikir sala 1974an ev doz dikir “êrişeka sîyasî *ya li her astê hatî destpêkirin,* [ji kapîtalîzmê] *kontrola li ser operasyonan distîne û li dijberê wê projeyeka bi tevahî cihê ya civat û şaristanîyê datîne*”. Loma li gora wî guncaw bû ku meriv xwe jê biparêze ku reformeka li ser bereya hawîrdorî destûrê bide xirabûneka rewşa civatî: “*têkoşîna ekolojîk dikare zehmetîyan biafirîne ji kapîtalîzmê re û li ser wê ferz bike biguhere; lê belê dema ku piştî demeka dirêj li ber xwe da bi xurtî û bi dekûdolaban, ew dê di dawîyê de paş ve gavê biavêje lewre nedera ekolojîk wê gihiştibe wê asta ku ne mimkin e meriv xwe jê xilas bike, ew dê vê zorê çawa ku yên din jî întegre kirin întegre bike.* (...) *Hêza kirîyarîyê ya xelkê wê were şikandin û wê hertişt wisa biqewime, wekî ku buhayê paqijkirinê ji wan çavkanîyan hatine birîn ên ku xelkê divîyabû bi wan mal û pêdivîyên xwe bikirin*.” (14) Ji hingê ve paqijkirina hawîrdorê bi xwe jî veguherî bazarekê, wekî mînak li ***Shenzhenê*** li cihê ku şirketên kêm hawîrdorê qirêj dikin hene, mafê gihiştina kotaya xwe ya li gorî qaîdeyan difiroşin yên din. Di vê navê de hewaya qirêj salê milyonek çînîyî dikuje.

Heke fikrên ji nû ve bicihkirina dinyayê her hebin, meriv çawa bike ku ev fikr nekevin muzeya hêza fikrên pêknehatî. Van demên dawî nîzama civatî rê li ber gelek protestoyan vekir ji raperînên ereb heta bi tevgerên nerazîyên hêrsrabûyî. Ji dema ku girseyên qelebalix li dijî şerê Iraqê rabûn û vir ve deh sal derbas bûn, hingê bi dehan milyon xwepêşanderî rê û kolan dagir kirin ji Spanyayê heta bi Misirê, ji Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, Tirkîyê heta bi Brezîlyayê. Wan bal kişand ser xwe lê tiştekî mezin bi dest nexist. Bibinketina wan a stratejîk tirsa ji dewama meşê xurt dike.

Ya ku xisleta koalîyona mezin a protestovan e ew e ku hejmara xwe zêde bike û xwe dûr bigire ji pirsên ku parçe dikin. Herkes texmîn dike kîjan mijar wê bi parçekirinê bibe sedem ku hevgirtinek kêm bibe ku carinan bingeha wê bi tenê armancên giştî lê belê zelûl in: dabeşkirineka baştir a hatinîyan, demokrasîyeka kêmtir seqet, reda cudakarîyan û otorîtarîzmê. Bi qasî ku bingeha civatî ya sîyasetên neolîberal teng dibe, tebeqeyên navîn bi xwe bihayê bêîstîqrarîyê, pevguherîna serbest, bihabûna lêkolînan û xwendinê didin, ewqasî jî hêsan dibe koalîsyoneka piranîyê pêk tîne meriv bîne cem hev.

Meriv koalîsyoneka bi vî rengî ji bo çi bicivîne? Daxwazên pir giştî yan jî pêkhatina wê ya sîyasî û demdirêjbûna wê bi xwe pir zêde zehmet dikin. Kevne-serokê Navenda Yekane ya Karkeran (NYK) sendîkaya sereke ya brezîlî **Arthur Enrique** berîya bi demeka kurt ji me re rave kir: “*Di civîneka tevahîya berpirsîyarên tevgerên civatî de min metnên cihê dane hev. Ajandaya navendên sendîkayî ji 230 xalan pêk dihatin; ya gundîyan ji 77an û hwd. min hemû li ser hev zêde kirin; vê yekê kir ku 900 xalên lipêşgirtî li ber me çêbin. Û min pirsî: Em bi van hemûyan bi awayekî darîçav çi bikin?”* Li Misirê bersiv hat dayîn ... ji alîyê eskerîyê ve. Piranîyeka milet ji ber sedemên pir maqûl li dijî serokdewlet **Muhemed Mursî** rabû, lê belê ji ber ku ji bilî ji desthilatdarîyê xistina wî tu armancên wê yên din nebûn, vê piranîyê desthilatdarî bi dest artêşê ve berda. Tehlûkeya wê jî ew e ku îro bibe rehîn û sibe bibe mexdûr. Loma maneya nebûna nexşerêyekê ew e ku meriv girêdayî wan kesan be ku nexşeyeka wan a rê heye.

Spontanebûn û lihevanîn dikarin bi kêra kêlîyeka şorişgerî werin. Ew şorişekê misoger nakin. Tevnên civatî birêxistinkirina ufqî ya xwepêşandanan teşwîq kir; nebûna rêxistina fermî destûr da ku –ji bo demekê – ji kontrola polîs xilas bibin. Lê belê desthilatdarî hîna jî bi strukturên mîna pîramîdê, bi pere, milîtan, mekîneyên hilbijartinan û stratejîyekê tê bidestxistin: kîjan bloka civatî û kîjan hevgirtin ji bo kîjan projeyê? ***Metafora Accardo*** li vir tê: “*hebûna hemû parçeyên saetekê li ser maseyekê destûrê nade kesekî ku planeka wî nebe, bike ku ew saet bixebite. Planeka bihevvekirinê, ev stratejîyek e. Di sîyasetê de meriv dikare li peyhevhatina qîran teşwîq bike yan jî meriv dikare li bihevvekirina parçeyan bifikire*.” (15)

Dîyarkirina çend tiştên li pêş ên mezin, li dora wan ji nû ve avakirina têkoşînê, dawîanîna li tevahîya tevlîhevkirinan da ku hostetîya xwe çêtir piştrast bike, ev bi rola saetçêker rabûn e. Loma “*şorişeka Wikipedia ya ku herkes naverokê lê zêde dike*” (16) wê saetê tamîr neke. Van salên dawîyê, çalakîyên cihî, parçe parçe, bi heraret tevgerên protestoyî yên dilketîyê xwe bi xwe, galaksîyeka bêsebrîyan û bêhêzîyan, lipeyhevhatineka çavtirsînîyan derxistin holê. (17) Dema ku meriv li ber çavan bigire ku tebeqeyên navîn para bêhtir pişta van tevgeran pêk tînin, bêîstîqrarîyeka bi vî rengî metelmayî nahêle: ev tebeqe bi çînên xizan ên gel re bi tenê di çarçoeveyeka tehlûkeya pir mezin de – û bi şertê ku bi lez û bez hevsarê operasyonan bigire dest – hevgirtinê pêk tînin. (18)

Bi her halî, herweha û her diçe bêhtir pirsa têkîlîya bi desthilatdarîyê re jî derdikeve pêş. Ji dema ku hîna tu kes lê nedifikirî ku partîyên sereke û sazîyên heyî pir kêm tiştan diguherin di biwara nîzama neolîberal de, ew meyl zêde dibe ya ku guhertina mentalîteyan li gorî strukturan û qanûnan li pêş digire, ji erdê neteweyî paşve dikişe, li asta cihî û civatî bi hêvîya ku hin labaratuwarên serketinên siberojê ava bike veberhênan dike. **Wallerstein** bi kurtî dibêje, “*Komek li ser tevger û pir cihêrengbûnên bê rêxistin şert digire, yeke din îdîa dike, heke hêza te ya sîyasî nîne, tu nikarî tiştekî biguherî. Tevahîya hikûmetên Amerîkaya latîn vê nîqaşê dikin*.” (19)

Di vê navê de em zehmetîyan di beşa yekem de dibînin. Li alîyekî çîneka birêveber a hevgirtî, haya wê ji berjewendîyên wê heye, seferberbûyî, hoste ye li cihê cih û hêza dewletê bi rê ve dibe; li alîyê din komele, sendîka, partîyên bêhejmar yên ku meyldar in xurtîya hêza xwe, yekbûna xwe, xweserîya xwe biparêzin, ew xweserîya ku ew kakûnîyan dikin ku desthilatdarîya sîyasî dikare ji dest wan bigire. Bêguman, bi vî rengî ew carinan xwe bi xapandina Înternetê serxweş dikin a ku dike ku ew xeyal bikin hesabê wan tê kirin lewre ew xwedî malperekê ne. Ya ku ew navê “rêxistina li ser tevna înternetê” lê dikin vediguhere maskeya teorîk a nebûna rêxistinê, nebûna hizirîna stratejîk; tevna ku tu rastîya wê ya din nîne ji bilî belavkirina danezan û agahdarkirinên elektronîk ên ku herkes ji kesên din re dişîne, lê tu kes naxwîne.

Têkilîya di navbera tevgerên civatî û navbeynkarîya sazûmankirî, hêzên dij-desthilatdarî û partîyên sîyasî de timî pirsgirêk bû. Ji wê demê ve ku armanceka sereke, “xeteka giştî” – û ji herdemê kêmtir partîyek yan jî karteleka wê bi gewde bike – nîne, divê “*meriv ji xwe bipirse ka ji ya ferdî çawa ya gerdûnî biafirîne*”. (20) Terîfkirina çend xalên li pêş tên girtin ên ku desthilatdarîya sermayeyê yekser bixin ber lêpirsînê, wê destûrê bidin ku mentiqê şikbar û rexnebar xurt bibe, meriv êrişê bibin ser sîstema navendî, hêzên sîyasî yên ku meyldarê heman tiştê ne tesbît bibin.

Ew dê bi her halî bike ku ji wan were xwestin ku hilbijêr karibin bi referandûmê erka hilbijartîyên xwe betal bikin berîya ku dema erka wan bi dawî bibe; ji sala 1999an ve destûra bingehîn a ***venezuelayî*** xwedîyê hêmaneka bi vî rengî ye. Gelek serekên hikûmetan biryarên mezin dan (temênê teqawidbûnê, angajmanên eskerî, peymanên destûrî) bêyî ku berîya wê vê erkê ji miletê xwe bistînin. Milet jî wê bi vî rengî bibe xwedîyê wî mafî ku tola xwe bi rêyeka din hilîne û ne bi anîna ser hikm a cêwîyê wî kesê ku hîna nû xîyanet bi bawerîya wî re kiribû.

Gelo piştre wê bes be ku meriv li hêvîya hatina dema wê bimîne? Serokdewletê tûnisê **Monsef Marzûkî** bi bîr tîne ku “*destpêka sala 2011an em hîna ji şeş kesan bêhtir nebûn ên ku endamên Kongreya ji bo Komarê* [CPR] *bûn, lê belê vê yekê pêşî lê negirt ku CPR di hilbijartinên yekem ên demokratîk ên li Tûnisê çend mehan piştre pêkhatî de bibe hêza duyem*...” (21) Di çarçoveya heyî de tehlûkeya libendêmaneka pir zêde pasîf, pir zêde helbestî wê dîsan jî bibe yên din – yên kêmtir bisebr, kêmtir dudilî, bêhtir tirsnak – li kêlîyê xwedî derkevin da ku sûdê wergirin ji hêrseka bêhêvîmayî ya ku li armancan digere, ew armancên ku ne illeh yên herî baş in. Û çawa ku karê jihevdexistina civatî qet ranaweste heke meriv neke raweste, ji deverên palpiştena xurt yan jî ji hêlînên berxwedana cihên ku ji nû ve bidestxistinek (xebatên ne-tîcarî, xizmetên gelemperîyê, mafên demokratîk) wê ji wan dest pê bike bi wê tehlûkeyê re rû bi rû ne ku nemînin. Ev yek jî wê serketinekê paşê hîna zehmettir bike.

Hîna ev lîstik ji dest nehatîye dayîn. Utopyaya lîberal beşa xwe ya xewnê, ya mitleq û ya bêqisûr şewitand, ya ku bêyî wê projeyên civatê ji taqet dikevin û piştre mirar dibin. Ew bi tenê îmtîyazan, hebûnên sar û mirinan hildiberîne. Ango, veguherînek wê biqewime. Herkes dikare bike ku ew zûtir biqewime.

## Otobusa nerazîyan

*Di pirtûka xwe ya hevpeyvînê ya bi Jean-Paul Sartre re, nivîskarê amerîkî John Gerassi bi awayekî lê hizirî fîlozofîya kesê li hemberê bi “rexneya mantiqê dîyalektîk” bi kurtî terîf dike. (1960)*

Di vê pirtûkê de te rave kir ku şoriş ne ji komeka yekbûyî, bi kombînasyona yek xewnê û yek armancê peyda bûne. Dorek heye li benda otobusê, dirêj e, kesên ku dipên, piştî rojeka qirêj a karê buroyê yê ku merivî sil dike û bi tevahî ji hîsan dike. Otobusek derbas dibe, bi serî ve tijî ye, cih têde nemaye, ji ber wê derîyên xwe venake. Piştre otobuseka din tê, ew jî mişt e, ew jî kesên li hêvîya xwe nabîne, rewşeka nexweş û tahl. Piştre tiştekî ecêb diqewime, otobuseka vala ya ku li ser tabeleya wê “naxebite” dinivîse tê û ew neçar e ku li dehma destpêka dora siwarbûna li otobusê bisekine, loma trafîk wê neçar dike. Herkes awirên bi şehwet ji otobusê vedide. Bi carekê kesekî di dorê de destê xwe diavêje derîyê otobusê û zorê lê dike ku bikeve hundirê wê. Şofêr diqîre û dibêje ku karê wî bi dawî bûye. Yê êrişkar jê dipirse “*Tu diçî kuderê?*” Şofêr lê vedigerîne “*Ez diçim garajê.*” Serhildêrê ku dizane mala wî li ser rêya garajê ye dibêje: “*Ê baş e, tu wê bi tenê min li ser rêya xwe, li cihê min peya bikî.*” Piştre herkesê din ê di dorê de xwe didehefînine nava otobusê. Komek pêk tê. Tu li ku dimînî? Temam, li ser ***Kolana Çil û Heftem*** bisekinin. Û tu? Temam, li ser ***Kolana Şêstem*** bisekine. Û tu? Li ser ***Kolana Nod û Şeşem***, lê belê çend kolan ji vir û wêdê li rojhilattir, divê ez bigihêjim otobuseka din a ku ez ê lê siwar bibim, ez nikarim bi lingên xwe yên kal bimeşim. Ehm, şofêr can, bi xêra xwe rêya xwe hinekî dûr bike, çar rêyan ber bi rojhilat ve. Lê, ez dê serê xwe bixim belayê. Na, na em belgeyekê ji te re amade bikin. Û kesekî li ser parçeyek kaxetê dest bi nivîsê kir û nivîsî ku ew hemû berpirsîyar in ji desteserkirina otobusê û wan bi hev re ferman daye şofêr da ku ji bo merivên kal û pîr, xizan û hewce rêya xwe hinekî dirêj bike. Hemû mohr dikin. Û dest pê dikin bi hev re dipeyivin. Tu li ku kar dikî? Zarokên te hene? Û dema otobusê ev rêwîyên neqanûnî hemû li cihên wan peya kirin, sêwirandineka bi tevahî nû ya dinyayê peyda bû. Şorişek? Erê lê belê pir piçûk. Spontane. Û pir zêde exlaqî. Her rêwîyî dît ku jîyana wî guherî. Şofêr jî. Di dawîyê de ew jî dikenîya, distira û ji herkesî re daxwaza dilê xwe ya xweşîyê digot. *(...)*

**Sartre**, heke em li bendê bin ku otobuseka vala derbas bibe û komek xerîb wê bike malê xwe, divê meriv gelekî zêde bipê. Lewre dewama çîrokê çi bû? Roja piştre, rêwîyên vê otobusê hemû li karên xwe vegerîyan, bi tenê ew bîranîna şahane bi wan re mabû, ew bîranîna ku rojekê ew hemû bi hev re bûn, “*komeka bi hev ve kelîyayî*” bûn, çawa ku te jî got, bîranîna ku rojekê bi hev re otobus ajotibûn.

John Gerassi, *Bi Sartre re hevpeyvîn,* Grasset, Parîs, 2011.

(1) **Paul Krugman**, “When zombies win / *Dema ku zombie bi ser dikevin*”, *The New York Times,* 19ê kanûna pçşîn a 2010an.

(2) **Immanuel Wallerstein**, “Latin America’s leftist divide / *Parçebûna çepgir a Amerîkaya Latîn*”, *International Herald Tribune,* Neuilly-sur-Seine, 18ê tebaxa 2010an.

(3) **Renaud Lambert,** “Le Brésil s’empare du rêve de Bolivar / *Brezîlya xwe li xewna Bolîvar dike xwedî*”, *Le Monde diplomatique,* hezîrana 2013an.

(4) *Le Nouvel Observateur,* Parîs, 5ê hezîrana 2012an.

(5) **Alain Accardo**, “Les eaux tièdes du réformisme / *Ava şîrgerm a reformîstan*”, *Le Sarkophage,* Lyon, îlona 2010an.

(6) Gotara li jêr bixwîne: “La cotisation, levier d’émancipation / *Ji mûçe par birîn, hildêrê azadîyê*” bi heman rengî tevahîya dosyaya me ya li ser hatinîya misoger, *Le Monde diplomatique,* bi dorê sibata 2012an û gulana 2013an.

(7) *Bide ber* “Pourquoi le Plan B n’augmentera pas les salaires / *Çima Plana B wê mûçeyan zêde neke”, Le Plan B,* hejmar 21, Parîs, kanûna paşîn a 2010an.

(8) *Les Echos,* Parîs, 13ê gulana 2013an.

(9) **André Gorz**, “Pourquoi la société salariale a besoin de nouveaux valets / *Çima ji şirketa mûçeyî re xizmetkarên nû divên*”, *Le Monde diplomatique,* hezîrana 1990î.

(10) Hilberîna Nesafî ya Neteweyî ji % 116an sala 1945an dakete % 66ê sala 1955an di rewşa pêşî de, di ya duyem de % 216an dakete %138an. Gotara li jêr bixwîne: “Ne rougissez pas de vouloir la lune: il nous la faut / *Şernekin, heyvê bixwazin: ew ji me re divê* ”, *Le Monde diplomatique,* hezîrana 2011an.

(11) “En sortir/*jê derketin*”, di beşa La pompe à phynance, 26ê îlona 2012an, blog.mondediplo.net

(12) “ ‘Eradiquer les paradis fiscaux’ rendrait la rigueur inutile / *Behiştên bacî ji holê rakin, bikin ku jixwekêmkirin bêkêr bibe*”, *Libération,* Parîs, 30ê nîsana 2013an.

(13) Gotara li jêr bixwîne: **Frédéric Lordon**, “Sortir de l’euro? / *Derketina ji ewroyê*”, *Le Monde diplomatique,* tebaxa 2013an.

(14) **André Gorz**, *Le Sauvage / Yê hov,* nîsana 1974an. Careka din hat weşandin bi navê “Leur écologie et la nôtre / *Ekolojîya wan û ya me*”, *Le Monde diplomatique,* nîsana 2010an.

(15) **Alain Accardo**, “L’organisation et le nombre / *Rêxistin û hejmar*”, *La Traverse,* hejmar 1, Grenoble, havîna 2010an, www.les-renseignements-genereux.org

(16) Peyva **Wael Ghonim**, mixalifê ***cyber*** ê misrî û berpirsîyarê bazarê yê Googleê.

(17) *Bide ber* **Thomas Frank**, “Occuper Wall Street, un mouvement tombé amoureux de lui-même/ *Dagirkirina Wall Streetê, tevgereka ku dil ketîye xwe bi xwe*”, *Le Monde diplomatique,* kanûna paşîn a 2013an.

(18) **Dominique Pinsolle**, “Entre soumission et rébellione / *Di navbera sertewandin û serhildanê de*”, *Le Monde diplomatique,* gulana 2012an.

(19) *L’Humanité,* Saint-Denis, 31ê tîrmeha 2013an.

(20) **Franck Poupeau**, *Les mésaventures de la critique / Belayên rexneyê* , Raisons d’agir, Parîs, 2012.

(21) **Moncef Marzouki**, *L’Invention d’une démocratie. Les leçons de l’expérience tunisienne / Lihevanîna demokrasîyekê. Dersên ji tecrûbeya tûnisî,* La Découverte, Parîs, 2013, rûpel 30.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

# Krîza aborî ya Qibrisê, gelo şansek e ji bo aştîyê?

DAVID COURBET *

**Komara Qibrisê ku kete ber derba krîza malî ya dinyayê, di bin barê tedbîrên jixwekêmkirinên dijwar ên ku deyndêrên ewropî li ser wê ferz dikin de dinale. Lê belê li alîyekî din perîyoda niha heyî bi her halî dikare lihevanîna felekê be: derfeta çareserkirina pirsgirêka di navbera Bakur û Başûrê giravê de, welatê dawî yê Yekîtîya Ewropayê yê parçebûyî.**

Wekî her duşemê ji hema hema sê mehan û vir ve, vê sibehê jî **Georgîyo Kîrîyades** berê xwe dide navenda ***Xaça Sor*** ya li banlîyoya Lefkoşeyê da ku kîsê xwe yê alîkarîya pêdivîyên sereke bistîne. Li holê panzdeh kes li benda dora xwe ne. Piştî ku saetekê li benda dora xwe ma, ev zilamê di çil salîya xwe de milê wî dagirtî bi du kîsikên plastîk ên ku dagirtî ne ji pêdivîyên sereke, derdikeve, wan kîsikên plastîk di bagaja Mercedesa (sinifa E) xwe ya mezin de bi cih dike. Wekî gelek qibrisîyên din ev bavê malê nîvê adarê bêkar ma, wê kêlîya ku krîza bankeyan derba xwe li welêt xist. Karbidestê wî şirketeka barbirinê ya ku îflas kiribû û neçar mabû heft mûçegirên xwe ji kar derxe.

Li giravê rêjeya bêkarîyê ji hingê ve li derdora % 15an e. Heta niha qibrisî ji krîzê parastî mabûn: hatinîya navînî ya serê ferd a salane sala 2008an gihiştibû 16 765 ewroyan, tevî ku navînîya ewropî 14 667 ewro bû. Lê belê malbatên ku komeleyên alîkarîyê yan jî dêra ortodoks dikevin bin çengên wan ji çend mehan û vir ve pir zêde bûn: herçî Xaça Sor e çar sed malbat li lîsteya wê ya alîkarîyê zêde bûn û bi tenê li Lefkoşeyê şeş sed malbat li lîsteya dêrê zêde bûn, bi giştî her yek du hezar malbat alîkarîyê ji wan distînin.

Helbet berîya “*haircut day*” û piştî wê heye, “roja berxbirê”. Ew 16ê adara 2013an a navdar, “troykayê” – Yekîtîya Ewropî, Fona Pereyan a Navneteweyî (IMF) û Bankeya Navendî ya Ewropayê (ECB) – hingê biryar da ku di berdêla 10 milyar ewroyan deyn de hikûmet ji tevahîya hesabên bankeyan baceka % 6.75 ji bo danhevên heta bi 100 000 ewroyan bistîne û ji bo danhevên ji 100 000 ewroyan bêhtir jî baceka % 9.9 bistîne. Berîya ku paşde gavê bavêje û bixwaze ku yên komeleyên alîkarîyê jî di navê de bi tenê ji hesabên ji 100 000 ewroyan zêdetir bikevin ber bacê. (1)

Hikûmeta Lefkoşeyê divê mesrefên xwe bi awayekî dijwar kêm bike: bi 600 milyon ewroyan zêdekirina hatinîyên ji bacê, cemidandina zêdebûna mûçeyên di sektora dewletê de heta bi sala 2016an, ji pênc memûrên teqawid dibin valahiştina cihê çaran – temenê teqawidbûnê jî hatibû zêdekirin û bûbû 65, pêre jî mûçeyê teqawidbûnê hatibû kêmkirin – firotina rezervên zêr ên zêde ji bo 400 milyon ewroyan û taybetîkirina bi bihayê herî kêm milyarek ewroyî. Hilberîna Hundir a Nesafî (HHN) di navbera 2013 û 2014an divê % 12.6 kêm bibe. Bi tenê di sala 2013an de ev rêje bi carekê de kêm bû, % 8.7, ev talanbûnek e.

Ev rewş berevajîyê rewşa alîyê giravê yê li bakurê “xeta kesk” e, Enqere ji dagirkerîya sala 1974an û vir ve li wir xwedî wesayet e. Komara Tirk a Qibrisa Bakur ku bi tenê ji alîyê Tirkîyeyê vê tê naskirin û li qada navneteweyî di warê sîyasî û aborî de her tecrîdbûyî û di bin ambargoyê de ye. Bakurê ku ji sê paran pareka erdên giravê bi rê ve dibe, tevî serjimareka (qederê du sed û pêncî hezarî) sê caran kêmtir e ji ya li Başûr, ji krîzê hefza xwe kir. Rêjeya mezinbûna aborîyê ya vî beşî sala 2013an gihişte % 3.5ê û sala 2014an wê % 4.2 be. Bêkarîya ku sala 2010an % 12.6 bû sala 2013an dakete % 10.7ê.

Bêguman asta jîyanê ya li wir hîna pir kêmtir e ji ya xelkê Komara Qibrisê, lê belê qelşa di navbera wan de ya ku qederê % 4Oî ye, kêm dibe. Û ne bi tenê ji ber zehmetîyên qibrisîyên rûm bi wan re rû bi rû dimînin. Sala 2002yan HHN (Hilberîna Hundir a Nesafî)ya serê ferd ji 4409 dolaran nedibihurî li komara tirk a ku xwe bi xwe serxwebûna xwe îlan kirîye; îro ew digihîje 15 942 dolaran.

Sîstema malî piştî krîza tirkan a sala 2001ê, bi tesfîyekirina heft bankeyên herêmî, bi awayekî nisbî hatibû başkirin. Û rayedar misoger dikin ku tu fikra tolhildanê bi KKTCyê (Komara Tirk a Qibrisa Bakur) re nîne ji ber rewşa bi serê cîranê li başûr de hatî. Şêwirmendê taybet ê serokkomar, **Hasan Güngör** weha peyivî “*em xemgîn in ji bo qibrisîyên rûm, nexasim jî ji ber ku em berîya bi deh salan di heman krîzê re derbas bûn*”. Ev kevne profesorê aborîyê Başûr teşwîq dike ku “*baş bi ya çarenameyên IMFyê bike, lê belê bêyî ku sîyaseteka populîst lê zêde bike ya ku ji alîkarîya bi yên herî xizan re pêk tê*”.

KKTC (Komara Tirk a Qibrisa Bakur) ya ku haya wê ji girêdana wê ya bi “Welatê Dayik” [Tirkîye] ve heye – alîkarîya malî sala 2012an gihişte 297 milyon ewroyan – weha dîyar e ku qet eceleya wê nîne xwe azad bike. Avakirina xeteka lûleyên binê deryayî ya ku Tirkîyeyê û bakurê giravê bi hev ve girê dide dewam dike. Tê pêşdîtin ku ev xet dê sala 2014an temam bibe û salê 75 milyar metrekub ava şîrîn bigihîne giravê. Li gorî **Güngör**, ev yek wê çandinîyê û bazirganîya aborîyekê teşwîq bike ku “*bi pêş dikeve, lê belê hîna jî nazik e*” li hember ya li Başûr, “*ya ku lawaz dibe û ... pir nazik e*”. Û ev dibe argumaneka xurt di hevdîtinên dualî yên li ser yekbûneka ferazî ya girava ku her û her mexdûra hişkesalîyan e.

Sûdwergirtina ji rezervên binê erda deryayî jî dikare bibe kozek. Li gorî texmînên hîna pir neewle, di navbera 141 û 227 milyar metrokuban de gaza xwezayî wê hebe – texmîna hikûmetê bi xwe heta bi 1 700 milyar metrekuban diçe! Lê belê mecbûrîyetên teknîkî û jeopolîtîk beriqîna vê tabloyê kêm dikin. Li veberhênanên pêwîst ji ber kûrbûna rezervan û nebûna binesazîyê, doza hevkarîyeka bi Tirkîyeyê re jî zêde dibe. Bazara wê mezin dibe û bihurîna ji erdên wê dîyar e îcbarî ye ji bo ku gaza xwezayî ya qibrisî bigihînin projeya Nabucco ya di navbera Asya û Ewropayê de. Wekî din Enqere hîna jî li dijî sîyaseta qibrisî ya lêgerîna gaza xwezayî ye, Tirkîye vê lêgerînê wekî neqanûnî dibîne: wê hîna di dema xebatên destpêkê yên lêkolîn û lêgerîna li gaza xwezayî de keştîyên eskerî şandibûn.

Va ye, hindik ma ku bibin sih sal ku welat bûye du parçe. Rewş dikare biguhere heke Bakur ne bitenê veguhere alîyê hevdîtinan ê bawerî pê tê, lê belê herweha hevkarekî bivênevê. Sîyasetzan û aborîzana li Lefkoşeyê **Anna** (2) dibêje, tevî vê jî qibrisîyên rûm bêhêvîmana xwe venaşêrin li hemberî “*vê Ewropaya ku hembêza xwe li me vekir da ku piştre me wekî kobayên ji bo çarenameyên xwe yên lîberal bi kar bîne*”. Anna dihizire ku piştî reda plana Annan a sala 2004an a ku armanca wê yekkirina welêt bû, qibrisî ji şaşîyên kirî fêr bûne û dizanin ku ji bilî şokeka sîstemîk tu kêlî ji bo xelasbûna ji krîzê ne guncawtir e. Heta niha Komara Qibrisê timî guhê xwe li bangên birêveberên KKTCyê ker kirin. Lê belê gelo ew dikare demeka dirêj xwe li ber argumana malî bigire ?



ÖZGÜR EPÖZDEMIR: **Fasûlî II**, înstalasyon-fotograf

* Rojnamevan.

(1) Gotara li jêr bixwîne: “La leçon de Nicosie / Dersa Lefkoşeyê”, *Le Monde diplomatique,* nîsana 2013an.

(2) Vê pisporê xwest ku anonîm bimîne, ew hem li Bakur û hem jî li Başûr dixebite.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

# Ji mîkrokredîyê ber bi jêreprîma ji bo xizanan

PAUL LAGNEAU-YMONET Û PHILIP MADER *

Pêkanîna Foruma Dinyayê ya "Yekarmancbûnê – ji bo dinyayeka wekhev û dikare were ragirtin" li qesra ***Brongniart,*** li Parîsê ji 17 ta 19ê îlonê, wê derfetê bide ku yek ji amûrên wê yên rênîşandêr ên sazkirî ji bo bersivdayîna nakokîyên kapîtalîzmê were testkirin: mîkrofînans. Bexşkirina deynan û ji bo bikaranînê amadekirina berhemên tesarûfê yan jî sîgorteyê wê destûrê bidin yên herî bêpar bikevin nav xebatê ji bo ku xwe ji xizanîyê xelas bikin. Bi rêjeyên faîzê yên pir zêde (salê % 30 heta bêhtir) (1), ferd yan jî komên ferdan ên bê garantî wê karibin xwe birêxistin bikin ji bo bipêşxistina karekî zeneetkarîyê yan jî bazirganîyê ên ku meriv dikare wê hêvîyê jê bike ku wan ji rewşa xirab xelas bike. Wekî berhevkara paçan **Andra Pradeş** li Hindistanê kete refahê ji ber ku wê karîbû erebokekê bikire. Jinebîyeka ji kevîya bajarê Ûlan Batorê li Moxolistanê di nava demeka ji deh salan kêmtir de, hejmara mangeyên (çêlekên) xwe heft caran li berê zêde kir û firotina şîrê çil û pênc çêlekên (mangeyên) wê bi kêra debara malbata wê tê ... Haya sazîyên mîkrokredîyê ji anektodên bi vî rengî nîne.

Ji ber ku ew bi xêra karên ku êş û azarê kêm dikin destûrê dide erêkirina dinyayê bi rengê wê yê heyî; mîkrofînans xwedîyê hejmareka xwe mezin a alîgiran e, nexasim jî di nav sîyasetvan, patron, merivhez û komeleyên şerê li dijî xizanîyê de. Miteşebisî prensîpa wê ye, bazar hîmê wê, kapîtalîzma "wekhev û dikare were ragirtin" armanca wê ye: ev dua û daxwaza wan e ku bi **Muhammad Yunus** ango damezrênerê bankeya mîkrokredîyê ***Grameen***ê û xelatgirê Nobela Aştîyê yê sala 2006an, bi gewde dibe. (2)

Li Osloyê dema ku wî xelata xwe digirt 10ê kanûna pêşîn a 2006an "bankevanê xizanan" kredî hilgirt heta bi asta "*mafê insanan*" li jor bi cih kir. Wî pêş dîtibû ku mimkin e nifşên siberojê sefîlî û perîşanîyê êdî nas nekin – bi tenê wê li "muzeyên xizanîyê" sefîlîyê nas bikin – û wî xizan şibandibûn darên bonzayî yên ku civatê mezinbûna wan kesixandîye. "*Hema ku xizan karibin enerjî û afirênerîya xwe ji qeyd û bendan xelas bikin xizanî wê pir bi lez ji holê rabe. Em bibin yek da ku em vê derfetê bidin her merivî.*"

Ev pêşdîtin pêk nehat. Bi erkdana Wezareta Geşedana Navneteweyî ya Brîtanyayê, komeka ku aborîzan **Maren Duvendack** ew bi rê ve dibir, 2643 weşanên li ser tesîra aborî û civatî ya mîkrofînansê, nexasim jî ji bo jinan, kontrol kirin: encam digihîjin sifirê. Bihara 2013an lêkolîneka din hem piştrast kir ku xizan pir hez ji van deynên zehmet û biha nakin û hem jî yên ku ev kredî qebûl kirine jî rewşa wan ji yên kredî nestandî baştir nîne. Wekî din perwerde, tendirustî û kapasîteya jinên ku divê debara xwe bikin jî baştir nabe.

Li alîyê din kêmbûneka serfkarîya "*malên cezbê*" (di metnê de wisa tê gotin) – alkol, titûn, restoran –, kêmbûneka mesrefên ezametê yên ji bo cejn û dawetan û ked û hewldaneka ducarî ya karê malbatên deyndar tê tesbîtkirin. (3) Mîkrokredî xizanan ji xizanîyê xelas nake: ew wan bi disîplîn dike. Di rastîya heyî de ew başê xiraban e: pîşeyekî serbest ji ber nebûna karekî birêkûpêk û îstîxdamê û kredî ji bo lihevderxistina hatinîyan têrê nakin. Li gorî damezrênerê rêxistineka nehikûmetî (NGO) ya ku pêşeng e di mîkrofînansê de **John Hatch**, % 90ê deynan li serfkirinê tên xerckirin û ne li veberhênanê. (4)

Li şûna ku xwe biavêjin nav sedempeydakirineka zehmet a ji bo destekdana îdîaya ku dibêje nebûna delîlan îşaret bi nebûna tesîrê nake, ***kausîstan*** [ew kesê li gora serê xwe pirsgirêkên exlaqî şirove dike; têbînîya wergêr] merama xwe ji nû ve îfade kir. Bi vî awayî Bankeya Dinyayê bi rêya şirketa şêwirmend a alîkarîya xizanan (***Consultative Group to Assist the Poor***, GCAP) "*hewandina malî*" teşwîq dike. Ji şerê li dijî xizanîyê bi rêya pîşeyên serbest ên bi kredîyê, ber bi belavbûna berhemên malî ji bo yên herî bêpar ve. Ji hingê ve birêvebirina delîla "mûcîzeyê" kêmtir zehmet dibe.

Ji salên 1970yî ve pêşengên berhemberbûnparêz yan jî dewletî yên mîkrokredîyê nîşan dan ku mimkin e meriv deyn bide xizanan bi rêjeyên faîzê yên kêmtir ji faîzxwurên cihî. Ji hingê ve li her devera dinyayê sektoreka çalakîyên malî yên kapasîteya wan a hevrikîyê heye û kardar in ji bo navbênkarên malî û kesên sermayeyê tînin. Di nava du dehsalên dawîyê de hejmara mişterîyan bîst caran li berê zêde bû – sala 2011an ev hejmar qederê du sed milyonî bû –, deynên dayî li ser hev nêzî 90 milyar ewroyî dibin. Di nava bi hezaran operatorên mîkrofînansê de yên ku hesabên wan meriv dikare bibîne di bingeha daneyan a pispor **MixMarket**ê de, % 43yê wan xwedîyê kardarîyeka sermayeyê ne ku bi xwe bêhtirî % 10an e, û ji çar paran parek jê jî ji sînorê salê % 20an jî dibihure.

Çavkanîyên malî bi piranî yên dewletî ne: bankeya alman a bipêşketinê KfW (***Kreditanstalt für Wiederaufbau***, *Dezgeha kredîyê ji bo ji nû ve avakirinê*) fînansora sereke ye. Lê belê, kesên van fonan bi rê ve dibin dezgehên taybet teşwîq kirin û bi armancên karhêner ev yek kirin da ku sermayeyên taybet cezb bikin ên ku wê subvansîyonan bistînin. Ev arizîkirin bingehên kooperatîf, berhemberbûnparêz û komeleyî yên avahîyên destpêkê lawaz dike û mentiqê veberhênanên hem kardar û hem oportunîst teşwîq dike.

Wekî ***çikûsê*** Molière soza "*evîna bê skandal û kêfa bê tirs*" dida, fonên veberhênanê berhemên malî wekî karekî baş ê bê rîsk û erzan pêşkêşî xizanan dikin. Ya ku pratîkvan **Hugh Sinclair** şopandî ev e: ji bo defkirina tevahîya binketinan "*fon divê zanibin ka dezgehên mîkrofînansê karê xwe baş dikin; yan jî besî wan e ku bi tenê yên herî kardar finanse bikin, awayê wê çi dibe bila be.*" (5) Ji kevîyên bajaran ên bi holikan yan jî erdên gundvanîyê yên Başûr heta bi buroyên çermî yên paytextên fînansê, belavbûna zincîra navbênkarîyê her barê deyndaran e. Ji bo ku deyndêr bi xêra xwe alîkarîya wan bikin, van deyndaran sala 2010an faîz dan yên ku bêhtir in ji yên divîyabû îsal **Yûnanistan** – ne bi rehetî – bide.

Cejna sêmelikan hem ji bo mîkrokredîyê û hem jî *jêreprîm*ê sala 2007an e. Komeleya meksîkî ***Compartamos*** (bi spanî "*em parve bikin*") ya ku bi 1990î bi xêra fonên dewletê hatî damezrandin, bankeyeka bi heman navî damezrand ji bo ku ji miteşebisên "exlaqî" – di navê de fonên teqawidbûnê yên ku garantîya Bankeya Dinyayê wan misoger dike – sermayeyê bistîne bi rêya berhemên malî yên ewlekirî yên ku bankeya ***Citigroup****ê* wergirtî. Di navbera 2000 û 2007an de randiman % 50î bihurî, bi xêra yan jî ji ber bihayekî heyî yê kredîyê yê ku ji bo şeş sed hezar mişterîyan salê % 100î dibihure.

Ketina borsayê ya % 30ê sermayeya bankeyê destûr da hisedaran ku 450 milyon dolarên nirxên-zêdebûyî yê bêdeng bixin kîsê xwe: 150 milyon dolar ji bo kadroyên Compartamos, bankeyên meksîkî û veberhênerên din ên taybet; 300 milyon dolar ji bo komeleya ***Compartamos***, komeleya amerîkî ***Accion*** û şirketa malî ya navneteweyî (koma Bankeya Dinyayê). Heta bi qaşo ezîz û xasên mîkrofînansa bazirganîyê jî ji ber vê veguherînê heyirîn û şok bûn. (6)

Şoka duyem ji ber krîza pircarî dide der e: li Bolîvyayê (2000), li Fasê (2007), li Bosna Hersegê, li Nîkaragua û Pakistanê (2008), li Hindistanê (2005 û 2010). Her carê belavbûna bi her alîyî ve ya çalakîya operatorên çavbirçî dike ku deyndarîya malbatan heta bi wê astê zêde bibe ku nikaribin deynên xwe bidin. Ev krîz bi her alîyê xwe dişibin ya *jêreprîmê* ya sala 2008an: bicihkirina deynên biha li cem ferdên neçar hatine hiştin xwe deyndar bikin ji bo telafîkirina dahatên kêm yan jî neewle bi destê dezgehên fînansmanê yên bêwicdan û bêqanûn. Ev ne şibihîneka hev a ji xwe re lihevhatî ye: ev encama bivênevê ya bawerîyeka aborîyê ye ku ji belavkirina çalakîyên malî yên taybet ên xwedî kapasîteya hevrikîyê û kontrolkirî [hewl dide] çareserîya newekhevîyan [çêke] li şûna ku di wan de sedema newekhevîyan [bibîne].



ÖZGÜR EPÖZDEMIR: **Aheng**

* Herdu jî sosyolog in, yê peşî li Paris-Dauphineê û yê din jî li Enstîtûya Max Planck ji bo lêkolînên civatan (Köln).

(1) **Richard Rosenberg, Scott Gaul, William Ford û Olga Tomilova**, "Microcredit Interest Rates and Their Determinants: 2004–2011 / *Rêjeyên Faîza Mîkrokredîyê û Dîyarkerên wê",* Consultative Group to Assist the Poor (CGAP), Kreditanstalt für Wiederaufbau (KfW) û Microfinance Information Exchange (MIX), *7ê hezîrana 2013an. Ev rêje bi awayekî giştî kêmtir in ji rêjeyên pir zêde yên ku faîzxwurên nefermî distînin.*

(2) **Cédric Gouverneur**, "Microcrédit, le commerce de la misère / *Mîkrokredî, bazirganîya xizanîyê*", *Le Monde diplomatique,* nîsana 2012an.

(3) **Maren Duvendack** (di bin birêveberîya wê de), "Systematic review. What is the evidence of the impact of microfinance on the well-being of poor people? / *Kontrola sîstemîk. Delîla bandora mîkrokredîyê li ser refaha xelkê xizan çi ye?",* Department for International Development, London, 2011; **Abhijit Banerjee, Esther Duflo, Rachel Glennerster û Cynthia Kinnan,** "The miracle of microfinance? Evidence from randomized evaluation / *Mûcîzeya mîkrofînansê? Delîla ji nirxandina tesadufî",* National Bureau of Economic Research, *Working Paper Series,* hejmar 18950, Cambridge (Dewletên Yekbûyî), gulana 2013an.

(4) **Steve Beck û Tim Ogden**, "Beware of bad microcredit / *Hişyar bin [li hemberî] mîkrokrêdîya xirab", Harvard Business Review,* îlona 2009an.

(5) 'All the interests are aligned against the poor' – Interview with **H. Sinclair**, microfinance 'heretic' / *'Tevahîya berjewendîyan li dijî xizanan bûne yek' – hevpeyvîn bi H. Sinclair re, 'kafirekî' mîkrokredîyê",* 4ê çirîya pêşîn a 2012an, http://governancexborders.com. *Cf.* **Hugh Sinclair**, *Confessions of a Microfinance Heretic,* Berrett-Koehler, San Francisco, 2012.

(6) **Richard Rosenberg**, "Réflexion du CGAP sur l'introduction en bourse de Compartamos: une étude de cas sur les taux d'intérêt et les profits de la microfinance / *Hizrên CGAPyê li ser ketina borsayê ya Compartamosê*: lêkolîneka mijareka dîyar li ser rêjeyên faîzê û kara mîkrofînansê", *Note Focus CGAP,* hejmar 42, Washington, DC, hezîrana 2007an.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

# Dîyasporaya kurdî di 'pêvajoya aştîyê' de dikare çi bike?

DR. BAHAR BASER *



ÖZGÜR EPÖZDEMIR: **Keştî IV**, fotograf

Di têkoşîna neteweyî ya gelê kurd de cihekî gelek girîng ya dîyasporaya kurdî heye. Nexasim, piştî darbeya 1980yê tevgera kurdî ya rêxistinbûyî hem di ronahîbûna sîyasî ya gelê kurd de û hem jî li derveyî sînorên Tirkîyeyê di anîna rojevê ya têgiha ku em wê wekî 'pirsgirêka kurdî' bi nav dikin de roleka mezin lîstîye. Nexasim, di heyameka ku xeyalên Tirkîyeyê yên endametîya Yekîtîya Ewropayê heyî de, hem li parlamentoyên welatên ewropî û hem jî li Parlamentoya Ewropayê xwe kir mijara gelek rûniştinan. Kurd, piştî her bûyereka sîyasî ku li Tirkîyeyê diqewimî û eleqeya wê bi wan hebû, ji bo ku bikevin dû mafên xwe, xwe berdan kolanan, kampanyayên îmzayan lidarxistin û partîyên sîyasî yên ku li welatên lê dijîn mecbûr kirin ku di derbarê pirsa kurdî de bibin xwedî polîtîkayekê. Dîyasporaya kurdî, di rojên ku li Tirkîyeyê sîyaseta li ser navê kurdan ne gengaz bû, roleka navendî û sereke lîst. Lê îro em dikarin bi hêsanî bînin ser ziman ku vê navendê êdî berê xwe daye Tirkîyeyê. Gelê kurd îro êdî ji mêj ve ye ku benda tirsê hilweşandîye. Dîyasporayê jî di dema xwe de peywira ku diket ser milê xwe pêk anî û niha jî bi rê û şêwazên cuda berdewamî piştevanîya têkoşîna gelê kurd dike.

Guhertina konjuktura sîyasî ku bi pêvajoya 'vebûna kurdî' qels û giran be jî dest pê kiribû, niha bi 'pêvajoya aştîyê' re berdewan dike. Pêvajoya ku bi şêwaza du gav pêş û gavek paş hikûmet dimeşîne, şûna ku mafên gelê kurd lê vegerîne, wekî lutfekê piço piço van mafan pêşkêş dike û bi navbeynkarîya MITê hevdîtinên aştîyê bi rê ve dibe. Wekî ku ji alîyê gelek nivîskar û aktîvîstan ve jî tê bilêvkirin, pêvajo bi awayek şefaf nameşe û hîn ne zelal e ku di vê pêvajoyê de çi peywir dikeve ser milê kê. Ev mijar hîn nezelalîya xwe diparêze. Ne dîyar e ku dê daxwazên gelê kurd heta çi radeyê bêne pêşwazîkirin. Nexasim, hikûmet di vî warî de gavên berbiçav navêje. Di pêvajoyeka weha de, heta niha kêm kesan bal kişandin ser rola dîyasporaya kurdî. Herçiqas tê gotin ku ev bû 30 sal e ev pirsgirêk tê axaftin jî, bingeha wê xwe digihîne mêjûyeka dirêj. Di encama polîtîkayên dewleta tirk yên li hember vê meseleyê de, bi sedhezaran kurd ji ber neçarîyê Kurdistan terikandine, li bajarên Tirkîyeyê bi cih bûne an jî derketine welatên ewropî. Wek ji *Firat Newsê* **Jinda Zekioglu** jî formule dike; *"Tevî bi sedhezaran kesên ku hatina wan ya Tirkîyeyê hîn qedexe ye tam du milyon kesên ku hin ji wan ji hefsan, hin ji asîmîlasyonê û hin ji wan jî ji mirinê revîyane; axlebek wan di vî şerî de xizmên xwe wenda kirine..."* Gelo dê mafê gotinê yê van sedhezaran ku di serî de li Almanya û dûre li welatên din yên Ewropayê belav bûne di pêvajoya aştîyê de an jî di vesazîya piştî şer de hebe an na?

**Di pêvajoyên şer û aştîyê de rola dîyasporayê**

Komên dîyasporayê di roja îroyîn de wekî aktorên sîyasî yên mobîlîze û girseyên negirêdayî dewletan tên binavkirin. Li welatên ku lê dijîn, li ser pêşveçûnên sîyasî bandoran dikin. Hin kes dîyasporayê wekî *'hêza nerm'* û hin kesên din jî wekî rêxistinên civatî yên sîvîl dibînin an jî bi nav dikin.

Nexasim, piştî pêşveçûnên sîyasî yên 11ê îlonê rê li ber vebû ku çalakîyên dîyasporayê ber bi krîmînalîzebûnê ve biherikin. Di serî de li Amerîkayê û dûre li gelek welatên din, akademîsyenan di çarçoveya ewlekarîyê de rolên dîyasporayê yên di demên aştî û şer de lêkolandin, li ser sekinîn û mixabin alîyên neyînî derxistin pêş. Dihate îdîakirin ku komên dîyasporayê alîkarîyên fînansî didin alîyên ku şer dikin û ev yek jî rê li ber berdewamîya şer û şidetê vedike. Akademîsyen **Paul Collier**, di sala 2000an de li ser navê Bankaya Cîhanê da zanîn ku dîyaspora, li welatên ku lê şer heyî dibin sedem ku ev şer dirêj bikin an jî şerên li ber qedandinê cardin dest pê bikin. (1) Hin akademîsyen jî komên dîyasporayê nostaljîk û xemsar dinirxînin û tê gotin ku ji ber ku êdî encamên şer li ser wan bandoreka yekser çênake dixwazin şer berdewam bikin û li gor hemwelatîyên xwe yên ku li welêt dijîn hîn radîkaltir in.

Lê gelek lêkolîner û akademîsyen jî li hemberî vê helwestê derketin û dîyar kirin ku meriv nikare hemû dîyasporayê bêxe qabekê û îdîa kirin ku hin komên dîyasporayê hem di demên şer û aştîyê de û hem jî di demên piştî vesazîya şer de dikarin piştevanîyeka watedar pêşkêş bikin. Me jî, di gotara xwe ya sala 2008an de ku bi hevkarîya **Prof. Ashok Swainê** ji *Unîversîteya Uppsalayê* hatibû nivîsandin de dabû zanîn ku dîyaspora dikare roleka pozîtîf bilîze, heta dikare di navbera komên ku şer dikin de navbeynkarîyê bike. (2) Îro li ber me gelek mînak hene ku dîyasporayê hem di pêvajoyên şer û aştîyê de hem jî di yên pêşketinê de piştevanî kirîye.

Dibe ku li ser rola dîyasporayê mînaka herî balkêş rola dîyasporaya kurd ya ku di pêşveçûna Kurdistana Iraqê de dayî nîşandan be. Dîyaspora ji ber ku bi alîyên sîyasî, aborî û civatî ve bikaribe piştgirî bike di nava hewldanê de ye. Îro wekî ku gelek kes dizane di parlamentoya Kurdistanê de gelek kesên xwedî pasaportên ewropî hene. Ji hêla din ve hewldana kurdên Amerîka, Swêd û Holandayê ji bo ku Kurdistan bibe dewlet di radeyeka nayê bawerkirin de ye. Komeleyên jinan yên Swêdê misêwa serdana Kurdistanê dikin. Dîyasporaya kurd ya li Îngiltereyê, ji bo bîranîna ***Helebçeyê*** çalakîyan lidardixin û ji bo ku ***Enfal*** wek jenosîd bê naskirin xebatên lobîyê didin meşandin. Di encama hewldanên kurdên Holandayê de li Laheyê destûr hat dayîn ji bo bîranîna Helebçeyê peykerek bê çikandin.... Ango bi gotineka din, dîyaspora roleka çalak dilîze. Ji hêla din ve, gelek kes ji Ewropayê vedigerin Kurdistanê û piştgirîya perwerdahîyê dikin û hewl didin ku hêzeka kar ya bi kabîlîyet derkeve meydanê.

Gengaz e ku mînakên din bên dayîn. Dîyasporaya Somalîyê, li Îtalya, Holanda û li Norwêc piştgirî dide projeyên aştîyê yên li welatên xwe. Komeleya dîyasporayê ya bi navê ***Himilo Relief and Development Association*** (HIRDA) (3) ku li Holandayê ye, ciwanan perwerde dike û ji bo ku tevlî şerên eşîretan nebin wan hişyar dike. Lêkolînên bi hûrgilî yên komeleyên sûdanî ku di pêvajoyên aştîyê de lîstine hene. Enstîtuya Aştîyê ya amerîkî (United States Institution of Peace) ji bo çareserîya nakokîyên li Darfûrê, serî li dîtinên dîyasporayê dide. (4) Dîyasporaya lîberyayî ya li Amerîkayê, bi nûnerên Neteweyên Yekgirtî û rêxistinên sivîl yên civatî re hevdîtinan li dar dixe û bi saya vê hevkarîyê




ÖZGÜR EPÖZDEMIR: **Keştî V**, fotograf

piştgirîya dezgehîbûna Lîberyayê dike. Nivîskarên wekî **Awil Mohamoud** û **Sarah Osman** (5), di encama lêkolînên xwe yên li ser dîyasporaya afrîkî de didin zanîn ku, komeleya bi navê *Jinên Brûndîyî* çawa di kewandina têkilîyên ***Hûtû*** û ***Tûtsîyan*** de roleka mezin lîstine. Dîyasporaya kurdan, di nav van dîyasporayên ku me navên wan li jor anîn ziman de hem ji hêla hêjmarê ve û hem jî ji gelek hêlên din ve hîn bi hêztir e û ji bo ku piştgirîya aştîyê bike xwedî potansîyeleka gelek mezin e.

## Lihevhatina/mutabakata civatî û rola dîyasporayê

Ji xeynî sererastkirinên zagonî yên li Tirkîyeyê xaleka din ya girîng jî ew e ku lihevhatineka civatî pêk were. Tiştê ku hewcedarî pê heye ew e ku mafên kurdan li wan bên vegerandin û herweha her beşê civatê 'bi paşeroja xwe re rû bi rû bibe' û xwe ji bo 'pêvajoya aştîyê' amade bike. Di encama şerê ku ev bi salan e didome de, her du alî bûne xwedî pêşhikman. Ew pêvajoya ku em jê re dibêjin pêvayoya aştîyê tenê li ser maseyên mizakereyê pêk nayê. Piştî bêdengkirina çekan dê ew pêvajo di warên gelemperî de bidome. Herweha divê bê hesabkirin, dê her du gel çawa li hev bên û şertên vê yekê divê li ber çav bên girtin. Heta ku heyama rûbirûbûnê pêk neyê, dê têgehên wekî demokrasî û aştîyê neyên. Baş e, gelo dê ev rûbirûbûn çawa çêbibe? Li vê derê dadmendîya dema derbasbûnê û komîsyonên rastîyê yên girêdayî wê derdikevin pêş. Navenda Navnetewî ya Dadmendîya Derbasbûnê, dadmendîya dema derbasbûnê weha şirove dike:

"Dadmendîya dema derbasbûnê, di rewşên binpêkirinên sîstematîk yên girseyî yên mafên merivan de ji bo ku mafên mexdûran li wan bên vegerandin û ji bo ku sîstemên sîyasî yên van neheqîyan diafirînin, pevçûn û faktorên din bên veguherandin, li ser lênêzîkbûna avakirina rewşên pêwîst hewcedarîyek e.

Vayê dema ku meriv li vê rewşa Tirkîyeyê rû dayî û her berdewam e dinêre, pêwîstîya pêvajoyeka weha derdikeve meydanê. Ji dema pevajoya ku wekî 'vebûna kurdî' tê binavkirin destpêkirî, tiştên ku li ***Girtîgeha Amedê*** hatî jîyandin, tawanên li dij merivahîyê yên JITEMê lidarxistî û binpêkirinên mafên merivan yên ku şer bi xwe re anî, ev îhlal tev di medyayê de jî cih digirin. Lê bi şêwazeka ku naveroka wê nayê tijekirin û ne bi awayeka sîstematîk. Ji ber ku di carekê de ewqas li ser tê axaftin, ev mexdûrîyetên hatî jîyandin tên normalîzekirin û di nav guftûgoyên ji rêze de girîngîya xwe wenda dikin. Divê rastî derkevin meydanê. Her du gel jî rastîyên ku ji wan hatî veşartin bizanibin û hemû tişt bi awayek vekirî bên meydanê. Aştî, ancax bi vî awayî dikare pêk were.

Divê di pêvajoya aştîyê de nebza dîyasporaya kurd bê girtin û tavsîyeyên wê ji alîyên aktorên sîyasî ve li ber çav bên girtin. Di vê pêvajoyê de dîyaspora kurdî jî, kurdên li Tirkîyeyê dijîn jî teref in. Ancax, berpirsîyarîya dîyasporayê ne tenê bi parvekirina fikr û dîtinan sînordar e. Dema ez li wêneya pêş me dinêrim, dîyasporaya kurdî di vê çarçoveyê de û di pêvajoya îroyîn de dikare roleka girîng bilîze. Lê divê di serî de bê pejirandin ku dîyasporaya kurdî jî di vê pêvajoyê de xwedî maf be. Li ser banga **Ocalan**, li Brukselê ***Konferansa Aştî û Demokrasîyê*** hate sererastkirin. Ev yek ji ber ku derfet da ku dîyaspora jî dîtinên xwe bîne ziman watedar e. Dosyayên gelek kurdan bi Tirkîyeyê re hene ku ev bi salan e li derveyî vî welatî dijîn. Dema min lêkolînên xwe didomandin, ez bi gelek aktîvîstên kurdan re hatim cem hev. Piranîya wan di salên 1970 û 80yan de li girtîgehan razabûn û gelek ji wan ji ber îşkenceyên ku jîyabûn hîn pirsgirêkên tendirustî dijîyan. Ne gengaz e ku meriv van kesan nostaljîk û xemsar tawanbar bike. Berîya 20, 30 salan van kesan ev tişt jîyane û hîn şopên kiryarîyên faşîzmê di gihan û laşê xwe de bar dikin. Gengaz e ku ev kes bikarin di pêvajoyeka weha de rol bigirin û gelên ku li Tirkîyeyê dijîn bi bêedaletîyên paşerojê re rû bi rû bikin.

Du peywirên ku dikevin ser milê dîyasporayê hene. A yekemîn, divê binê têgeha dadmendîyê misêwa binxêz bike û di dadmendîya dema derbasbûnê de israr bike. Ji bo damezirandina komîsyonên dadmendîyê bangan bike û daxwazên kurdên dîyasporayê her bîne rojeva rayagiştî. Ne ji ber ku dîyaspora mexdûrîyetên ku jîyane bi bîr bîne û bûyerên bi vî rengî carek din neyên jîyandin. Ji bo damezirandina komîsyonên rastîyê, hem li hundirê welêt û hem jî li derveyî welêt li ser rayagiştî zextan çêbike. Dîyasporaya kurdî bi piştgirîya ji mîlyonek kurdan zêdetir li Ewropayê xwedî hêzeka sîyasî û civatî ye û divê aktorên sîyasî yên Tirkîyeyê berê xwe bidin vî alî.

Dîyasporaya kurdî, dê ne yekane dîyaspora be ku helwesteka weha girtibe. Wekî mînak, piştî şerê Lîberyayê komîsyonên rastîyê hatin damezirandin û gelek lîberyayîyên li dîyasporayê di van komîsyonan de şahidî kirine. Dîyasporaya lîberyayî, bi alîkarîya rêxistinek sivîl ya amerîkî di lihevhatina civatî de roleka mezin lîstîye. (6) Herweha dîyasporaya Haîtîyê mînakeka din e. Dîyasporaya Haîtîyê li Kanadayê di damezirandina komîsyonên heqîqetê de wezîfe girt. Dîyasporaya kenyayî jî di amadekirina raporek li ser navê *Komîsyona Dadmendî û Rastîyê* de ji nêzîk ve çavdêrî kirîye. Dîyasporaya kamboçyayî jî bi alîkarîya Navenda Dadmendî ya Dema Derbasbûnê ya Navnetewî tevlî pêvajoya çareserîyê bûye. Dîyasporaya kurdî jî dikare wekî van grûpan di pêvajoya aştîyê û di dema piştî wê de roleka çalak bilîze.

Peywira duyem ya dîyasporaya kurdî jî ew e ku dê ezmûna têkoşîna xwe ya ev bi salane ji bo nasnameya kurdî dide îro ji bo aştîyê bikarbîne. Herweha divê neyê înkarkirin ku pirsgirêka kurd-tirk ne tenê di nav sînorên Tirkîyeyê de maye, herweha ketîye qada sîyasî ya navnetewî jî. Ev bi salan e gelek bajarên ewropî bûne zemîna pevçûnên alozî yên di navbera van gelan de. Li Belçîkayê di navbera ciwanên kurd û tirk de pevçûnên kolanan qewimîne, li Holandayê hem li hember komeleyên kurdî û hem jî li hember yên tirkî êriş hatine pêkanîn û li Almanyayê jî di bûyerên protestoyî de ji herdu alîyan gelek kes birîndar ketine. Acizîyên di navbera gelê kurd û tirk de, hîyerarşîyên hêzê û bêedaletî li derveyî sînorên Tirkîyeyê ji nû ve tê rûniştandin. Lewre, di stratejîyên ku dê ji bo sererastkirina têkilîyên di navbera gelên Tirkîyeyê de bên amadekirin de dîyaspora jî divê li ber çav bê girtin. Ji ber ku dîyaspora li derveyî welêt ava bûye, taybetmendîyeka xweyî navnetewî heye û divê ev taybetmendîyên wê jî neyên jibîrkirin. Pirsgirêkên dîyasporayê yên di navbera kurd û tirkan de dikare bi pêvajoya aştîyê re çareser bibe û ji bo vê yekê jî roleka mezin dikeve ser pişta dîyasporaya kurdî. Dîyaspora kurdî, ji ber ku hem li civatên ku lê dijîn û hem jî sîyaseta van welatan baş nas dike û bêedaletîyên ku berê jîyaye carek din nejî mecbûr e ku pêvajoya aştîyê derbasî qada navnetewî bike. Bêadeletîyên wekî krîmînalîzekirina tevgera kurdî jî herweha dikare di encama lihevhatina grûpên kurd û tirk yên li dîyasporayê de dawî lê bê.

Wekî gotina dawî, divê meriv vê yekê jî bêje ku dîyasporaya kurdî ne xwedî fikreka hevpar e û herweha ne vesazîyeka homojen e. Di nav dîyasporayê de gelek kes û grûpên xwedî fikr û helwestên cuda hene. Di pêvajoya aştîyê de dîyasporaya kurdî heger bibe xwedî peywir, divê van dîtinên cuda bîne cem hev û li ser esaseka minîmûm ya hevpar xwe îfade bike. Aştîya mayînde, dê hem li dîyasporayê hem jî li welêt piştî rûbirûbûna bi paşerojê re bê.

* Akademîsyen, lêkolîner, Zaningeha Warwick, Îngiltere

(1) **Collier, Paul,** 2000. Economic Causes of Civil Conflict and their implications for Policy, World Bank, *Development Research Group Report*, Washington.

(2) **Baser, Bahar** and ***Ashok Swain*** 2008. Diasporas as Peacemakers: Third Party Mediation in Homeland Conflicts, in: *International Journal on World Peace*, 25, 3, 7-28.

(3) http://hirda.eu

(4) Darfur Diaspora Consultation 2010, http://www.usip.org/programs/projects/darfur-disapora-consultation-2010

(5) **Mohamoud, Awil** and **Sarah Osman**, “The African Diaspora as Agensts of Peace on the Continent”, http://www.diaspora-centre.org/DOCS/Awil_Mohamoud_and_.pdf

(6) **Young, Laura A. Young** and **Rosalyn Park**, “Engaging Diasporas in Truth Commissions: Lessons from the Liberia Truth and Reconciliation Commission Diaspora Project, IJTJ (2009)

Wergera ji tirkî: Yado Ciwan

## Ragihandina eskerî di demên şerî de

# Dîmenên paqij, şerên qirêj

Philippe Leymarie*

"*Şerê nepenî... bêdeng... bê dîmen... xeyalî... bê dijmin... bê mexdûr... bê girtî û dîl...*": hefteyên pêşî yên şerê li Malîyê kanûna paşîn a 2013an hem ji bo sazîyên çapemenîyê û hem jî raya giştî sergêjker bû. Merivî ew guman dikir ku "Bêdengê Mezin [navê li Artêşa Fransî ya dema Komara Sêyem dihat kirin]" hêdî hêdî destûra ragihandina nîvderbasker daye ragihandina li dijî cîhadîstan û ya ku rola baş dide Fransayê: ew rola dayika serketinê, bi navgînên pir û bi taktîka bêqisûr gurçûpêçkirî ya ku li hemberî wê tu tiştê nikare xwe bigire. Ji wê herweha wê bihata ku vekirina li êriş û derbxwarinan a artêşa Malîyê jî bi rê ve bibe, pêre jî derfeta werçerxeka serketî da serokkomar **François Hollande**, dişibîya ya *împeretor* **Nicolas Sarkozy** li dawîya serborîya wî ya lîbyayî. (1)

Nîvê kanûna paşîn a 2013an di destpêka destwerdanê de pêleka ji sed û pêncî rojnamevanan pêk tê li paytext ***Bamako*** yan jî li bakurtir li erdên li pişt bereyeka zû ji holê radibe asê ma. Berdevkê Fermandarîya Giştî ya Artêşê mîralay **Thierry Burkhard** ji me re dibêje ku wan pêşî dixwest "*dîmenên nînin bikşînin, heta yên şerên pêk nehatî jî*". Ne mimkin bû her tiştê ku meriv bike bi mentiq bin: "*hemûyan dixwest li VABya* [wesaîta li pêş a zirîpûş] *alayê siwar bibin.*" Dîsa jî ji bilî fitlên balefiran, hatin û çûna eskeran pê ve – wekî dema operasyona "bahoza çolê" ya sala 1991ê li Kendavê – tiştekî din merivî nedikarî nîşanî wan bide.

Du mehan piştre, di adara 2013an de di hefteya yekem a şerî de, li çîyayên ***Adrar*** ên ***Ifoghasê*** li devera herî li bakurrojhilatê welêt, rojnamevanan dîsa dixwest hertiştî bibînin: dîlên şer, laşên cîhadîstên kuştî. Careka din "*dîmenên ku nînin*" li gorî mîralay Burkhard. Heke meriv ji wî bawer bike, girtina dîmenê şerî hêsan nîne; ew dibêje: "*encama wê, ne şerê Stalîngradê ye û ne jî Ketina bazê reş e.*" (2)

Di dema tevahîya şerî de, ev efserê pêwendîya wî bi çapemenîyê re nebaş, neçar bû hevrikîya tîcarî ya di navbera kanalên mezin ên televizyonê de bi rê ve bibe "*carinan zirara vê li agahîyan dibû*", wekî mînak dema yekê ji kanalan doza bi tevahî betalkirina siwarbûna li wesaîteka eskerî dikir, li şûna ku hevrikê wê bi tenê biçe. Lê belê, **Jean-Marc Tanguy** li ser bloga xwe ***Le Mamouth*** vê tesbîtê dike "*versîyona ku serdest* [li nav rojnamevanan di biwara şerê li Malîyê de] *ya vegereka berepaş e li gorî versîyona heta niha me şahidî lêkirî, wekî mînak li Efxanistanê* ". (3)

Birêveberê şandeya agahdarî û ragihandina bergirîyê (DICOD) **Pierre Bayle** lê zêde dike û dibêje, piranîya nûçegihanên taybet ên şandî Malîyê ciwanên kêm haya wan ji teknîkên eskerî û rastîyên afrîkî hebûn. Li gorî wî ev xeşîm li benda "*şer, agir û teqînan*" bûn; lê belê wan bi tenê karîbû lojîstîkê nîşanî wan bidin. Şerê asîmetrîk "*şerekî ji dûr ve ye, kêm dîtbar e*".


Komandoyên hêzên taybet ango serê rima êrişa firansî çiqasî bi pêş ketin, cîhadîst ewqasî vekişîyan ber bi quncik û starên welêt ve: ango şerên meriv nîşan bide nebûn. Û heke şer biqewimîyana jî, hêzên taybet dikevine ber sira bergirîyê: artêş tevger û awayên çalakîyê yên van eskerên ku "pêşî dikevin" nav şerî di diparêze. Qanûn bi awayekî zelal qedexe dike ku nasnameya wan were eşkerekirin. **Bayle** dibêje, "*rojnamevanan bi eskerên çadî re dikarîbûn dîmenên xweşik bigirin, paşê li Adrarê.*" Di encamê de komên kameraman ên artêşê yên ku "*Famas* (4) *li pişta wan*" yên herî hilberîner bûn. Şefê buroya ragihandinê ya Fermandarîya Giştî yê ku hevalên wî ji ber gelek daxwazên siwarbûna li balefirên ***Transall*** a ku rojnamevan û teknîsyenan bi henekî navê ***"Air Burkhard"*** lê kirine, gazinan dike û dibêje, "*rojnamevan bawer dikin ku rêwîtîya bi balefirên eskerî mafek e*". Lê belê mîralay pesnê xwe dide ku wî di heman demê de di nava van "*veguhestinên bi kaşkaşkan*" şans daye sazîyên çapemenîyê yên hindiktir girîng jî, yên wekî ***France 24*** ku hin temaşevanên malîyî jî dikarîn lê binêrin. Di nava du mehan de, wî di nava artêşê de bi giştî çar sed rojnamevanên ji du sed û duwazdeh sazîyên çapemenîyê hewandin. Berîya her tiştî artêşa fransî dikare pê qebqebûyan bike ku bi saya serê komên wê yên nûçegihanan bi xwe wê karî dîmenên ji nûçegihanên taybet kêm dabîn bike: sed û bîst dîmen û pênc sed wêneyên li ser wan mafê telîfê nîne, **Burkhard** heyirî dibêje "*carinan bêyî ku behsa koka wan a eskerî were kirin hatin bikaranîn.*" Bi tevahî piştî ku "*fêm kir ku rojnamevan dê tu carî razî nebin bi ya ku meriv nîşanî wan dide*" ew difikire ku axirî nûçegihanîya li Efxanistanê bi parkûreka gelekî organîzekirî û opsîyona ***embedded*** (gotin bi gotin maneya wê: "di nav heman nivînê de" ango di nava yekîneyên eskerî de bicihkirî) di pratîkê de yekane tercîha mimkin bû. Ev avantajek bû ji bo kesê agahîyan dide, loma ji wan re hêsantir bû ku rojnamevanan hestyar bikin di biwara mecbûrîyeta "ewl. Op." ango ewlekarîya operasyonan de. Lê belê herweha mecbûrîyetên mezin ên di warê veguhestinê, prosedûr û parastinê de jî: maneya her koma ku li VAByekê siwar bibe ew e ku sê esker jê peya dibin. **Burkhard** henekan dike "*heke em pir pêde biçin, em dê êdî şer nekin, lê belê veguhestinê bikin!*" Li alîyê din, şerê tevgerê wekî li Malîyê zehmet dike ku rojnamevan bikevin nav yekîneyên eskerî.

Nûçegihanê mezin ê France 3yê **Hervé Ghesquière** wan kesan hemûyan bi gewde dike ku pê razî nabin ku li cem yekî ji şervanan li wesaîtekê siwar bibin. Piştî ku di encama hevdîtinên bi rayedaran re dawîya sala 2009an li baregeheka bereya li pêş a eskerên fransî û efxan ma, westîyayî ku timî "*melekên wî yên parastinê*" her pêre bin, wî xwest bi xwe li fikra gundîyên gelîyê ***Kapîsa*** bipirse. Wî hez dikir îşaret bi angajmana fransî ya li Efxanistanê bike ji bo bernameya "Pièces à conviction (delîlên dozeka dadgerîyê)", salekê piştî kemîna kujer a li ***Uzbînê*** li pêncî kîlometreyekî dûrî bakurê Kabûlê, a ku di encamê de -18 û 19 tebaxa 2008an- deh eskerên fransî hatin kuştin û bîst û yek esker jî birîndar bûn.

Bi kameramanê xwe **Stéphane Taponier** re **Ghesquière** hat revandin, pênc sed û çil û heft rojan rehîn hat girtin. (5) Birêveberên sîyasî û eskerî ew wekî "*bêdisîplîn*", "*nehişyar*", "*neguhdarê hişyarkirinan*" nirxandin, ew gunehbar kirin bi "*berdêla wê çi dibe bila be gihiştina nûçeyê berîya herkesî*" (6), "*afirandina tehlûkeyan ji bo eskeran*" û bi bihabûna ji bo komarê (7); li hember vê wî hewl da ravekirineka stratejîk bike. Serpêhatîya wî vediguhere zirareka kolateral û ew bi xwe dibe serê gunehan: "*şaşîya me ew bû ku me kir talîban me birevîne li ser rêyeka di navbera du baregehên eskerî yên fransî yên li Tagab û Torayê de. Armanca van baregehan misogerkirina ewlekarîya rêya sereke ya bi navê 'Vermont' a ku rojhilatê Efxanistanê bi Pakistanê ve girê dide.*"

Paşê, rojnamevanê France 3yê gihişte wê encamê ku "*têkçûneka pir xirab a mîsyona fransî*" heye, a ku rave dike polemîka ku revandina wî rê li ber vekirî, wê dema ku jixwe nîşanên wê nîqaşê xwe dida der a ku rê vekir li ber derxistina eskerên şervan ên fransî ji Efxanistanê du salan berîya yên koalîsyonê. **Jean-Louis Georgelin** ê ku di dema rehîngirtina herdu zilaman de Fermandarê Giştî yê Artêşê bû **Ghesquière** bi van gotinan gunehbar dikir "*Nehişyarbûna we kir ku xebata li herêmê ji hev de bikeve. We kir ku em bibin xwedî helwêsteka êrişkar a ku pêkanîna wezîfeya me ya 'bidestxistina dil û mejîyan*' zehmet kir."

Şefê bîstek efserên çapemenîya artêşa fransî li Kabûlê di navbera îlona 2009 û nîsana 2010an de alîkarê mîralay **Jacky Fouquereau** şahidî li hatin û çûna nêzî dused rojnamevanan kir ku di nava wan de **Ghesquière** û **Taponier** jî hebûn. Di destpêka mana wan a li Efxanistanê de mafê hemûyan ê brîfîngeka ewlekarîyê hebû: deverên qedexe, deverên azadîya çûnûhatinê li wan sînordarkirî, helwêsta divê beramber karker û eskerên efxan were nîşandan û hwd. Piştre jî efserekî çapemenîyê yê bi ewlekarîya wan a tavilê û birêvebirina nûçegihandina wan li gorî çarçoveya eskeran wezîfedarkirî didan ber wan. Alîkarê mîralayî zehmetîyeka bi rojnamevanên amerîkî re tîne bîra xwe, van rojnamevanan dixwest dakevin bazareka ku wekî kêm ewle dihat dîtin, çûna vê bazarê bi tenê dikarî bi hejmareka mezin a eskeran pêk were ji bo pêkanîna ewlekarîya rojnamevan û ya rehetkirina dilê xelkê li bazarê.



Özgür Epözdemir: **Beriqîn I**, fotograf

Bi awayekî giştî ragihandina operasyonel a ku jixwe ragihandineka krîzê ye, hin mecbûrîyetan ferz dike. **Fouquereau** dibêje "*ev ne rastîya televîzyonê ye: mîralayekî ku berpirsîyarê yekîneyekê, operasyonekê ye hez nake ku mîkrofonek li ber bêhvila wî girtî be dema ku ew karê xwe dike...*" Di lêpirsîneka salekê piştî bûyera ***Uzbîn***ê de di nava yekîneya eskerî ya fransî de, ew îdîa dike ku wî koma France 3yê hişyar kirîye ku bi dizî çûna wan a wezîfeyê "*erdê tiştê ne mimkin*" bû û ecêbmayî mayîye – li cem birêveberîya kanala televîzyonê û hîyerarşîya wê li cem wezareta bergirîyê jî – ji ber vê "*guhertina hilgirtinê*".

Rojnamevanên ku di devereka din re derbas dibin, li herêma Tagabê di 29ê kanûna paşîn a 2009an de hatin revandin. Rojên piştre bereya gelîyê ***Kapîsa*** hatibû bêtesîrkirin, plana xebata fransî di nava Hêza Navneteweyî ya Alîkarî û Ewlekarîyê (ISAF) de kêm bû, rojnamevanên li deverê şandin welatê wan û li deverê tevahîya ragihandinê ji bo gelek mehan rawestîya.

Ji hingê ve rehîngirtin li ser qada operasyonekê pir rûbide jî, serpêhatîya **Ghesquière** careka din neqewimî. **Burkhard** binxêz dike dema ku meriv ji wan re rave dike ku agahîyek hesas e (navê gundekî, rêyeka em têre diçin...) "*rojnamevan bi giştî li vê fikara veşartîbûnê mukir tên*". Ew fêm dikin ku bi girêdanên xwe û nûçegihandinên xwe yên di dema bûyerê de, bi telefonên xwe yên satelîtî, bi blog, tevnên xwe yên civatî ew çavkanîya herî baş û heta yekane ya agahdarîyan in ji bo dijmin ê ku ne xwedîyê navgînên bipêşketî ye. **Bayle** bi bîr dixe "*hevalên li hember, ên di şikeftan de, ew her weha li ser înternetê jî şer dikin. Ew agahî û îstîxbaratê digirin.*"

Lê belê ji bo hin kevne profesyonelan (8) maf û erka rojnamevanîyê ew e ku biçe li nûçe û agahdarîyan bigere. Ew ji ber **Yves Debay** digire "*eskerê agahîyê di bereya pêşî de dimire*" kanûna paşîn a 2013an li Sûrîyeyê, wekî mînaka tîpê nûçegihanê şer *wildcat* ("bi tehlûke") yan jî wekî mînaka FTP (franc-tireur photographe/wênegirê bi tena serê xwe). (9) Ew nerazî ye ji "*werçerxa 11ê îlona 2001ê*" lewre ji wê demê û pêve "*rojnamevanê rojavayî wekî dijmin xuya kir*". Ji hingê ve pir zehmettir bû ku rojnamevan şerekî ji herdu alîyan ve bişopînin, berê dikarîn vê bikin, mesela di dema şerê Kendavê yê yekem de, li Balkanan, li Îsraîl û Filistînê yan jî di şerên mezin ên navxweyî yên li Şaxê Afrîkayê.

Ev şopandina "ji alîyekî ve" ji bilî ku tehlûkeya manîpulekirinê zêde dike, bi xwe re zehmetbûna bicihkirina rojnamevanan, bangên li ser hev ên otosansûrê û heta qedexeyeka gihiştina hin çavkanîyan yan jî hin deveran jî tîne. Ev yek li ***Malîyê*** bi her halî neqewimî: tevî ku rojnamevanan nedikarî dîmenên bi dilê xwe bigirin jî bi xweserîyeka têra xwe fereh tevgerîyan. Li ser kîsê komarê ew nebirin heta bi ***Bamakoyê***, çawa ku di şerên din de qewimîbû: operasyonên ragihandinê "*rêwîtî jî di navê de*" veguherîn îstîsnayan ji ber kêmkirinên budceyî. Birêveberê DICODê henekan dike "*dijminê sereke êdî ne talîban e, lê belê RGPP ye!*". (10) Wekî din, ji ber ku çapemenî tu caran ne li rêza herî pêş e di girêdanên hewayî yên eskerî de û ji ber ku bicihkirina di nav yekîneyên şervanan de bi tenê pir kêm caran tê erêkirin, gelek rojnamevan ne yekser girêdayî artêşa fransî bûn. Ango wan karîbû xwe ji qaîdeyên agahdarkerên xwe rizgar bikin.

Maneya siwarbûna sazîyên çapemenîyê li wesaîtên wezîfeyê yên hêzên eskerî yên fransî ji bo serredaktora servîsa derveyî weletbergirîyê ya TF1 û LCIyê **Patricia Allémonière** ew e ku meriv misêwa "*tê kontrolkirin*": artêşek refaqetî rojnamevanan dike û wan dixe nav çarçoveyekê û ev artêş berîya her tiştî dixwaze peyameka erênî bide da ku bike ku raya giştî ya li Fransayê pişta wê bigire. Bi heman awayî ev rojnamevana ku ji bo ragihandina nûçeyên li ser şeran *şero mêvanê herro* ye, aciz e ji elaqe û haydarîya eskerên fransî yên ku ji bo "sifir mirinê" berdêla wê çi dibe bila bibe dixwazin ku tiştek neyê serê rojnamevanan û li gorî wê ev mubalexekirina tedbîran e. (11)

Kevne fermandarê îstîxbarata bilind a eskerî general **Vincent Desportes** vê pirsê ji xwe dike: "*gelo ya girîng ew e ku meriv di şerekî de bi ser bikeve yan wî şerî nîşan bide?*" Ew bi israr behsa alîyê derûnî yê şerekî dike: mesela, dijmin wê bixwaze ku berfirehîya "zîyanên koleteral" yan jî xwepêşandaneka gundîyan a alîgirê serhildêran derêxe pêş.

Şer her weha li bereyên ragihandinê jî dewam dike; tevî ku di êrîşa-brûskî de tu dewra wan nebû jî "*divîyabû meriv karibe eskerên malîyî tevî alayên wan li pêş nîşan bide*" dema ku eskerên fransî ber bi ***Gao*** û ***Tombouctou*** yên li bakurê Malîyê ve bi pêş diketin, da ku raya giştî û artêşa malîyî karibe were aşkirin. Ev li gorî efserê general delîl e ku "*dîmênên kêlîyê dikarin pêkanîna dawî ya operasyonekê asteng bikin*". Û heke "*di prensîpê de hertişt karibe were weşandin jî, hevwelatîyên me timî ne xwedîyê wê mesafeya pêwîst in ku karibin wê binirxînin*". Li gorî wî normal e ku meriv heta radeyeka dîyar "*dîmenan kontrol bike*". (12)

Ev lipaşmana agahdarîyan di heman demê de nakokane ye bi yekê ji armancên sereke yên ragihandina operasyonel re: razîkirina raya giştî ji bibingehbûna destwerdanê û ravekirina awayê tevgera eskeran li cihê cih ji bo gihiştina armancên dîyarkirî. **Burkhard** weha şirove dike "*ji bilî rewabûna ku destekeka mezin dide operasyonên me, ew di heman demê de faktoreka dîyarker e ji bo morala esker û malbatên wan*". (13)

Lê belê, wekî mînak, heta ku meriv mirîyan nîşan bide, Konseya Bilind a Odiyovîzuel (CSA) a ku kanûna pêşîn a bihurî pêşnîyazî sazîyên çapemenîyê kir ku dîmenên mirîyan li Malîyê nîşan nedin, di cih de berê tîrên rexneyên ***Rojnamevanên Sînornenas*** bi ser xwe de kişandin: "*li ser navê parastina temaşevanên ciwan gelo CSA ragihandina fermî ya operasyoneka eskerî naparêze? Ev tiştekî sosret e ku ji şerekî bi tenê çûnaavaya rojê ya li ser tankên dibiriqînin nîşan bide. Raya giştî pê razî nabe bi tenê bi agahîyên di bin kontrola eskeran de dayî hev yan jî yekser ji alîyê artêşê ve hatî belavkirin.*"

Malpera ***Arrêt*** li ser wêneyên 29ê tebaxa 2008an ên çend rojan piştî kemîna li ***Uzbînê*** ev sernûçe bi kar anîbû "*di şerî de dîmenên paqij û dîmenên qirêj hene*". Rojnamevanê France 3yê **Pierre Babey** hingê talîmatên li cihê cih di merîyetê de bi bîr xistibûn: wêne û dîmenên mirîyan negirin; dîmenên kemîna Uzbînê nînin; dîmenên tabûtên ku bi balefiran şandin welêt nînin. Wekî din li Efxanistanê, wekî di şerê Cezayîrê û yê Kendavê de jî hevpeyvînên li bereya dijmin pir kêm bûn, ev e sedema "*wê hisa serdestîya dîmenên rojavayî*".

Wênegirê alman **Horst Faas** nûçegihanîya şerê Vîyetnamê ji sala 1962yan heta sala 1974an kir, buroya wêneyan a ajansa nûçeyan ***Associated Press***ê ya li Saygonê bi rê ve bir û wêneyên eskerên dimirin yan jî sivîlên ku bombebaranan teror li ser wan dimeşand diweşandin. Ew bi bîr dixe ku hingê mimkin bû ku wêneyê mirîyan werin weşandin heke malbat hatibûya haydarkirin. Ew poşman e ku ji hingê ve "*şer burokratîk bû. Destûr ji bo hertiştî divê. Çûna deverê sînordarkirî ye û pêre jî wênegir berîya şerî yan jî piştî şerî nîşan didin. Heçî alîyê sansurê ye, birêveberîya amerîkî qaîdeyên ecêb danîne yên ku girtina wêneyê birîndarekî qedexe dikin bêyî destûra wî hatibe standin. Gelo ji wan merivan destûr tê xwestin berîya ku bombeyan bi ser bedenê wan de dişînin*?" (14)

Eskerên amerîkî – li Ewropayê jî hevpîşeyên wan ên alman – wekî hostekarên "psy-ops [operasyonên psîkolojîk]" tên qebûlkirin: rêbazên bandorê yên ku wan bi rêya NATOyê dan qebûlkirin, nexasim li Efxanistanê. Piştî êrişên ***11ê îlona 2001ê Pentagonê*** bi awayekî nepenî ***Office for Strategic Influence*** (OSI) damezrand, ev dezgeheka propagandayê bû a ku armanca wê "*rengdana rayên giştî di asta global de bi rêya jehrîkirineka zêde ya sazîyên çapemenîya klubên fikr ên bitesîr û bi rêya komên zextê*" bû. (15) Sala 2002yan ***Office of Special Plans (OSP)ê*** şûna OSIyê girt û paşê sala 2003yan bû ***Northern Gulf Affairs Office***, buroya analîzê û ya ragihandinê li ser rewşa Rojhilata Nêzîk a ku armanca wê ya sereke ev bû: "*Zêde belavkirina agahdarîyan çi bi rastî û çi lihevçêkirî li ser çekên tinekirina girseyî da ku destwerdana amerîkî li Iraqê amade bike*". Vê buroyê xwe spart şirketa taybet ya têkilîyên bi xelkê re ya bi navê ***Rendon Groupê*** ku pisporê stratejîya bandorê ye ku argumanan amade dike û rojnamevan disinifandin li gorî pîvana "asta bawerîpêanînê".

Eskerên fransî jî yên ku demeka dirêj gelekî rastgir man, di dema şerên mezin ên kolonyal ên salên 1950yî de bi bahaneya şerê li dijî komunîzmê, karîn şerekî agahdarîyê bi rê ve bibin. (16) Li Hindoçînê li hember neteweperestên ji wan dihat kêmasîya xwe ya eskerî bi xwe sipartina çeka xwe ya îdeolojîk tezmîn bikin, buroyeka şerê psîkolojîk hat wezîfedarkirin bi lêkolîn û birêvebirina her awayê çalakîya ji bilî şerê çekdarî bi rê ve bibe ya ku hêvî jê tê kirin "*êrişê bibe ser moral û daxwaza şerkirinê ya dijminî*" bi rêya propaganda, sansur, lihevçêkirina xwepêşandanan û hwd. Ev rêbaz li Cezaîrê hatin bêqisûrkirin û giştîkirin, nexasim jî bi damezrandina Navendeka Perwedekirin, Pasîfkirin û ya Kontragerîla ya ku dersên navgînên bêmoralkirin, qanehkirin û civandina dijmin didan. *Groupement de renseignement et d'exploitation* (GRE) bi xwe manovrayên dezînformasyonê yên ku armanca wan ***Front Libération Nationale*** / Bereya Rizgarîya Neteweyî (FLN) û partîzanên wê bûn, îdare dikirin. Herweha kirinên nûtir ên manîpulasyona çapemenîyê jî têne bîra me: gora komî a sexte a ***Tîmîsoarayê*** ya li Romanyayê berîya jidesthilatdarîyê xistina **Nicolae Ceaucescu** sala 1989an, yan jî kontrola pir teng û dijwar a dîmen û peyvan a bi destê Fermandarîyên Giştî yên hêzên hevgir û pisporên ragihandinê di dema şerê Iraqê yê sala 1990-1991ê de; û herî dawî dîsan li Iraqê dagirkirina sala 2003yan ya ku kilîta wê "çêkirina dijminî" bû. (17) Qadeka ku weha dîyar e ku tu sînorên xeyala merivî nînin...

## Tevnên civatî li hember sirên bergirîyê

Wezareta bergirîyê li şûna ku hewl bide bikaranîna tevnên civatî yên ku êdî nabe meriv xwe ji wan xelas bike ji alîyê eskeran ve sînordar bike, tercîh kir ku "bikaranîna baş" dîyar bike bi weşana rêberekê; çend xalên ji ber vê rêberê girtî li jêr in:

- Rêzgirtina ji ewlekarîya operasyonê re: di statuya besît, wêne û dîmenan de carinan agahîyên stratejîk dikarin hebin. Di şerên modern de dijminên me bi awayekî birêkûpêk li înternetê digerin, da ku agahîyên hesas û deverên ku em dikarin derbê ji wan bixwin bibînin.

- Cihên avahîyan, detayên bicihbûnan, ziyanên mihtemel, nirxandinên morala eskeran, modalîte û bîlançoya çalakîyan û hwd. agahîyên parastî ne û nabe ku werin weşandin.

- Lê bifikirin, dem û cihên tam ên çalakîyên operasyonel ên dimeşin yan jî tên plankirin, yan jî navên eskeran neweşînin.

- Tu carî li ser wêneyên xwe yên weşandî jeolokalîzasyonê bi kar neînin: ji bîr nekin li ser Facebookê wê betal bikin. GPSa smartphonea xwe vemirînin. Bi awayekî sîstematîk berîya ku hûn wan biweşînin planapişt a wêne û dîmenên xwe kontrol bikin.

(Rêbera bikaranîna baş a medyayên civatî, nîsana 2012an, www.defense.gouv.fr/guide-medias-sociaux)

* Rojnamevan, nivîskarê bloga Défense en ligne, blog.mondediplo.net

(1) Gotarên li jêr bixwîne "Mali, la victoire en chantant / *Malî, bi strangotinê serketin*" û "Victime collatérale / *Mexdûrê kolateral*", Défense en ligne, *bi dorê 1ê sibata 2013an û 1ê îlona 2011an*, blog.mondediplo.net

(2) Filma amerîkî a **Ridley Scott** (2001) ê ku îlhama xwe ji destwerdana li Somalîyê ya sala 1993yan digire.

(3) **Jean-Marc Tanguy**, "La com' de Serval devant la mission d'information / *Fermandarîya Servalê li pêşberî wezîfeya agahdarkirinê*", 2yê tîrmeha 2013an, http://lemamouth.blogspot.fr

(4) Rengekî tivingê ê ku di artêşa fransî de hîbekirî ye.

(5) **Hervé Ghesquière**, 547 jours / *547 roj,* Albin Michel, Parîs, 2012.

(6) **Claude Guéant**, wezîrê karê hundir, 17ê kanûna paşîn a 2010an.

(7) 21ê sibata 2010an, Fermandarê giştî yê artêşan general **Jean-Louis Georgelin** mesrefên ku du mehan ji ber vê rehîngirtinê peyda bûn wekî 10 milyon ewro nirxandin, ev mesref li seferberkirina çar sed eskeran û qederê pêncî ajanên Birêveberîya Giştî ya Ewlekarîya Derve (DGSE) çûye. Mesrefên zêde yên operasyona fransî ya li Efxanistanê sala 2008an gihişte 470 milyon ewroyan.

(8) Kevne rojnamevan **Pierre Bayle** bi xwe karên nivîsê yê TTUyê û piştre ragihandina şirketa hewa û fezayî European Aeronautic Defence and Space (EADS) bi rê ve bir.

(9) Yan jî "Fuck the Pool", îşaret kirina bi wênegirên ku tercîh dikin bi awayekî azad derbasî deverên şerî bibin li şûna ku li *combat pools*an siwar bibin ên ku ji alîyê nûçegihanên eskerî ve tên organîzekirin.

(10) La révision générale des politiques publiques / *Revîzyona giştî ya sîyasetên dewletê (RGPP)* sala 2007an dest pê kir bi armanca kêmkirina deynên dewletê û li gorî hin guhertinên piçûk ên ku di nava salan de dan der hat şopandin.

(11) Nîqaşa li ser pîşeyê nûçegihanê şer ku ji alîyê *Libération*ê ve 17ê sibata 2003yan hat organîzekirin. "La guerre d'un seul côté / Şer bi tenê ji alîyekî ve", 18ê sibata 2013an, pierrebayle.typepad.com

(12) Hevdîtina bi endamên komeleya rojnamevanên bergirîyê re, 12yê sibata 2013an.

(13) *Bide ber* "Les impératifs de la communication opérationnelle / *Mecbûrîyetên ragihandina operasyonel*", *Armées d'aujourd'hui,* hejmar 379, Parîs, nîsana 2013an.


(14) **Gilles Klein***, Le Monde,* 6ê îlona 2008an.

(15) *Bide ber* **Michel Klen**, *Les Ravages de la désinformation / Texrîbata dezînformasyonê,* Favre, Lausanne, 2013.

(16) *Bide ber* **Paul û Marie-Catherine Villatous**, La République et son armée face au « péril subversif » : guerre et action psychologiques, 1945-1960 / *Komar û artêşa wê beramberî "tehlûkeya* [dewlet]*xiraker": şer û çalakîya psîkolojîk, 1945-1960,* Les Indes savantes, Parîs, 2005.

(17) *Bide ber* **Pierre Conesa**, La Fabrication de l'ennemi / *Çêkirina dijminî,* Robert Laffont, Parîs, 2001.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê



ÖZGÜR EPÖZDEMIR: **Beriqîn II**, fotograf

# Li Efxanistanê sêrgêjîya sîstema tendirustîyê

PIERRE MICHELETTI *

Kamyona piçûk a japonî ya ku du caran li bilindahîya bendên dora romorka xwe hatîye barkirin, çend sed metre dûr, li stargeha pêşî a li hev hatî çêkirin radiweste. Li vê dawîya biharê, deşta **Gull Butta** a li kevîya ***Kabulê*** ji alîyê bayekî sivik û hemû toz ve tê maliştin, ev ba merivan neçar dike ku rûyên xwe biparêzin. Çawa ku wesaît disekine tevahîya kesên lê siwar xwe diavêjin erdê û jê peya dibin. Hingê em pê dihisin ku di binê romorkê de terş û dewar (heywan) hene. Deh heb golik û çêlek bi dafan ji wesaîtê hatin daxistin bêyî tu alav û amadekarîyê û çawa ku hatin peyakirin jinan ew bi singên hesinî yên saxlem ve girêdan, ku wan di dema peyabûnê de di erdê de çikandibûn.

Di vê navê de zarok bi mirîşk û elokan dilebikin, zilam bi xwe barên duçerxên illeh meriv rasta wan tê yên Phoenix vala dikin, piştîyên giran diavêjin erdê. Esîrên ji gîyê û çîtên darî yên ku wekî zemînê bi kêr dihatin ji bo ku meriv û terş û dewaran ji hev cihê bikin, wê di demeka kurt de bibin beş û alavên konên demî yên ku wê li yên heyî zêde bibin.

Çar malbatên ***jogî*** (1) rêwî ne. Ew ji ***Surobîyê*** tên, parêzgeheka ku berîya demeka kurt ewlekarîya wê spartî artêşa fransî ya di nava koalîsyona navneteweyî de bû. Çar saet rê li ser serê kamyonekê li dûv xwe divîya bihiştana da ku bigihêjin yekê ji wargehên li dora paytexta efxan, ên ku navê ***Kabul Informal Settlements*** (KIS) li wan tê kirin. Komîserîya Bilind a Penaberan a Neteweyên Yekbûyî (UNHCR) pêncîhek ji wan qeyd kirine, nifûseka teqrîben sih û pênc hezar li wan dimîne. Li vî welatê ku sala 2013an bêhtirî çar sed û pêncî hezar kesên ji cih û warên xwe bûyî lê hene (2) û % 75ê xelkê wê di jîyana xwe de herî kêm carekê duçarî koçberîyeka bi darê zorê bûye, em heman fenomen û heman jargonan li dora tevahîya bajarên sereke yên Efxanistanê dibînin: Herat û HISyên wê, Mezarî Şerîf û MISyên wê...

Li ***Kabulê*** ev wargehên neqanûnî dikarin bi dehan kesan bihewînin, wekî li ***Pulî Goazargahê*** û dikarin herweha nêzî pênc hezar kesan jî bihewînin, wekî li ***Çarahî Qamber***. Yên herî kevin sala 2002yan û destpêka operasyonên eskerî yên koalîsyonê pêk hatin; yên herî nû wekî **Gull Butta**, ev çend meh in ku hene. Ji 2008an û pêve pir belav bûn û sala 2011an jî bi carekê zêde bûn. Ew xelkê ku êdî bûne xwecihî û akincî, yên ku diçine bi devereka din ve yan jî malbatên koçer ên ku ji ber zorîya zivistanê yan jî dijwarîya şidet û perîşanîyê tên, dihewînin. Hin jê vegerîyane piştî ku li derveyî welêt bûn penaber – para bêhtir li Pakistanê –; ev kes ji sedî 60ê xelkê li KISyan pêk tînin.

Hem li nav kesên ji cih û warên xwe hatî kirin û hem jî li nav penaberan sedema pêşî ya çûnê şidet e. Xisleteka wan hemûyan a hevpar ew e ku wan tu xêr ji hebûna artêşa navneteweyî û ji milyaran alîkarîya hatî kirin, nedî. Û ew dijîn – hin ji wan ji deh salan û vir ve – di nava şert û mercên xizanî û mehrûmîya herî dijwar de, li starên ji kerpîç û kîlê çêkirî, bê av, lewre rayedarên ku dixwazin tevahîya hêvîya bicihbûneka bi temamî nehêlin, red dikin bîran bikolin. Hatinîya navingî li wargehan serê kes û serê rojê 0.2 ewro ne.

Li wargeha **Gull Butta** bîst û du malbat dimînin. Ew li du komên konan hatine dabeşkirin ku erdekê vala wan ji hev cihê dike. Ha li wê derê kamyon rawestîyaye, ya ku weha xuya bû ku heta bi kêlîya dawî jî dudilî bû di navbera herdu alîyên wargehê de. Kesên hatine serdanê nêzîk dibin: bişirîn, hevhembêzkirin, gihiştina hev. Wê ne zêde paşê alîkarîya yên nû hatî bikin da ku firaxên wan ber bi koma yekem a konan ve bibin.

Li alîyê din a erda rast, **Herwaz Ron** ê ku wekî yek ji kesên li wargehê kevin, me qebûl dike. Li wir, di nava pênc konan de bîst kesek dimînin. Ev ***Kûçî*** ango koçer in, berîya bi çend hefteyan ji ***Celalabadê*** hatine. Bavê malê weha rave dike: "*Germa havînê û perîşanîyê kirin ku em ji wê devera li ser sînorê bi Pakistanê re ya li ser rêya Peşawerê veqetin. Em hêvî dikin ku li paytextê wê ji me re hêsantir be ku em karên piçûk, emeletîyê, xwarinê û avê peyda bikin.*" Ji bo behsa koma xwe bike ew peyva *Şêx Mohamedî* ("eşîreka koçer" a çerçî û kar û pîşeyên din ên piçûk dike) bi kar tîne: ev hîleyek e ku *Kûçî* pirî caran xwe diavêjine bextê wê ji bo ku pêşîyê lê bigirin, ji ber ku navê wan bi nebaşî wekî diz, parsek û qehpik derketîye. Dema behsa şert û mercên jîyana xwe dike, ev zilam gazinan dike ji ber ku ji alîkarîya pir kêm a hikûmetê a ku ji KISya wan re tê ew ti parê nastîne û wargeha hember – ***jogî*** – nahêlin ku xêra wê alîkarîyê bigihêje wan jî.


Di nava mozaîka tevlîhev a eşîrên efxanî de cihê *Kûçî*yan guhertî ye. Jîyana wan ji bêserûberî, xizanî û sirgûnê pêk tê. Vê rewşê kir ku hikûmet pêşnîyaz bike ku di hilbijartinên bê de - ji bo dawîya 2014an pêş tên dîtin – deh kursî li parlamentoyê ji wan re werin veqetandin. Di vê navê de, hem li vir û hem jî li wargehên din rêxistinên nehikûmetî (NGO) yên mîna *Solidarités International* ("Piştgirîya Navneteweyî"), li Gull Battuyê, xwarina heyatî, av û xizmetên tendirustîyê digihînin wan.

Defterên qeydîyê yên dîspanser û klînîkên seyar bi nexweşîyên xizanîyê tijî ne, yên ku tesîra wan zêde dibe ji ber ku cih jî ne li gorî tendirustîyê ne. Di nava yên herî belav de înfeksîyonên qirik, guh, bêvil û ciger, havînan her awayê zikçûyînê hene ku sedema rêjeyeka bilind a mirina pitikan in. Zilamên ku li ***Kabulê*** bi qasî ku dikarin karên zehmet dikin rojê ji bo 2 ewroyan dixebitin, gelek caran dibin mexdûrê nexweşîyên hestî û movikan. Piçûk û mezin hemû bi înfeksîyonên çermî dikevin, mexdûr in ji ber kêmasîya mîneral û vîtamînan û parazît dikevin canê wan, nepaqijîya kesên me dîtî dihêle em vê texmînê bikin. Nîvê jinan berîya 15 salîya xwe zewicîne. Di nava wan de yên ku zarokekê şîr didin, ji pêncan yek yan bi navingî mexdûrê kêmxwarinê ye, yan jî bi awayekî cidî. (3) Hejmara zarokên dijîn serê malê digihêje şeşan.

Her çendî NGO û Wezareta Tendirustîyê hewl bidin xizmeteka sînordar ava bikin jî, lê sîstema tendirustîyê lawaz e: derzîyên (aşî) li dijî nexweşîyan, têkoşîna li dijî mirina di dema zarokanînê de, li dijî malaryayê, li dijî HIV-aidsê Ji bo ku bi awayekî bitesîr meriv xwe bide ber barê tendirustîya jinan li welatekî ku ew bi tenê dikarin ji alîyên kesên bi heman cinsîyetê ve werin dermankirin yan jî qet neçûne muayeneyekê heke mêrekî ji malê bi wan re nebe, perwerdekirina nifşekî sax ê pîşekaran – memûrên tendirustîyê yên xwecihî, hemşîre, doktor, pîrik – berîya hertiştî pêwist e. Lê belê gelek astengî hene: rêjeya kêm a çûna dibistanê û xwendeyan, liberrabûneka xurt a



ÖZGÜR EPÖZDEMIR: **Lazer I**, rêzewêneyên bi ronahîyê hatine boyaxkirin



ÖZGÜR EPÖZDEMIR: **Lazer III**, rêzewêneyên bi ronahîyê hatine boyaxkirin

## Bi hejmaran

- Hêvîya temenê merivî ya navînî ji jidayikbûnê û pêve: ji 48an heta 60î, hejmar li gorî çavkanîyan diguhere.

- Rêjeya mirina zarokên temenê wan ji 5 salan piçûktir (sala 2011an): serê 1000î 149, ev rekoreka dinyayê ye.

- Rêjeya kêmxwarinê ya kronîk di nav zarokên temenê wan ji 5 salan piçûktir de: bêhtirî % 50. Rêjeya kêmxwarina cidî a ku sala 2008an % 4.7 bû, sala 2011an bû % 17.6.

- % 30ê zarokan bi tevahî bi dermanên pêşîlêgir hatine derzîkirin.

- Rêjeya mirinê ya zarokanînê: ji 327 an heta 460 (li gorî texmînê diguhere) mirinan ji bo 100 000 jidayikbûnên zindî sala 2011an; sala 2005an serê 100 000 jidayikbûnan 710 mirin hatin tesbîtkirin.

- % 60ê xelkê gundan bêhtirî saetekê rêya bi wesaîtan dûrî tevahîya sazûmanîyên tendirustîyê dijî.

- Hejmara afyonkêşan qederê milyonekê ye û ji van 150 hezar bi derzîyan eroînê li xwe didin.

Çavkanîya sereke: Prisca Benelli, Antonio Donini û Norah Niland, "Afghanistan: humanitarianism in uncertain times / Efxanistan: alîkarîya insanî di demên neewle de", Feinstein International Center, Somerville (Massachusetts), çirîya paşîn a 2012an.

malbatan li ber dûrçûna zarokan ji bo perwerdeyê...

Dema ku meriv vê astengê li pey xwe dihêle yeke nû ya meriv ne li bendê dide der, bi pêdivîya birêvebirina ***marham***an ango refaqetvanên mêr ên ku malbatê ew wezîfedar kirine; ev bira, zava yan jî pismam in ku di dema perwerdeya jinan de yan jî li cihên ku jin wezîfedarkirî ne, divê bi jinan re biçin her deverî. Ango divê xanî ji wan re jî were peydakirin û ew jî werin xwedîkirin û ji bo ku destûra jinekê hebe erkekê bigire ser milê xwe, divê hebûna ***marham***ekî yan jî peydakirina karekî ji bo wî pêş were dîtin. Ji ber vê sîstema tendirustîyê ji ber lojîstîkeka ku lê dibe bar hatîye girankirin û dibe sedema bihayên zêde yên ku kapasîteyên wê yên malî yên siberojê îpotek dikin.

Li herêmên din ên nêzî sînorê deverên eşîrî yên Pakistanê, nexweşîyên vegir ên wekî polîyomîyelîtê ji nû ve bi qasî fikaran bi merivan re çêkin, ji ber nebûna derzîyên pêşîlêgir, sala 2012an zêde bûn – encameka kes li bendê nebû. Lê mirina **Usama bin Ladin**! Doktorekî efxanî weha rave dike: "*Talîbanên pakistanî wê gotegotê li van deveran belav dikin ku derzîkerên derzîyên pêşîlêgir girêdayî Abotabadê ne, elaqeya wan heye bi tesbîtkirina cihê lîderê El-Qaîdeyê re*". Vê yekê herweha kir ku berîya bi gelek mehan derzîkerên UNICEFê li Pakistanê bên kuştin. (4) Doktor van gotinên li jêr li peyvên xwe zêde dike: "*tevî civînên me yên bi civatên gundî re û xebata meleyan ji bo bêtesîrkirina rewşê jî pirsgirêk li herêmên rojhilat hîna jî nehatîye çareserkirin.*"

Belayeka din jî heye: serfkarîya afyonê, ku Efxanistan li dinyayê hilberînerê wê yê sereke ye. Îro qederê milyonek afyonkêş hene ku ji wan sed û pêncî hezar bi derzîyê eroînê enjekteyî laşê xwe dikin, bi pratîkên xirab û di şert û mercên paqijîyê yên pir xirab de. Dema ku Sovyetî sala 1989an vekişîyan hilberîna afyonê gihişte salê hezar û du sed tonî; sala 2009an ev hejmar gihişte şeş hezar û neh sed tonî. Bi vekişîna eskerên koalîsyonê re hilberîn ji nû ve zêde bû: + % 7 bi tenê sala 2011an (5). Lêkolîneka dawîya sala 2012an a ***Ofîsa Neteweyên Yekbûyî ya li dijî Narkotîk û Gunehkarîyê*** (UNODC) li pênc sed û çil û şeş gundan birêveberîyê derxist holê ku erdê hatî çandin % 30 zêde bûye. (6) Hatinîya ku ji vê çandinîyê tê bidestxistin halê hazir qederê % 60ê Hilberîna Hundir a Nesafî (HHN) ya Efxanistanê pêk tîne.

Li civîna bilind a Tokyoyê ya tîrmeha 2012an – civîna pêşî sala 2002yan pêk hatibû ji bo ku hîmên "ji nû ve avakirina" welêt piştî têkbirina ***talîbanan*** werin danîn – welatên alîkarîyê bidin û rêxistinên navteweyî bi hikûmeta efxan re li ser alîkarîya wê bidin hikûmetê nîqaş dikirin. Li welatekî ku HHNya wê wekî 17.24 milyar dolar tê texmînkirin (2010), lêkolîneka nû ya Bankeya Dinyayê (7) binxêz dike ku hatinîyên neteweyî wê bi salan têrê nekin ku di bin barê mesrefên dewletê de rabe. Heke em bawerîyê bi agahîyên vê rêxistinê bînin sala 2025an rêjeya lihevderneketina budceya dewletê wê % 21 be û sala 2014an jî wê bigihêje asta xwe ya herî bilind û ew jî % 39 e.

Ji bo xelkê xizan – ji sih milyon serjimara welêt qederê panzdeh milyonan – siberoja sîstema tendirustîyê wê ji sala 2014an û pêve, lê belê ji wê jî bêhtir ji sala 2017an pêve xwe bisipêre bitesîrbûn û jêhatîbûna Wezareta Tendirustîyê û ya Ajansa Alîkarîyê ya Dewletên Yekbûyî (USAID) û wekî îro wê xwe nesipêre NGOyan, lê belê yekser dewletê, bi herhalî bêyî ku kesên ku alîkarîyê didin bi rastî jî xwedî wan derfet û navgînên kontrolê bin.

Li cihekî dorgirtî yê hîperewlekirî yê baxçeyan, cihekî civanan ji bo civata alîkarîya insanî ya ji derveyî welêt, min kordînatora rêxistineka navneteweyî dît û ew fikarên xwe parve dike: "*Du tehlûke hene: ya malî heye, ango kêmbûneka bi carekê û bi lez a çavkanîyan ji ber bertîlxwarina pir zêde ya li nav birêveberîya efxanî de; ya din jî ya sîyasî ye, ango ew strukturên êdî bi awayekî fermî wekî 'hikûmetî' werin terîfkirin wê bibin hedefa êrişên komên çekdarî yên mixalefetê.*"

Karmendekî efxanî ê ku referentekî tibî yê NGOyeka navneteweyî ye, rewşa li çar wîlayetên – Kabûl, Kapîsa, Perwan û Pencşîr – ku ji niha ve di bin birêveberîya bi tenê ya Wezareta Tendiryusitîyê de ne, analîz dike, vê texmînê dike: "*Encamên vê birêveberîya yekser dikin ku herkes pir gumanber be der barê giştîkirineka sîstemê de. Strukturên dûrkirî yên tewereyên sereke yên rêyan, hesabê wan nayê kirin; pere tên dizîn; ji bo xizmetên divê belaş bin ji nexweşan **bexşîş** tê xwestin; kesên bi erka xizmeta tendirustîyê rabin pir zêde li cihê erka xwe, ne amade ne, dabînkirina alav û dermanan jî pir caran qut dibe; hîyerarşî erka xwe ya kontrolê pêk naîne... Wekî din hin doktor ji bilî karê li nexweşxaneyê di heman demê de li klînîk yan jî kabîneyên taybet jî dixebitin, sedema vê jî mûçeyê wan e: mehê di navbera 200 û 500 dolarî de.*" Berpirsîyarekî NGOyeka din a navneteweyî li van gotinan zêde dike: "*ji bo me ev şerekî herroj e.*"

Li civîna bilind a Tokyoyê biryar hat dayîn ku 16 milyar dolar alîkarî were dayîn heta sala 2017an; Fransaya ku ji 2008an ve 2 milyar ewro alîkarîya sivîl û eskerî daye, 230 milyon ewroyan wê bide.(8) Fînansmana sîstema tendirustîyê jî di nava vê çarçoveyê de ye. Bi herhalî li gorî berpirsîyarekî NGOyeka tibî "*hertişt wê girêdayî be bi awayê ku Wezareta Tendirustîyê wê erka çareskirina kêmasîyên halê hazir di xebitîna wê de hene bigre ser milên xwe û herweha girêdayî be bi kapasîteya NGOyan a xebitîna li kevîyan – wekî îro li KISyan – û a îşaret bi kêmasîyan kirina li her devera erdê Efxanistanê. Pirsa dimîne ew e, ka gelo şert û mercên ewlekarîyê wê destûrê bidin me em li cihê cih bimînin û çalak bin...*".

Helwesta ***talîbanan*** beramberî NGOyên navneteweyî her ne misoger e. Rast e ku hinek ji wan bûn xwedîyê helwesteka ku NGO bi awayekî zelal wekî temamkerên bi rastî yên hêzên çekdarî yên bîyanî dîtin. (9) Ev NGO dikarin heta ku nikaribin kar bikin werin astengkirin yan jî konên xwe bar bikin, van mehên li pêşîya me, hin ji wan jî di nava pêlên şêwirmendên wan ên koalîsyona navneteweyî de welêt biterikînin.

* Doktor, hevberpirsîyarê mastira "Rêxistinên Navneteweyî" li Enstîtuya Lêkolînên Sîyasî li Grenobleê, nivîsandina berhema *Afghanistan. Gagner les cœurs et les esprits / Efxanistan. Bidestxistina dil û mejîyan*, Presses universitaires de Grenoble - Radio France Internationale (RFI), 2010.

(1) Hindikahîyeka etnîk a bi eslê xwe ji Tacîkistanê û hejmara ferdên wê qederê sed hezarî ye.
(2) "Profil d'opérations 2013 – Afghanistan / Profîla operasyonan 2013 - Efxanistan", UNHCR, www.unhcr.fr

(3) Li ser rewşa xwarinê û siheta derûnî li KISyan *bide ber* **Giovanna Winckler-Roncoroni**, "Survey of mental health and child care practices in the KIS, Afghanistan / *Lêkolîna siheta derûnî û pratîkên guhdana zarokan li KISyan, Efxanistan",* Action contre la faim, Parîs, gulana 2012an.

(4) **Frédéric Bobin**, "Au Pakistan, la lutte antipolio est la cible des talibans / *Li Pakistanê şerê li dijî antîpolîyo hedefa talîbanan e*", *Le Monde,* 19ê kanûna pêşîn a 2012an.

(5) "Afghanistan - Annual Opium Poppy Survey, 2011 / *Efxanistan – Rapora salane ya Afyon û Kenewîrê*", *Ofîsa Neteweyên Yekbûyî li dijî Narkotîk û Gunehkarîyê* (UNODC), Vîyana, www.unodc.org

(6) "Afghanistan - Opium risk assessment 2013 / *Efxanistan – Nirxandina tehlûkeya Afyonê*", UNODC.

(7) "Afghanistan, from transition to transformation / *Efxanistan, ji dema derbasbûnê heta bi veguherînê*", Bankeya Dinyayê, Washington, DC, 1ê tîrmeha 2012an.

(8) **Jacques Follorou,** "L'Afghanistan a coûté à la France 2 milliards d'euros depuis 2008 / *2 milyar ewroyên Fransayê ji 2008an ve li Efxanistanê çûn*", *Le Monde,* 28ê kanûna paşîn a 2012an.
(9) Gotara li jêr bixwîne: "Les humanitaires victimes des logiques d'Etat / *Alîkarên insanî mexdûrên mentiqê dewletê [ne]*", *Le Monde diplomatique,* hezîrana 2007an.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

# Li Malezyayê hikûmet û civat ber bi hevberdanê ve diçin

CHARLES DANNAUD *

*“Dîlemaya ji bo çînîyan ew e ka ew dê destê xwe biavêjin hêza sîyasî tevî ku ew jixwe xwedîyê hêza aborî ne, yan jî ew dê xwe li prensîpa parvekirinê bigirin, ya ku ji vî welatî tiştê ku îro heye çêkir.”* Axaftina Mahathir Mohamad (1) ê di navbera 1981 û 2003yan de serokwezîrê Malezyayê tîpîk e ji bo wan fikrên giştî yên birêveberên vî welatê Asyaya başûrrojhilat ji mêj ve par ve dikin, lewre li gorî statîstîkên etnîk ên di merîyetê de li vî welatî hejmara çînîyan ji çar paran pareka xelkê welêt pêk tîne

Ev kevne-zilamê xurt ê Rêxistina Neteweyî ya Malezîyên Yekbûyî (UMNO) yê ku behsa peymana civatî ya zimnî ya serxwebûnê (hêza sîyasî ji malezîyan re û aborî ji çînîyan re) dike, xwedîyê vê vîzyona civata duqutbî ye ku bûyerên xwînrij ên sala 1969an rê li ber vekir, jixwe encamên van bûyeran hîn jî bandoreka dîyarker li welêt dikin. Wê salê xwepêşandanên kêfxweşîyê yên çînîyên ku encamên baş ên hilbijartinan ên partîyeka mixalefetê pîroz dikirin ji rê derketin û veguherîn du mehên şerê bi malezîyan re û di encamê de jî li gorî daneyên fermî sed û nod û şeş kes mirin.

Hingê hikûmetê şidet rewa nîşan dabû bi hisên malezîyan li hemberî çînîyên ku bi desteserkirina dewlemendîyên welêt dihatin gunehbarkirin. Ya rastî, birêkûpêkîya bûrjûwazîyên – malezî, çînî û hindistanî – desthilatdar tedbîrên li dijî xizanîya pir dijwar a civatê negirtin, ew civata ku yek ji wanên herî newekhev e li Asyayê û lê şerê li dijî gerîlayên komunîst kir ku tevahîya dozên civatî gumanbar xuya bikin. Bersiva hikûmetî pêkanîna sîyaseta nû ya aborî (NEP) bû ku li qanûnê jihevcihêkirina Bumiputras (“kurên erdê” ango malezî û xelkên otokton) û yên din zêde kir. Yên pêşî ji îmtîyaza ji nû ve dabeşkirina dewlemendîyan sûd wergirtin.

Teorîya malezîyê xizan û çînîyê dewlemend bi tenê sêwirandineka sîyasî bû. Aborîzana jin Elsa Mafaye de Micheaux (2) di vê navê de nîşan dide ku xizanîya pir zêde ya nisbî ya malezîyan berîya hertiştî ji ber dualîzma di navbera karên ji bo debarê û karên ji bo hilberîna nirx, ji ber jihevbûyîna etnîk a kar û gihiştineka cihêkirî ya xizmeta perwerdeyê ye. Di rastîyê de newekhevîyên çînan di nava her civatê de pir dijwar in û “*meriv hema welê xwe li nezanîna wê rastîyê datînin ku % 98ê çînîyan karker yan jî cotkarên piçûk* [hingî wisa bûn] *bûn*”.

Dema hilbijartinên parlemanê yên 5ê gulana 2013an Mahathir kampanyaya xwe li ser heman xetê meşand, wî tirsa malezîyan a berdana hikimranîyê bi dest hindikahîya çînî de bi kar anî. Stratejîyeka serketî. UMNO û koalîsyona wê Barisan Nasional (“Bereya Neteweyî”) ya ku pêkhênerekî çînî ango Malaysian Chinese Association (MCA) û yekî hindistanî ango Malaysian Indian Congress (MIC) dihewîne vegerîya, lê belê bi encama herî xirab a dîroka xwe. Wan ji mixalefeta ku di nava koalîsyona Pakatan Rayat (Hevpeymana Miletî) de ye hindiktir deng bi dest xistin. (3) Û li gorî profesora alîkar a sîyasetzanîyê li zanîngeha Managementê ya Sîngapûrê, Bridget Welsh, dengdana ku qirêja gelek nebirêkûpêkîyan li ser, di “*şert û mercên newekhev, transferên ravenekirî ya hilbijêran, girêdanên çapemenîya serdest û bi awayekî xurt bikaranîna zêde ya çavkanîyên dewletê ji bo kanpanyaya hilbijartinan û kirîna dengan*” de pêk hat.

Li hemberî vê serketina bi hemanekê, serokwezîrê heyî Najib Razak ê ku wekî nerm tê dîtin, axaftineka rasîst kir ya ku pê wî hilbijêrên çînî yên ku bi awayekî girseyî ji MCAya ku wekî bûyî parçeyekî UMNO tê dîtin, qetîyan berpirsîyar dît ji pêknehatina hêvîya Barisan Nasioanalê. Serokwezîrî dema behsa “*tsunamîya çînî*” kir rastîya dengdaneka ku têde beşekê ji malezîyan bi xwe jî berê xwe dan mixalefetê, mandel kir. Ev reaksîyona birêveberên UMNOyê baş nîşan dide zahmetîya wan a mikurhatina li wê yekê ku qelşa di navbera etnîsîteyan de şûna xwe ji qelşeka civatî û cografî re dihêle.

Najib ê ku hem xweş û hem reş dibêje, wekî din pêşengê bernameya “Malezyayê” ye ku armanca wê palpiştîya “*ahengê*” ye di navbera miletên welêt de ji hingê ve banga “*jinûve lihevxweşkirinê*” dike. Ji bo sîyasetzanê li zanîngeha fenê ya Malezyayê Ahmad Fauzi pir qîmetê vê birêveçûnê nîne: “*ev taktîkeka kevn e, Barisan Nasional pêşî fitnê dike, piştre behsa lihevkirinê dike û xwe wekî pasîfkerekê nîşan dide.*” Lê belê mesele ew e ku ev dolab wekî berê baş nagere û bi kêr nayê, nexasim jî li deverên bajarvanîyê, li wan deverên ku xelkê wan li gorî lêkolînerên malezî “*di bin bandora dezgehên çapemenîyê yên alternatîf, malperên nûçeyan û blogan de behtir mane û ne di bin bandora dezgehên çapemenîyê yên ji rêûresmê de yên ku hikûmet wan kontrol dike.*” Li welatekî ku % 56ê xelkê wê ciwantir e ji 30 salan, stratejîya UMNOyê dîyar e ne di cih de bû. Barisan Nasional bi partîyên civatên cihê re koalîsyonê pêk tîne û Welsh van tiştên li jêr dibîne: “*nifşê ciwan xwe wekî malezyayî dibîne* [li şûna malezî, çînî, hindistanî...] *û di vî nifşî de nîşanên nijadperestîyê li gorî nifşên berîya wê kêmtir in*”. Wekî din Barisan Nasional li hemberî ciwanan dibe xwedî helwêsteka bavane ango bi tenê pê razî dibe ku dîyarîyan bide wan, civînan bi starên televizyonê û sînemayê re li dar dixe. Dema vê dikin, birêveberên Barisan Nasional bi kûrahîya reda sîyaseta berê ya ku otorîtarîzma Mahathir sembola wê ye, nahisin.

Van ciwanan mezinbûna harîqulade ya aborîya welêt a salên 1980yî nedît û xwe deyndarê partîya kevin a neteweperest jî nabînin. Fauzi weha dibêje: “*Ev nakokîya UMNO ye. Wê geşedana aborî ya welêt bi rê ve bir û destûr da azadbûneka malezyayîyan, ew jî niha dengê xwe li dijî wê bi kar tînin.*” Li gorî Lafaye de Micheaux “*qutîya pandorayê bi krîza asyewî* [sala 1997an] *vebûbû. Malezyayîyan civateka otorîter qebûl kiribûn lewre mezinbûna aborî bi kêra her kesî dihat; lê belê hingê ew pê hisîyan ku ew berdêleka pir mezin didin bi azadîyan, lewre ew jî êdî nebûn*”.

Îro ev Pilingê Asyewî xwedîyê nîşanên baş ên makroekonomîk e: zêdebûneka Hilberîna Hundir a Nesafî (HHN) ya % 5.6, înflasyoneka sala 2012an li % 1.7ê sekinandî (4) û rêjeyeka bêkarîyê ya ku nîsana 2013an li gorî daneyên fermî % 3.3 bû. Li ser xeta yên berîya xwe Najib îlona 2010an bernameya xwe ya veguherîna aborî (ETP) eşkere kir û pêre îdîa kir ku Malezya wê sala 2020î bikeve nav refên welatên ku dahata wan gelek e. Ev plana xwe bi budceyeka 300 milyar ewroyî bigurçûpêçkirî, diçe û tê di navbera destwerdana dewletê bi destê şirketên girêdayî dewletê (nexasim jî di sektora enerjîyê de) û di navê de miteşebisên bîyanî jî teşwîqkirina înîsîyatîfa taybet de. Borsaya malezyayî veguherî cihekî malî yê qebûlbûyî û ne bi tenê di nav fînansa îslamî de. Wekî din bazaran ragihandina jinûvehilbijartina serokwezîr bi kêfxweşî pêşwazî kir.

## Mîrateyeka ji kolonîzatorên brîtanî mayî

Serjimara li Malezyaya ku erdên wê di navbera nîvgirava malezî û bakurê girava ***Bornêo*** de parvekirî nêzî sih milyonan e. Gelek pêlên koçberîyê ber bi welêt pêk hatine: çînî ji başûrê Çînê ji destpêka sedsala 19an û vir ve, hindî – nexasim jî tamîlî – ji dawîya sedsala 19an ve. Koçber û paşîyên wan hemû bûn welatîyên Malezyayê dema ku welat serbixwe bû. Di nasnameya her malezyayîyekî/ê de dinivîse ka ew ji kîjan “nijad”ê ye û bawerîya wî/wê ya dînî çi ye *(binêre li “agahîyên sereke”)*.

Çawa ku aborîzan **Elsa Lafaye de Micheaux** rave dike, mesele “*kategorîyên demî yên ku bi piranî lihevçêkirî*” ne, ango bîyanîyên cîhana malezyayî. Ji ber sedemên bikêrbûna birêveberîyê, kolonîzatorên brîtanî xelkê welêt li gorî teorîya nijadî ya dawîya sedsala 19an sinifandin. Girîngîya ku di organîzasyona kolonyal de bi pîvanên etnîk dihat dayîn di nava civaka malezyayî de cihê xwe hişk girtîye. Ew xwe li ser ferz dike tevî ku pir hêsan e meriv wê bi awayekî entelektuel ji hev de bixe.

C. D.

## Agahîyên sereke

**Serxwebûn: 31ê tebaxa 1957an. Sala 1965an, Sîngapûra % 76.8ê xelkê wê çînî ji federasyonê qetîya û serbixwe bû.**

**Serjimar: 29 241 000 kes (çavkanî: Rêxistina Neteweyên Yekbûyî, UNO)**

**Rejîma sîyasî: monarşîya destûrî, tevî meclîs û senatoyekê.**

**Ziman: malezyayî.**

**Mezinê dewletê (melik): Abdul Helîm Mu’adzam Şah (ji 2011an û vir ve), ji nava neh siltanan ji bo pênc salan hat hilbijartin.**

**Serokwezîr: Nacib Rezaq (ji 2009an ve).**

**Rêjeya xwendeyan: % 93.1 (di nava kesên ji 15 salî û mezintir de).**

**Nîşana bipêşketina insanî: 0.769, 64em e di nava rêza dewletên dinyayê de (çavkanî: Bernameya Neteweyên Yekbûyî ji bo Bipêşketinê, UNDP).**

**Pêkhatina “etnîk”: % 60 malezyayî, % 25 çînî, % 10 hindî.**

**Xelkê “xwecihî”: % 5.**

**Dîn: Îslam dînê dewletê ye, lê belê azadîya bawerîyê misoger e (%75.9ê civata çînî û bûdîst).**

Di warê civatî de Najib îdîa dike ku dixwaze bazara hundir bipêş bixe da ku hem girêdana welêt bi îxracatê kêm bike û hem jî ji niha heta bi sala 2020î dahata xelkê welêt zêde bike. Wî sala 2012an mûçeyê herî kêm dîyar kir (qederê mehê 200 ewro), ev mûçe kêm e dema ku meriv bihayê jîyanê li bajêr li ber çavan bigire. Heke meriv bi encamên hilbijartinan ETPyê binirxîne, hingê meriv dikare bibêje tevî mezinahîya wê ya ragihandî jî ew kêm dike ku meriv bawerîyê pê bînin: malezyayî mijûl in bi asêman û wekxwemana hêza xwe ya kirînê û doza başkirineka xizmetên dewletê, binesazîyan û perwerdeya bilind dikin. Lê belê rexneyên wan bêhtir li ser cihêkarîya pozîtîf a bi kêra malezîyan tê ye ku bingehê NEPya sala 1969an pêk tîne, tevî ku ev sîyaset bi kêmbûna newekhevîya di navbera etnîsîteyan de û di nava her civatê de xwe dide der.

Ev sîyaseta ji nû ve dabeşker a etnîk bi awayekî lawaz hîna jî di merîyetê de ye. Lafaye de Micheaux weha dihizire ku "*ew gihişte dawîya mentiqê xwe.* Di warê sîyasî de tercîha pîvana etnîk parçebûna civatê xurt kir, lewre wê endamên civatên hindikayîyên çînî û hindistanî kirin welatîyên rêza duyem: ji bo wan zehmettir e ku bibin memûrê dewletê, biçin zanîngehê, bibin xwedî milk û beşdarî şirketên mezin ên dewletê bibin ku bi NEPyê re hatin damezrandin. Wekî din sîstema patrontîyê bertîlxwarina ji bo kontrola bazarên dewletê yan jî kara wekî mînak ji sûdwergirtina ji madeyên xav yan jî deverên turîstîk zêdetir kir.

Pêla taybetkirinê ya sala 1986an destpêkirî xizimparêzî derxist pêş. Û li gorî Lafaye de Micheaux "*% 20 herî dewlemend xwedîyê bêhtirî nîvê dewlemendîyên welêt in*". Olîgarşîyeka ji nêz ve girêdayî UMNOyê bi ser dikeve, tevahîya avantajên sîyasetekê li cem xwe dicivînin, ew sîyaseta ku sûdwergirên wê êdî ne malezî û ne jî xelkên xwecihî yên Borneoyê ne ya ku dewlemendîyên wê yên binê erdê di asta herî jor de tên mêhtin.

Mixalefeta sîyasî ya koalîsyona Pakatan Rakyat kampanyaya xwe li ser daxwaza şefafîyê meşand. Lê belê serketina wê ya hilbijartinê bêhtir xwe disipêre palpiştîya wê ya modeleka civatê ya alternatîf. Tevgera ku ji partîyên ji qelşên civatî bihurîne pêk tê û pêş nîyaz dike ku pîvana sîyaseta ji nû ve dabeşkirinê êdî ne etnîk lê belê civatî be; bi vê yekê jî li gorî analîza Lafaye de Micheaux "*ji wê hat ku nûnerîyên tîpa welatîyan û êdî ne civatî biafirîne*". Herçî meseleya nasnameyê ye birêveberê Pakatan Rakyat Anwar Ibrahim wekî "*pîrika nasnameya pirçandî ya Malezyayê* [anî dinê]*"* tê dîtin. Anwar demeka dirêj wekî mîrasgirê Mahathir dihat dîtin, ew berîya ku sala 1998an bikeve ber xezeba wî de wezîrê wî yê malîyê bû; Anwar kete girtîgehê bi îdîaya bertîlxwarinê û beraet kir ji gunehbarîya "qulamparatîyê" ya ku armanca wê ew bû ku pêşîyê lê bigire ew bibe namzet di hilbijartinan de.

Du hêmanên pêre dayî der rêya tekamilbûnê vekirin. Li alîyekî bipêşketina înîsîyatîfên ji civatê peyda bûyî yên ku îlhama xwe ji "bihara ereban" girtî û banga guhertineka sîyasî dikin. Du xwepêşandanên ji bo reforma sîstema hilbijartinê yên ku tevgera Bersihê ew organîze kirin. Li alîyê din pirbûna amûrên agahdarî û ragihandinê yên alternatîf ên mîna tevnên civatî yên ku li welatekî ku behtirî ji her du kesan yek xwedîyê hesabekî Facebookê ye, cihê gihiştina hev a van înîsîyatîfan e. Qonaxeka nû ya angajmana sîyasî li paş hat hiştin bi dengdana 5ê gulanê û bi seferberîya mixalefetê ya ku li ber encamên hilbijartinan rabû. Bi deh hezaran kesî li seranserê Malezyayê li stadan xwepêşandanên protestoyî li dar xistin bêyî şidetê, wan doza îstîfakirina desteya hilbijartinan kir. Hikûmeta Najib bersiva xwe da bi destpêkirina lêpirsînan li dijî parlemanter, xwendekar, blogvan û endamên mixalefetê. Welsh îdîa dike ku "*civata sivîl mezin bû û angajmana welatîyan êdî ji ber ku tirs nema wê hîna mezintir bibe*".

Herçend hejmareka zêde ya liberrabûnên bi awayekî fermî hatî erzkirin hene jî kêm mihtemel e ku komisyona hilbijartinan a ku girêdayî buroya serokwezîr e, ji nû ve li encaman vegere. Fauzi weha dihizire ku "*guhertin wê pêkwere, hema ku sedemên demografîk bi tenê jî mabin, pêşî li wê nikare were girtin. Jidestdana desthilatdarîyê wê ji bo UMNOyê ne xirab be, lewre bi vî rengî ew dê karibe bi awayekî bikêr xwe xelas bike ji hêmanên bertîlxwur û bi nasnameyeka nû vegere, wekî mînaka partîyên kevin ên neteweperest ango Partîya Kongreyê li Hindistanê yan jî Goumindang li Taywanê*".

Asoyê 2020î yê ku Mahathir ji bo Malezya bikeve nav welatên bipêşketî wekî mohlet dîyarkirî dikare bi rêk û pêk wekî bi jidayikbûna neteweyeka demokratîk a jê tê li nasnameya xwe bifikire û bîrewerê dewlemendîya pirçandîbûna xwe be.

* Rojnamevan.


(1) "Chinese better off after Merdeka / Piştî Merdeka rewşa çînîyan baştir e", *New Straits Times,* Kuala Lumpur, 27ê tîrmeha 2013an.

(2) Elsa Lafaye de Micheaux, *La Malaisie, un modèle de développement souverain? / Malezya, modeleka bipêşketina* [xwe disipêre] *dewletê,* Editions de l'ENS, Lyon, 2012.

(3) Barisan Nasionalê % 47.4ê dengan stend lê belê % 59.9ê kursîyên li parlemanê, li hemberî vê koalîsyona mixalefetê Pakatan Rakyatê % 50.9ê dengan û % 40.1ê kursîyên parlemanê bi dest xistin.

(4) "World Development Indicators / Nîşanên Bipêşketinê yên Dinyayê", Bankeya Dinyayê, Washington, DC, 2013.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê




ÖZGÜR EPÖZDEMIR: **Sedemî.. Hûn ji yên me wendakirî ne…**

# Ji nû ve nivîsandina Cezayira duh û îro

Ali Chibani

Ev *“vegerên li Cezayirê”* (1), pêşî vegera nivîskar bi xwe ye: **Akram Belkaïd**, hevkarê *Le Monde diplomatique*yê, welatê xwe salên 1990î terikand ji ber tehlûkeyên li dijî rojnamevanan û heta sala 2009an venegerîya welatê xwe. Piştre jî ya behsa wê tê kirin vegera qederê sed kesî ye, piranîya wan xwendevanên kovara heftane *La Vie* ne, yên ku berîya serxwebûnê li Cezayirê dijîyan û sala 2012an nivîskar bi wan re bû dema ku ew vegerîyan dever û warên zaroktîya xwe.

Dema ku ew mîrateya giran û bi tehlûke ya şerê navxweyî ya salên 1990î û pêre jî birêveberîya felaketwarî ya serokdewlet **Abdelezîz Bûteflîka** tesbît dike, weha kirina xwe rave dike: *“Ev lêgerîneka li maneyê ye, daxwaza fêmkirina min bi xwe û danbihîstina pirsên kesên din.”* Gelek caran bi hêrseka rabûyî carinan bi êş û azarê, ew Cezayirê weha terîf dike: “*komeka giravên mişextkirina navxweyî*” ya ku lê bertîlxwarin, bêkarî, qirêja hawîrdorê serdest e û ya ku lê ciwan ji rastîya zor û giran a rastîyê bi xêra “Madame Courage” “*kokteyleka narkotîkên dikin meriv şad bibe û xeyalan bibîne*” direvin.

“*Li alîyekî modernîte – qet nebe ji derve – li alîyê din fikrên sabît ên girêdayî form û adetan, êdî meriv li wan kêmtir nefikire jî. Erê ji rêya dirêj re, erê ji cilûbergên soberîyê yên bi xeml re, lê belê bi şertê ku ev hemû li bin guhê hev nekevin.*” Welatekî ku ji xwe re li hev tîne ku bi van şertan karibe bijî. Erdê “*xavbûn û naziktîya tevlîhev*” e ji bo *pieds-noirs*an [navê li fransîyên Cezayirê dihat kirin; têbînîya wergêr], cihê ku “*hembez lê pir bilez vedibin, vexwendinên ku bi israr tên kirin. Merdîtî. Di koma me de Alain ango “fîlozof” ji ber vê pêşwazîkirinê hestyar bû*”.

“*Em îhtîmama nivîsandina dîroka me ji yên din re dihêlin. Divê meriv ecêbmayî nemîne ku ew vê dîrokê bi awirekî din nîşan bidin, heta bi awayekî berevajî dîtina me jî.*” **Zahir Iheddaden** jî vê poşmanîyê parve dike û dixwaze “*welatperwerîya*” xwe îsbat bike bi weşandina *L’Histoire décolonisée du Maghreb / Dîroka dekolonîzekirî ya Mexribê (Fas)*. (2) Ew dibêje: “*Karekî lezgîn e ku dîroka me ji nû ve were nivîsandin, bûyerên ku dîrokzanen kolonyal bi awayekî alîgir nîşandana bi rengekî din werin şirovekirin.*” Kevne milîtanê Partîya Gelê Cezayirê (PPA) yê 84 salî, kevne burokratê li gelek wezaretên cihê, nakokîyên berhemên ku ewropîyan weşandine dixe ber lêpirsînê. Paşê ew “*ceribandineka pêşandana dîroka Mexribê*” dike ku ji berîya dîrokê dest pê dike û heta bi sedsala 16an dewam dike, berîya ku piştre tevahîya bala xwe bide Cezayira heta bi sala 1962yan.

Sala 1962yan sala serxwebûnekê ye ku berdêla wê ji bo gelê Cezayirê pir zêde bû. Du salan berîya wê li Swîsreyê *Pacification / Pasîfkirin* (3) der çû ku behsa “*rêbaz û navgînên tepisandin û zilmê yên rayedarên fransî di dema şerê Cezayirê de*” dikir. Komeleya Xelasbûna ji Kolonyalîzmê ev berhem hîna nû li Parîsê weşand. Milîtanên dij-kolonyalîst ên fransî û di nava wan de nivîskar **Kateb Yacine** û endamê Hikûmeta Demî ya Komara Cezayirê (GPRA) **Hafid Keramane** jî, cezayirîyan ev berhem bi pêş xist. *Pacification* şahidîyan berhev dike li ser sîstemîkirina êşkenceyê bi destê artêşa fransî ya ku ji revandina kesan jî û ji bikaranîna sîlehên bakterîbîyolojîk li dijî xelkê jî xwe nedida alî.

**Nils Anderson** ê ku sala 1960î ewqasî wêrek bû ku li Lausannê vê berhemê çap bike ji vê çapa nû re pêşgotinek nivîsandîye. Ew behsa parkûra xwe ya ji xwendekarîyê ber bi edîtorîyê ve dike ku bi “*trajektûwarên hema ji xwe re li hev rast hatî*” û “*rastîya bûyeran*” dest pê kir. Ji bo wî ev berhem “*şahidîyê dike li rola sereke ya ku karê weşanê dikarî di dema şerê Cezayirê de pê rabe: roleka eşkerekirina rastîyan û bîrewerkirinê*”.

(1) Akram Belkaïd, *Retours en Algérie. Des retrouvailles émouvantes avec l’Algérie d’aujourd’hui / Vegerên li Cezayirê. Hevdîtinên hestyarker bi Cezayira roja me ya îro re,* Carnets nord , Parîs, 2013, 224 rûpel, 19 ewro.


(2) Zahir Iheddaden, *L’Histoire décolonisée du Maghreb. L’Algérie de 1510 à 1962 / Dîroka dekolonîzekirî ya Mexribê. Ji 1510an heta bi 1962yan Cezayir,* Dahlab, Cezayir, 2013, 207 r., 500 Dînarên Cezayirê.

(3) Hafid Keramane, *Pacification. Livre noir de six années de guerre en Algérie / Pasîfkirin. Pirtûka reş a şeş salên şer li Cezayirê,* Les Petits Matins, Parîs, 2013, 320 r., 16 ewro.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê




Özgür Epözdemir: **Pîyanoya ezmûnî**



Özgür Epözdemir: **Beriqîn IV**, fotograf




Özgür Epözdemir: **Keştî II**, fotograf



Özgür Epözdemir: **Keştî III**, fotograf

# Pirzimanîbûn û forumên civatî

JULIE BOÉRI *

Demokrasîya beşdarîyê, birêveberîya berpirsîyar beramber çavkanî û çopan, bazirganîya adil, bernameyên kompûterê yên belaş...: forumeka civatî divê di nava rêxistina xwe bi xwe de guhertinên bi dilê xwe nîşan bide. Divê ew nexasim jî mafê beşdaran ê danûstandina bi zimanê tercîha wan misoger bike; loma di vê qadê de meriv nikarin xwe ji çerxên serdestîyê xelas bikin. Piştî vegera li xizmeteka adetî ji bo civatên giştî yên herdu *Forumên Civakî yên Cîhanê* (FCC) yên pêşî yên li ***Porto Alegre*** yên sala 2001 û 2002yan wergera sîmultane ya bi spanî, potugalî, fransî û ingilîzî hebû, bi sedan milîtan ji bo pirrengîbûna zimanî û misogerkirina wergerê di *Foruma Civakî ya Ewropî* (FCE) ya pêşî de seferber dibin. Bi vî awayî tevna navneteweyî ***Babels*** peyda bû, ev tevn di piranîya forumên van dehsalên dawîyê organîzekirî de amade bû.

Ji bilî zimanên bivênevê yên danûstandinê, Babels yên cihê ku forum lê pêk tê jî pêşnîyaz dike: ***hindî*** û ***marathî*** li FCC ya Bombayê ya sala 2004an, ***queçuwayî*** di *Foruma Civatî ya Amerîkayan* ya li Quito ya sala 2004an, ***katalanî*** li *Foruma Civatî ya Derya Spî* ya li Barselonayê ya sala 2005an, ***yûnanî*** li FCEya li Atînayê sala 2006an, ***swêdî*** li FCEya li Malmöyê ya sala 2008an, zimanê îşaretan ê brîtanî (ZÎB) li FCE ya li Londonê ya sala 2004an û ***brezîlî*** (Libras) li FCC ya li Porto Alegre ya sala 2005an, ***erebî*** li FCCya li Tûnisê ya sala 2013an. Îdîyomên stratejîk ên firehbûna foruman li herêmên kêm temsîl dibin: zimanên hindî (***têlûgû, bengalî, malayalam***) û asyewî (***koreyî, îndonezî, japonî û tayî***) li Bombayê, zimanên Derya Spî û yên Ewropaya navendî û rojhilat li London, Barselona û Atînayê.

Ji pirrengîya zimanî û wêde, axaftin, peyv û têgehên li xwepêşandanan pev tên guhertin ji bo wergêrên profesyonel zor û zehmetîyan pêk tînin. Ji bo amadekirina erdê çareserîya vê pirsgirêkê endamên dilxwaz ên komeleya ***Ecos*** ya ku li Fakulteya Wergerê ya Zanîngeha Grenadayê birêxistinbûyî ye, amadekarîya li gorî rewşê (*sit-prep*) vedîtin. Ev pêkhateya li gorî zimanan û asta zehmetîyê hatî birêxistinkirin, destûrê dide xeşîman ku xwe li wergera sîmultane biceribînin bi xêra vîdeoyên di dema forumên berîya niha qeydkirî.

Pirsgirêkên wergerê vediguherin çavkanîyên dewlemendîya çandî bi xêra bernameya *Lexicons* ya ku ji bipêşxistina ferhengên pirzimanî yên peyvên klît ên girêdayî babetên mezin ên nîqaşkirî pêk tê. Anîmatora *Lexicons*ê **Stéphanie Marseille** weha rave dike "*wergêrên bi dilê xwe ew filtre ne ku bi wan tevahîya pirsgirêkên ragihandin û danûstandina tevgera alterglobalîst* [tevgera kesên ku doza globalîzmeka alternatîf dikin; têbînîya wergêr] *ji holê tên rakirin*". Bi vî awayî fikrên "metakirin" yan jî "alterglobalîzm" ên ku wergera ber bi gelek zimanan ve êdî digirin ser xwe, pirsgirêk peyda kirin dema ku bikaranîna wan dest pê kir.

Herçî mafê ragihandinê bû, rêxistin û milîtan divîyabûn li ser stûnekî wekhevîyê bin; û helwêstên wan ên îdeolojîk û çavkanîyên wan ên malî çi dibin bila bin, ev yek bi vî rengî bû şewazê xebitîna wan. Ji bo gihiştina vê armancê berhemberhevkirina çavkanîyan pêwîst e, ya ku dikare bi gelek awayan mimkin be. Ya herî bêqisûr ew e ku mesref (materyalên ji bo kabînên wergera sîmultane, biletên wergêrên bi dilê xwe vî karî dikin, weşana bernameyê û hwd.) bi foneka piştgirîyê werin dayîn ku rêxistinên beşdar li gorî kapasîteyên xwe hazir dikin. Li van fînansmanên dewletê û yên taybet jî zêde dibin.

Ji bo ku giranîya wergerê di budceyê de kêm bike, ***Babels*** biryarê dide carinan pêdivîyên hin komeleyan tedarîk bike yên ku hin tişt û çalakîyan li kenar û kevîyên civînê organîze dikin di berdêla feraxetkirina ji mesrefên bilêtan heta cihê manê ji bo kesên bi dilê xwe wergerê dikin. Ev stratejî bi her halî ne bê tehlûkeya rikberîya nedilsoz a beramber wergêrên profesyonel ên li cihê forumê ye. Ev wergêrên profesyonel, endam yan jî neendamê tevnê bi her halî bi çavekî baş nanêrin li xizmeteka weqfî ya ku ew rêxistin pêşnîyaz dikin ên ku carinan bi milyonan ewro budceyên wan ên salane hene.

Rêbazeka din ew e ku kêmasîyên berhevkirina fonan ji holê werin rakirin bi cihbicihkirina heqê qeydîyê ji bo rêxistinên beşdar bi heqêlêzêdekirî yê li gorî hejmara zimanên wergerê yên doza wan tê kirin. Lê belê heke ev were kirin hingê meriv li prensîpa beşdarbûna wekhevîparêz a ku wergera bi dilê xwe xwe dispêrîyê, zirarê dike.

Ji bo ku pirrengîya zimanî, ne bi tenê rengê ji derve ve xuya be û demokratîzebûneka bi rastî di nava xwe de bihewîne, wezîfeya forumê ye ku civatên zimanî û çandî yên ku hedefa foruman in, bi civînên amadekar ên civînê seferber bike. Ne wisa be, pirbûna foruman û tevlîhevîya wan a lojîstîkê wê bike ku ew heta radeyeka dîyar destteng bibin û zimanên serdest wê di bernameyê de xwedîyê giranîyeka raser bin.

Şerê ji bo pirrengîbûna zimanî carinan li bin guhê nebûna desteka organîzatoran bi xwe dikeve, yên ku hîna jî bi girîngîya meselê nizanin û tê nagihîjin. Endama tevnê ya berpirsîyar ji seferberkirina wergerên bi dilê xwe yên zimanên Ewropaya navendî û rojhilat li FCEya Atînayê **Barbora Molnarova** dibêje, ji bo organîzasyona civîna amadekar li Pragê sala 2005an organîzatorên çekî doza *fransî, ingilîzî* û *rûsî* kirin, zimanên ku ew wekî "*zimanê esperanto yê Ewropaya Rojhilat* dibînin – li şûna ku doza wergera *yûnanî* û *çekî* bikin.

Hevnegirtinên di navbera plankirin û pêdivîyên bi rastî tên dîtin, dikarin bikin ku rêxistin bi pereyan wergêran bigirin – ev jî nexweşîyan diafirînin bi wergerên bi dilê xwe dixebitin – yan jî plansazîya zimanî ya salonan di deqîqeya dawî de biguherin. Bi vî awayî li Atînayê wergêrên zimanên hindikahîyan gazin kirin ku ji kabînên wan ew kirine der da ku cih çêkin ji bo wan wergêrên zimanên ku organîzator wan wekî "bikêrtir" dibînin. Di bernameya FCCya Tûnisê de îsal bi tenê zimanên danûstandinê (*erebî, fransî, spanî û ingilîzî*) hebûn, ev yek nîşana nebûna daxwaza desteka ji bo zimanên hindikahîyan ên wekî ***tamazîg*** (zimanê berberan) bû. Bi vî awayî dîyar e di navbera prensîpên sîyasî û pratîkên lojîstîk de kunek vedibe . Wergêr û aktorên din ên bi dilê xwe yên pirzimanîyê, ji bo pînekirina vê kunê, xwedîyê roleka sereke ne.

* Endama tevna Babelsê û dersdar û lêkolînera ragihandinê li Zanîngeha Pompeu Fabra, Barselona.

(1) "Réflexion sur les langues dans le mouvement altermondialiste: séminaire FSE 2003 / Hizrên li ser zimanên di tevgera alterglobalîst de: semînera FCE 2003yê", 30ê çirîya paşîn a 2003yan, www.babels.org

(2) "Babels Report on Prague EPA / Rapora Babelsê li ser Civîna Amaedekar a li Pragê", 11ê îlona 2005an, www.babels.org

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

## WÊNESAZÊ VÊ HEJMARÊ
## Özgür Epözdemir



Wênesaz û grafîkvan Özgür Epözdemir, di sala 1982yan de li navçeya Tetwanê ya girêdayî Bedlîsê hate dinê. Li Tetwanê dest bi perwerdahîya xwe ya seretayî kirîye û hîn dema di sinifa duyem ya dibistana pêşîn de bû tevî malbata xwe koçî Mêrsînê kir.

Grafîkvanê ciwan Özgür Epözdemir, dibistana navîn û lîseyê li Mêrsînê kuta kir. Epözdemir, dûre li *Beşa Seramîk ya Fakulteya Hunerên Bedew ya Zanîngeha Mêrsîn*ê berdewamî li perwerdahîya xwe ya bilind kir.

Hunermend, piştî du salan li heman zanîngehê derbasî beşa dîzayna grafîkê bû. Di sala 2007an de perwerdahîya xwe ya bilind qedand. Her ku ji zanîngehê mezûn bû û heta niha, di ajansên cur be cur yên reklaman de dixebite. Niha li Enqereyê jîyana xwe didomîne.

Özgür Epözdemir, di sala 2009an de li Stenbolê wekî grafîkvan li *Expo Chanel* di departmana dîzayna grafîkê de xebitî. Di sala 2010an de li Mêrsînê di ajansa *Gazoz Kapaa*'da kar kir. Ji bilî van karan, herweha li başûrê Kurdistanê di kanala televîzyonê ya bi navê *Kurdmax Tv* de dîsan wekî dîzaynerê grafîkê xebitî. Dûre li Enqerê di ajansên *Outline* û *Prosigma Tasarım*ê de kar kir.

Hunermendê kurd heta niha bi xebatên xwe yên hunerî tevlî gelek hawîrkan û pêşangehan bûye. Di sala 2005an de li Mêrsînê tevlî hawîrkana *Exlibris ya Beşa Dîzayna Grafîkê ya Fakulteya Hunerên Bedew ya Zanîngeha Mêrsînê* bû û di encamê de xelata sêyem bi dest xist. Herweha di sala 2006an de tevlî xelatên reklamên herî baş yên çapemenîya sor (*Kırmızı Basında En Iyiler Reklam Ödülleri*) bû. Dîsan heman salê bêşdarî *hawîrkana afîşan ya 125mîn salvegera ji dayîkbûna Atatürk ku Zanîngeha Mêrsînê* li dar xistibû bû.



ÖZGÜR EPÖZDEMIR: **Beriqîn V**, fotograf

# ÇAND Û HUNER

## Ji Prof. Kızılhan pirtûkek nû

# "Êzîdî kî ne?"

### Yado Ciwan

Civata kurdan ku ji gelek komên çandinî û bawerî yên cuda pêk tê, bi rengînî û dewlemendîya xwe balê dikşîne. Taybetmendî û elementên ku di civatên îroyîn yên pêşketî de wek gencîneyên çandî û olî tên dîtin û bi rêzdarî tên pêşwazîkirin di civata kurdan de bûne sedemê nakokî, dijberî û parçebûnê. Êzidîtî jî yek ji wan têgîna ye ku gelek caran rastî vegotin û nirxandinên şaş hatîye û bûye sedemê êş û dilşikestinên giran. Lewre, li gor hin qewlên êzidîyan di dîrokê de qala 72 fermanên (komkujîyên) li hember êzidîyan hatî lidarxistin tê kirin. Di derbarê bawerîya êzidîtîyê de ji bo ku meriv bibe xwedî agahî û lênêzîkbûnek maqûl berîya hertiştî hewcedarî bi çavkanî û lêkolînên zanistî hene. Di vê çarçoveyê de pirtûka ''Êzidî kî ne'' ya Prof. Dr. İlhan Kızılhan valahîyeke mezin dadigire.

Pisporê derûnî û mîgrasyonê Prof. Dr. İlhan Kızılhan ku bi nivîs û pirtûkên xwe yên li ser zanistîya sosyalîsazyonê û pirsgirêkên koçberîyê tê naskirin, bi pirtûkek nû ya bi navê "Êzîdî kî ne?" derket pêş xwendevanan.

Pirtûka ku ji alîyê weşanxaneya VWB (Verlag für Wissenschaft und Bildung) ve bi kurdî/kurmancî û almanî, ango bi du-zimanî hatî çapkirin, him di derbarê bawerî, ol, cejn û kevneşopîyên êzîdîyan de agahîyên bingehîn pêşkêşî dên û bala xwendevanan dike û him jî pirs û pirsgirêkên hewcedarîya wan bi zelalîyê hene bi kurdîyeke rewan û fêmbar pêşkêş dike.

**Kızılhan**, di pêşgotina pirtûkê de tîne ziman ku, "trawma û bindestîya dîrokî ya kurdên êzîdî û pêla dîyasporayê ya ber bi Ewropayê ve bûye sedem ku wan heta niha nikarîbûne serpêhatîyen xwe bînin ziman û ji bo dagirtina vê valahîyê min biryar da ku ji bo zarok û ciwanên êzîdî û herweha ji bo dê û bavên wan vê pirtûkê binivisînim."

**Kızılhan**, herweha di pirtûkê de li ser hejmara êzîdîyên ku li Almanyayê dijîn û rewşa wan ya civakî disekine û agahîyên dewlemend dide.

Di pirtûkê de xwendevan dikarin di derbarê nav û remzên ku bi êzîdîtîyê ve têkildar in yên wek; Şêx Adî, Laleş, Çarşema Sor, Tawisî Melek, Mîr, Pismîr, Pêşîmam, Çilmêr û hwd agahîyên berfereh peyda bikin, rastî bersiva gelek pirsên ku tên meraqkirin bibin û jê sûd wergirin.

Di pirtûka navborî de herweha li ser sincên bingehîn yên êzîdîtîyê, di sedsala 12an de piştî hatina Şêxadî guhertinên di civata êzîdîyan de rû dane; hûrgilîyên wek sînorên qelenên jin û jînebîyan, paşvegerandina şanavên feqîran û li ser pirsa 'gelo êzîdî zerdeştî ne' jî tê sekinandin. Pirtûka ku bi şêwaza lêkolîneke zanistî hatîye nivîsandin di heman demê de ji alîyê Wezereta Întegrasyonê ya Eyaleta Baden-Württembergê ve piştgirî girtîye.




Pirtûka ku bergên wê bi tabloyên wênesazê navdar yê kurd Ahmet Güneştekin hatine xemilandin dikare bi rêya telefon û navnîşana jêrîn bê peydakirin:

VWB-Verlag
für Wissenschaft und Bildung
Tel: 0049 302510415
Fax: 0049 30 251 11 36
info@vwb-verlag.com
www.vwb-verlag.com

## Naverok

ÎLON 2013


… Du… sê… hîn zedetir Kurdistan!
Recep Maraşli
▶ R. 1

Rewşeka vekirî û hin asoyên girtî
Marwan Osman
▶ R. 1

Şerê Balkanan, bîlançoya wî
Jean-Arnault Dérens
▶ R. 2

JI ÇAPEMENÎYÊ
▶ R. 2

Stratejîyek ji bo ji nû ve qezenckirinê
Serge Halimi
▶ R. 6

Krîza aborî ya Qibrisê, gelo şansek e ji bo aştîyê?
David Courbet
▶ R. 8

Ji mîkrokredîyê ber bi jêreprîma ji bo xizanan
Paul Lagneau-Ymonet û Philip Mader
▶ R. 9

Dîyasporaya kurdî di 'pêvajoya aştîyê' de dikare çi bike?
Dr. Bahar Baser
▶ R. 10

Dîmenên paqij, şerên qirêj
Philippe Leymarie
▶ R. 12

Li Efxanistanê sêrgêjîya sîstema tendirustîyê
Pierre Micheletti
▶ R. 14

Li Malezyayê hikûmet û civat ber bi hevberdanê ve diçin
Charles Dannaud
▶ R. 16

Ji nû ve nivîsandina Cezayira duh û îro
Ali Chibani
▶ R. 18

Pirzimanîbûn û forumên civatî
Julie Boéri
▶ R. 19

ÇAND Û HUNER
▶ R. 20



LE MONDE diplomatique kurdî

Abonetîya dîjîtal a salane: 30 €
(Ji bo serlêdanê forma abonetîyê ya malperê bikarbînin)

Independent Kurdish Media Group GmbH (IKMG)
Carnotstr. 4 - D-10587 Berlin

Berliner Volksbank - Hesab/Account/Konto: 2284 1230 10 - BLZ: 100 900 00
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 10 - BIC/SWIFT: BEVODEBB

*Pelrecords* hemû albumên Şivan Perwer ji nû ve çap dike!
Her neh albumên pêşîn ên Şivan Perwer derketin




* Ev çar album cara yekemîn wekî CD li Tirkîye û Kurdistanê derketin




Du albumên Ciwan Haco; Dîyarbekir û Gula Sor ji nû ve hatin çapkirin




Ji *Pelrecords*ê albumeke nû:




*Navnîşanên xwestinê:*

*Tirkîye:*
Pelrecords Ltd.Şti.
Katip Mustafa Mah. Hasnun
Galip Sk. no:25 a/4
Beyoglu /Istanbul
Tel: (+90) 212 243 83 97
Fax: (+90) 212 244 24 83

*Ewropa:*
Pelrecords GmbH
Carnotstr. 4 10587 Berlin
Tel: (+49) 30 330 990 430
Fax: (+49) 30 330 990 439
Email: info@pelrecords.com

pelrecords
www.pelrecords.com